# Şevên pirag

**Roman**

**Hesen Îbrahîm**

**(her demê bême kûştin,bila biwerimim.**

**Her demê bême girtin,bila dizîndanê da birizim.**

**Her demê bême dür Kirin jiwelatê min,bila min bibine cehinemê...**

**Tinê eve hemü ne bidestên wê şoreşa min gelek viyay û kar û xebat bû kirî bit...!)**

**(Hesen)**

**Diyarî**

**Bû her kesê pê lidilê xu nay,jibû ser bilindiya xû,û welatê xu..**

**(Hesen)**

**Sopas bû**

**Wî heval û bira û xoştivî yê jipeyva êkê min nivisî,heta ev berhemê dinav destên meda digel min,harîkar ü çavdêr ü gelek cara Mamusta..**

**Huzanvan ü niviserê hêja.bilind Mihemed**

**(Hesen)**

**_ 1 _**

**_ iha livêrê bû..Erê,erê,iha livî cihî bû..**

**Wek nesaxekê ta sar lê,lerzikê girt,dinav cilkên xûda berze bû.**

**_ eve şûn golleyên wanin liser vî dîwarî..**

**Çavên xu jidîwarî beref cadê şor kirin.**

**_ eve şûn gevizka Elî necefî û azad hewlêrî ye..**

**Lidur xu zifirî,her wekü litiştekî digerit.**

**_ erê..Her wekü vê gavê,rûydan ya lipêş çavên min. Ez çucar jibîr nakim...**

**Çav lê zîq bûn,mûyên leşê wî bûne zilptik,diniya lipêş çava gewir bû,zifirî.Dizifirokeka gelek dijwarda çû xwarê.**

**Livîna hevalî wî,hizirên wî cemandin.Zanî likîveye.**

**Xu ragirt,hizirên xu cemandin.Neşiya biwê selîqa dengî biaxivit,ewa berî wê gavê pê diaxivit.**

**Dengê wî,awazên giriyê jê dihat,bêhna xwînê jê difirî.**

**Her çendekê,qorçek ligewriya xu dida,da axiftina wî biser bikevit..**

**_ Elî,kete ser tenişta xu liber vî dîwarî..**

**Hizirên wî,şer digel livîna dest û çavên wî dikir.wek lêbukekî lipêş çavên hevalê wî xûya dikir.**

**_ azad dixwîna xu werbû,wek dîklekî,dema serî lê dibirin.Her xu digevast,berevanî jigiyanê xu dikir,şer digel îzraylî dikir.**

**Bê deng bû,serê xu hejand.**

**_ erê şeveka reş bû,jiyana min serubin kir.**

**Rawestiya,bêhina wî gelek bizehmet biser diket. Wekü pîremêrekê nesax,biser çiya bikevit.xohê leşê wî ter kir,wastiya.**

**Hevalê wî,destê xu dana ser milî.**

**_ jibîr bike,eve rêya şoreşgêra ne..**

**Berê xu da hevalê xu,hest bitenahyê kir,zanî neyê bitinê ye,wek caradî.**

**_ bawer bike,bêhina xwîna wan hêşta tijî mejyê mine.Madê çewa jibîr kim?**

**Ew dîmenên kirêt,ewên gelek şeva nehêlay binivit. Gelek cara xwarin liber dilê reş kirî.Ew rûydana,bûye beşek jijiyana wî.neşêt jibîr bikit,neşêt bêy wê bijît. Çend carekê,jidil keniye,xoşiyek bû çê bûye,yan digel hindek hevala geriyaneka xoş kiriye.**

**Gevizka azad,dinav xwîna Elî da.hatiye pêş çava.**

**Dil lê çirmsandiye,dinav hizra da bû kuvlik..**

**Tila wî ya şehdê,cih nîşa cîhanê dida.**

**_ iha eve cihê ketina wane..iha livêrê şer digel manê dikirin..**

**Her wekü wasitiyay,hizra ser jihemü livîna stand,digel pêlên xu jorda bire xwarê.**

**Neşiya liser pên xu,xu bigirt,pişta xuda wî dîwarê hêşta şûna golleya diyar.**

**Rengê wî zer bû,diniya liberçava zifirî,şêlî bû..**

**Dengê golla tijî gohên wî bûn,qêriyên Elî necefî, diserîda deng vedidan,digel bêhna xwîna azad hewlêrî,têkel dibûn.Wek vistevaleka hindusa,ditariya şevê da,bûne perstgeh...**

**Destekî giyanê wî hejand.**

**_ xu ragire,ew bihayê azadyêye..**

**Hizirên wî,wek çîçelukên kurkê,kum bûn.**

**Cih û dem bû diyar bûn.**

**_ bibure,min tûjî bixemên xu aluz kirî.**

**_ ew ne xema te bitinêye,lê ew roj ü ew rûydan çûn û burîn.jiyan na rawestit.Divêt em bijîn.**

**_ raste..Raste,divêt em bijîn.**

**_ te jibîr kir,em hatîne çi?Em nehatîne liser cihê rûydanê fathê bixwînin.Tû baş dizanî,em yên hatîne çi!**

**_ heker min zanî ba,ez dê ême vî cihî,çend ciwanên pirag lihîviya min ban,ez nedihatim!**

**_ bibure,min jî ne dizanî te livî cihî,bîreweriyeka hûsa dirinde ya hey.**

**Diviya hevalê xu jiwî bazinê hizir ü xema,bisuhbeteka xuş bînte der.**

**_ ka bûmin bêje?Hewe livî cihî çi dikir,wê nîv şevê?**

**Bê deng ma,hêşta dengê hindek gûlleya û qêriya diserî da ma bûn.**

**Hêşta tijî difina bêhna xwîn û barûtê bû.**

**Hevalê wî zanî,suhbeta wî çu cih diserî da nedîtin.**

**_ heker dê vê geriyana me têk dî,da bizifirine mala xu?**

**_ nene,ez êdî wê suhbetê nakim.**

**Da jivî cihî dür kevin.**

**Kulana fireh hêlan,beref nav taxî çune xwar.**

**Liserê wê kulana teng,rawestiya.**

**_ ez revîm vê kulanê..Lipişt vî dîwarî,min xu veşart. Heta ew jivistevala xu razî bûyn..**

**Hevalê wî zanî,çu xûşî jivê geriyanê nabînit.**

**_ ma kes litana hewe nehat?Kes livara nebû?**

**_ piştî nîv şev bû.Kes livan kulana nebû.Ewê livara bit,serxuş û bê cih deshelate.Livan welata,kes xu likesê na kite xûdan.**

**_ û paşî?!**

**_ piştî jigolle barankirinê têr bûyn,livê cadê wek bayê birûsyê,biturmbêla xu revîn.**

**_ çend bûn?**

**_ jiduwa pitir bûn.**

**Dîsan bê deng ma.Çavên hevalê wî jinav çavên wî ve nabin,diviya suhbeta xu bidawî bînit,da biçine wê oxera jibû hatîn.**

**_ min kire hewar,kire qêrî.kes dihewar û qêriyên min nehat.kes limin ne bû xûdan.**

**Recivka destên wî zêde bû,çavên wî zîq tir lê hatin, lêvên wî dilerizîn..**

**_ ez çûm ser kelexên wan.Hêşta giyanê wan şer dikir.**

**_ polîs liwara nebûn?**

**_ livî welatî,polîs jihemüyan bê desthelat tire.**

**Axivtinên wî,şiya hevalê wî biroydanêve girêdit.**

**_ te çi kir?Wesa lipêş çavên te,giyanê xu jidest dan?!**

**_ min bizorê tormbêlek raostand,kelexên wan kirine têda û birine xestê..**

**_ bi zorî?**

**_ erê..Wî demê şevê,kes bû kesê narawestit jiber diz ü serxoşa.Lê piştî şofêrî ew kelex dîtîn,gelek harî min kir ü xu wastand,û gelek daxbar bû.**

**Hevalê wî nedviya wê rojê jidest bidit.**

**_ te ne gûte min,hewe wê nîv şevê livî cihî çi dikir?**

**Berê xu da nav çavên hevalê xu,zanî barê wî giran kir,zanî ewî çu biçavên xu nedîtiye,ew hest biroydanê nakit,pê na êşit.**

**Bikeniyeka zer ve.**

**_ em jikumbuneka rikeberiya îraqê dihatin.**

**_ kumbunên nîv şevê diçewanin?!Yan jî kumbuneka kes û sor bû?**

**Zanî hevalê wî divêt jivî baznî der kevit.Nevêt demê xu bivan suhbetave biburînit.**

**_ bila wek te bit.**

**_ helbet wek mine,çi kumbune,kabirayekê şiye û dîndar,wek Elî necefî,digel kabirayekê markisî,wek azad hewlêrî.digel êkî wek te,nasyunalîst.li vî taxê hejar kum bikit.heker ne kumbuneka kes ü sor bit,û bêhna wêskî ü votkayê jê ne firt?!**

**_ ez ne nasyunalîstim.lê demê milletê min tuşî nexoşiya û qirkirinê bibit.dê berevanyê jê kim.**

**Bila tu jî heqî,mezin dibêjin,qona xu nîşa biçüka bide, ne didanên xu..**

**_ bawer bike,çu cih nemayne jileşê te,min deh carî ne dîtîn,vêca were, "tişî gîvara"....**

**_ 2 _**

**Roj ya zere,zeratiya wê,pêlên sermayeka şermîn jê dibarit.**

**Livî welatî,ü livî demê salê,kêm caran roj xu diyar dikit.**

**Jiber wan avahyên bilind çu xoşî jiwê tavzerkê nîne.**

**Xelkê pirag,hemü yên liser cadan,libarzaran,likulan ü gorepana.Mirov tijî hemü cihane.**

**Gelek geriyan,gelek westiyan,çu cih bû turmbêla xu nedîtin.**

**_ me roja xu hemü diturmbêlê da burand.**

**_ ma me cihek vala dîtye,em turmbêla xu lê rawestînin?**

**Çavên wan jicihên taybet biturmbêla venabin.**

**_ raweste.Eve ciheke,heker ne yê taybet bit..**

**_ bawer neke,ev cihe yê taybete,yê van malaye.**

**_ em dê pirsiyar kin.Livî welatî,tinê pirsiyar dibê pare ne.**

**_ tû biliblê heft awazî.hemû zimana dizanî,dê here pirsiyar bike.**

**_ ma zimanzanîn kêmasiye?**

**Xu jiturmbêlê havête der,qesta wê jina liber turmbêla xu rawestiyay kir,bi zimanê rosî kete suhbetê digel wê jinê.piştî pirsiyara wî cihî kirî,ü jinê gûtî,hûn dişên livî cihî turmbêla xu rawestînin.**

**Gelek xelkê çîk,rosî dizanin,taybet ewên dan emir.**

**Husên ma bilêva jinkêve,jipirsiyarê çu yadî..**

**Husên xwandina xu binîvî nekiriye,her karê dest havêtê,jihosta şareza tire..Kurdî,erebî,rosî,farisî,turkî, elmanî.Wek navê xu dizanit.**

**Gelek cara hevala digûtê.**

**_ mala xudê ava,te xwandina xu binîvî ne kiriye.Heker da diniyayê xirab kî.**

**Wî digûte,hevalên xu yên derçûyên zankûya.**

**_ heker hewe,ew çend reş reşik nexwandban.**

**Av da hew bit,lê sed qeda bimamustayên hewe bikevin,ewên nasname dayine hewe,"golka.."**

**Bêhna wî teng bû.**

**_ dê were,nê dijiyê pîra te daye,ma tu jisohbeta wê têr nabî?**

**_ ez yê pirsiyara kiça wê dikim!Eve me cih bû turmbêla xu dît,da bikevne nav dujminî û dest "bixezayê" bikin..**

**Turmbêla xu liwî cihtî dürst kir.**

**_ tû dizanî,eve ne senterê pirag yê mezine?**

_ erê..Ez baş dizanim,ma te jibîr kir,ez careka dî yê bûyme mêvanê pirag?

_ pa eve çi cihe?Heker te zanî,tû yê zîrekî?

Lidur xu zifirî,berê xu da wan avahiya,wan cada.

_ ez dibêjim,lê ne sed dersed.eve pirag pênce!

_ raste..Nene,hêşta tû yê liser hişên xu.niza tû jibinê xu jî wesa yê zîrekî?Yan dê min şermzar kî?

_ lidemê şerî,dê zelama bînî!

_ berî her tiştekî,da biçin têr bixwîn,ez jibirsa mirim.

_ hemü gava tû yê birisî!

_ ma min çi heye jiwî zikî pêve?

_ bin zik!

_ ew piştî zikî ye.heta zik têr ne bit,ew gazinda nakit.

_ da bidine vê cadî.çavê xu liser reşa bigêre.

Ev bajêre pire jibiyaniyan,ew dê hindek cihên xûş nîşa medin.

_ raste,ser reş..Paşî pirç zer..

Kenî tijî kulatê bû,wek dû nêçîrvana,qesta deştê dikin,bisîngê vekirî,bihêzeka xurt,biberükên tijî.

_ ka çakîtê te?

_ diniya xuşe,pêtivî çakîtî nîne.

_ û pasport?

_ ew jî ya diturmbêlê da.

_ malate...Ma tu limalêy?!

_ europa hemü mala mine.Wêthe hindek ser reşin.Here erebiya xu lê serif bike,wesa diyarin erebin.

Xu nêzîkî wan kir,dû tulaz,yên ketîne suhbetê.Zanî ku erebin.

_ selam elêkim..

_ selam..Keremke?

_ biburin,hün erebin?

_ belê..Ez cezayrî me,û eve suriye..

_ me pirsiyara xwaringeheka erebî,yan rojhelatî dikir?Û cihek paqij û tena bû nivistinê?

Berî bersiva wê pirsiyarê bidit.Wî tulazê surî,gût.

_ hişiyarbe,telefuna xu nehêle diber qayîşa xura,û hişiyarî parên xu bin,eve bajêrê dizaye!

_ me divêt biçine senterê bajêrî..

_ ev mîtiruye,diçite nav senterî,hûn dişên pê biçin.

_ me turmbêl ya hey,em dê biturmbêla xu çin.

_ ka turmbêla hewe.

_ ya likulana he..

Bi keniyeka sar.

_ turmbêla hewe ya hatiye dizîn..Yan dê ête dizîn..

_ ne ne,berî pêniç çirkeya,me ya hêlaye livê kulanê..

_ dê herin bikine xar,bigehinê,lê ez bawer nakim,hêşta mabit!

Tirs tijî serê wan bû,hizra jituxîbê pirag birine der..

Birine welatê wan yê xwînê,birine rojên desthelata faşiyan,birine rojên serbiran,birine enfalên reş..

Tirs,hevalcêmkê giyanê wane,pêkve bûyne,û pêkve dijîn.Pêkve dixwîn,pêkve dinivin..

Husên,eve çend salekin,jibin deshelata babê xu der ketî.

Hindî hest bijiyanê kiriye,yê bindest û şkandî bûye.

hemû rengên karî kirîne,cu kar nemayne Nekirîn.

Şivanî,gavanî,xulamî dinav malên farisa da liêranê.

Babekê hejar û şoreşgêr,her jidestpêka Şoreşê, biçûkên xu,dane düv xu,û livê şkeftê,bû yadî,û livî gondî,bû yê dî.

Ne çu kar bû wan kiriye,û ne çu mal heye.

hindî bikin,êvarî digel mêvana dine zikê xu,spêdê zü lipariyekê dî digerin..

Wekü girtyên liber sêdarê,hemû yên lihîviya xwarinê, yan mirinê..

Tinê Husên şiya xu jiwê girtîxanê rizgar bikit.

**Lielmaniya binecih bibit,jibin kuntirula,jiyanê û ya babê xu derkevit.**

**Hêdî hêdî harî wan jî dikit,ewjî yê bûye xudan pare ü mal û turmbêl.**

**Hêşta jimalê diniyayê têr nebuye.jiber wê hejariya dîtî,kirmê hejariyê hêşta liser mejyê wî zale..**

**Ev turmbêle bipêniç hizar yuruya kiriye,liser navê hevalekê xu nivêsiye,jiber harîkariya dewletê Da ne ête birîn.**

**Eve pêniç hizar yuru çûn,pêniç hizar yuru..**

**Dê pêniç hizar pirsiyar êne kirin,her pirsiyarekê,dê pêniç hizar lumeyî hebin.**

**Dê bine pêniç melyun şermezarî..**

**_ çi dikirin lipirag?Ma ew cihê wane?**

**_ bila çavên wan bêne der.Da kes neçite şolên pûç!**

**Tinê pare ban,kesê ne gûtba,qenc lê hatin,xudan jin ü biçûkan.ew ne cihê wane,pûça.**

**Bila sê caran hindî wan çûban.**

**Liser milê xu zifirî,zanî hevalê wî,Hesen,yê ketiye dinav zifirokeka dijwara hizra da,haha dê xendqit.**

**Navçavên wî yên zer buyn,rê liber çava ya şêliye.**

**milên wî biwan mirovên birêya xu diçit dikevin,xu jiber kesê nadite paş,wekü mirovkê kureye.**

**Liser halê xura,dilê wî bihevalê wî ve ma.**

**_ çi xudê jite standiye,tu dimala xuda yê serbest bûy,çi jite kêm nebû,xudan nasname ü xudan şoreş.tû bidüv çi ketî?Te çi divêt?**

**Wî kabirayê cezayrî,ewê liberahiya wan dibezit hizirên wî revandin.Herçendekê dibêjit.**

**_ îşela xêre..Xu ture nekin,em dê bînin..**

**Gûtinên wî,her zü berze dibin,beramberî wê gêleşoka hizirên dijwar..**

**_ hûn baş cihî dizanin?**

**Tinê Husên destê xu dirêj kire kulanê,bêy biaxivit,jitirsa hizirên diserî da birevin !**

**Careka dî,tulazê cezayrî gût.**

**_ xema nexwîn,em dê bînin,lê divêt hûn bidirustî cihî bizanin,da em lê negerin,ü gîro nebin.**

**_ eveye,ew kulan..**

**Liserê kulanê,Husên jinav hizirên xu derket.**

**Her wekü zavay jinav nivînên bûka êk şevî bizurî bînine der..**

**_ iha ev kulane bû.**

**Çavên hemûyan zîq bûn,devên wan man vekirî..**

**_ hûn dipişt rastin,ev kulane ye?!Dibit kulaneka dî bit,ev kulane hemû wek êkin?!**

**Husên pêt xu lierdî dan.**

**_ iha livî cihî bû..**

**Rengê miriya hemû girtin,neşiyan çu axivtina bikin,çu livîn jê nehatin,gewriyên wan hişik bûn.**

**_ baş hizirên xu bikin...Dibit hûn dişaş bin?!**

**Dengê Husên,bêhna hejariyê jê dihat.**

**_ eve hêşta turmbêla wê jinê ye,eve hêşta,ew biçûkên digel daykên xu yariya dikin linav baxçî,**

**Eve ew cihe..iha livî cihî bû....**

*****

**_ iha livî cihî bû,eve hêşta şûn golleyên wanin.**

**_ eve cihê gefizka Elî necufî ye..eve cihê kelexê azad hewlêrî ye..iha ketin vî cihî...**

*****

**_ 3 _**

**_ wey hûn bixêr hatin,eve deh sale em lihîviya hewe,da tû biçûkên xu bîniye mala me,her car dibêjê,bila bu cara bêt bit.**

**Mala xudê ava,vê carê hûn hatin.gelek bixêr hatin..**

**_ xûdê jihewe razî bit,supas,tû seruberê vî welatî û karê min dizanî.Her bêhnekê licihekî me.Eve ez gelek cara hatim,tû tinê carekê yê hatî..**

**_ ez û tû her êk dibînin,merema min biçûkin.te çucara ew ne înayne mala me,divêt ew jî derkevin**

**Diniyayê bibînin..**

**_ raste..iha eve min înan,vêca lime bibure,û hûn jî divêt her bên.**

**_ ser serê me ü herdû çavan,em dê ên,hûn werin, diniya bimirovan xuşe..**

**_ seruçav ne êşin.**

**Devê xu bire bin gohê hevalê xu.**

**_ ma dê me hêliye linav biçûka dixanî ve?**

**_ diyare te karê xu baş kiriye!Tû mêvanî,her tiştê tû bixwazî,ez dê bicih înim.geremke,te çi divêt?**

**_ da xu berdine nav milletî..**

**_ kîve..?!Dûr? Nêzîk..?!**

**_ nêzîk.. Lipişt van tuxîba..**

**_ nêzîktirîn tuxîb,çîke.. Mane..?**

**_ pirag...Beheşta ser diniyayê,warê xezal û kutiran..**

**_ pirag..!Ev nave min jibîr kir bû...**

**_ dê baş ête bîra te.**

**_ bila... Lê..?**

**_ lê çi..?Tû jidayka biçûka ditirsî?**

**_ nene,ez şerim dikim.eve çend sale ez ne çûyme wan cihan.**

**_ baştire,em dê çin,ü dê bîrhatên te sax kine ve.**

**_ ê...Nê...**

**_ çu ê û nê pênevên..Te bivêt,te ne vêt,em dê çin. Mate belên ne da bû min ditelefonê da?**

**_ min bawer nedikir tû dê êy û dê bite rastî !**

**_ hilû, zü binive,em dê sipêdê zü çine oxerê!**

**_ ez jisuhbeta te têr ne bûyme.**

**_ hilû,sube ez heta wêrê bû te axivim.**

**_ ez çucar livî demî ne nivistîme !**

**_ te çucar oxerên hosa xoş liber ne bûn,heker da êvarî nivî.**

*****

**Hizra ser jihemü deng û livîna stand,kire êxsîrê xu.**

**dinav pêlên xuda berzekir,bire xwarê,nivand..**

**Jora wî ya nivistinê,ewa bû dilê xoştiviya xu kirî ü cwan lêkday.**

**Lipêş çava bû şkefteka tarî.Ew jina liber teniştawî,ewa jinav hizareha kiçan,bû dilê xu helbijartî ü jigiyanê xu xoştir viyay,lipêş çava bû pîrejineka heştê salî.**

**Dem giran bû,şev dirêj bû,hizir belav bûn,xew har bû,leş xav bû,mejî rûn bû,livîn sist bûn,bê dengyê jor dagîr kir.**

**Çend carekê,wê jina liber tenişta wî,xu nêzîk dikir, bidestê xu yê nîv nivisitî,jixu dür dikir.**

**Nediviya kes beşdariyê dihizirên wî da bikit,nediviya kes mayê xu dixewnên wî da bikit,nediviya kes zêrevanyê lê bikit.**

**dibit nihu kiçeka pirç dirêj ü bejin bilind,silav kite çavên wî,dibit nihu bibite mêvanê dû çavên şîn.**

**Diviya digel giyanê xu bimînit bitinê,diviya xu berdite bin pêt xewneka har,diviya bibite êxsîrê xewê..**

**Xew har bû,hizir şêlandin,giyanê wî lihemû kun ü qolaçên jiyanê gêrandin.**

**Serxuş kir,azirand,nêr kir,leyîzand.Dikuşa kiçeka pirç zerda libaxçekê pirag da nivand..**

**Kiç,wek pelatînkê lihindav serî dileyîzit,livînên mêyatyê jê dipeşin,biçavên gohnêlyê û lêvên sor,qebê wî dixwazt.**

**Her çendekê,xu dinav sîngê wî da dihelînit,**

**Dibite befir û hingivîn,dev û lêvan lê disojit.**

**Bêhna wî disîngî da dibû volkan,dilê wî,bû sivorekê tirsinuk,xu dinav cihê xu da nedigirt.**

**Dengê gohnêliya wî biser ket..**

**_ were..Xu nêzîk bike..Were..Ez sotim..Hihhhih..**

**Hevjiya wî jixewa giran hişiyar bû.Zanî dîsan,siwarekê şerkere,şür ü metalên wî,digerimin.**

**Leşê xu yê xav û nîv nivisitî,xuşande ber tenişta wî ya har û germ.**

**Hezên wî har kirin,şer germ bû,hevrigî dijwar bû..**

**Lidûr xu,neh deh kiçên nazik ü rüs dîtin.Hemüyan dîlaneka har dikirin.xu dixwarin,şer firoş bûn.**

**Dinav kuma wanda,kete pêlên leşên mê.**

**Her êkê bû xu dirakêşa.Şer bû liser lêvên wî.**

**Wek kulmçkeka şemayê lihindav pelên sorên agirî, diheliya.Çip..Çip..Dinav lêv û memkên wanda dihate xwarê...**

**Livîna wî zêde bû,bêhna wî deng jê hat,har bû,leq lileşên wan dida,neşiya xu.**

**Digel çipka dawyê jişema leşê wî,biqêriyeka şêtane, jixew hişiyar bû.**

**Hevjiya wî,destê xu bidevî vena.**

**_ hişiş..Te hetka me bir!**

**Lidûr xu zifirî,ew kuma kiçên rüs nedît,cih her ew şkefte,şev her ya reşe,dem her yê nivisitiye.**

**Bû pist pista wî,wî jî nezanî ka çi gût?**

**Hevjiya wî bikeniyeka şermînve pişta xu dayê..**

*****

**Hêşta leşê wî yê giran,jibin wan hizirên rüs derneketî. Dengê biçûka.xewnên wî kwîvî kirin.xew revandin.**

**Milê wî hate hejandin.**

**_ hilû, direnge,te mêvan yên heyin.**

**_spêde baş.**

**_ hizar cara baştir,zavayê delal...Serê xu bişoy ha?**

**Ne wek gelek cara ser ne şoştî biçiye derê?!**

**Berê xu da navçavên jina xu,zanî ew xewina şivêdî rast bû.**

**Jinê hêla dinav cihî da,qesta jora xwarinê kir..**

**_ em çu naxwîn..Dê birêve bariyekî xwîn.direnge,ka seyda?**

**_ spêde baş, hêşta yê nivisitî ye..**

**_ spêde baş.ka rakin, lime direnge..**

**Dengê wî jijora destavê hat.**

**_ ma heware?Madê revin?**

**Herdû jinka gûtin.**

**_ dê çi revin?!**

**_ hêşta yê nivisitiye,nizanit ka çi dibêjit!**

**Keniya wî tijî jorbû.**

**_ turmbêl..Ez behsê turmbêla dikim.**

**_ madê evro jî çiye turmbêla kirî?**

**_ erê, ma dê bê kar limal çi kin?!**

**_ te em yên înayne geriyanê.**

**_ tinê evro,em dê zü zifirin.**

**Çih bê deng bû,her êk dirêyekê ra çu dinav hizirên xu da..**

**Dengê wî,hemü hişiyar kan.**

**_ spêde baş,texêre,vê berê spêdê,tû nahêlî em binivin?**

**_ spêda çi?Çu nemaye dê bite nîvro.**

**_ ma em çu naxwîn?**

**_ ne,dê birêve tiştekî xwîn.Direnge,karê xu bike.**

**_ ez amademe.**

**_ dê,derkeve.**

**_ hewe çu nevêt?**

**_ nexêr..**

**_ silametiya hewe divêt.**

**_ heta êvar..**

**_ êvara çi?**

**_ ma em evro nazifirin?!**

**_ bêje,heta em bizifirin..**

**Keniyeka sar lêvên hemûya girt.**

**_ heta em bizifirin.**

**_ ne,bextê heweme,zû bizifirin.**

**_ bila, sûz bit.**

**Dergeh lipişt xu girtin.jin û biçûykên wan,man hilawîstî. kesê neşiya wê pirsiyarên diserê xu da bikin..**

**Dê kîve çin?Dê çine çi?!Dê kengî zifirin?!**

**Her zû,dengê biçûka,hemü hizirt revandin,tijî mal ding bû..**

**Jiderve,diniya tijî jiyane,cade pirî turmbêlin,bajêr yê jixew hişiyar bûy.yê berevanyê jixu dikit,livîn dikuka xudaye.**

**_ wesa diyare,tû rê baş dizanî?!**

**Keniya wî biser dengê wê stirana dikasêta turmbêlê daket.**

**_ bawerbike,salê carekê..Dû cara..**

**_ çar cara... Deh cara...**

**Kenî tijî turmbêlê bû.**

**_ ez gelek cara diçim,lê jibazarê asiya na bûrim.kêm cara derbazî pirag dibim.**

**_ bazarê asiya?Ev nave min gelek cara goh lê bûye.**

**_ dê vê carê bînî,dê baş bînî.Bazarekê gelek mezine,tişt lê gelek dierzanin.**

**_ tişt bitinê?**

**_ hemü tişt..**

**Carekadî keniya wan jidil der ket.**

**_ xêrbit,eve demekê dirêje ez hosa jidil ne kenîme?!**

**_ hişiyarbe..!Ez yê leş pîsim,bila em hosa ne mirin!**

**_ her livêrê te xu pis kir?!**

**Bikeniyeka bilind ve gût.**

**_ şivêdî şeytan yê hatiye min.**

**_ şeytan?!**

**Keniya wan jiturmbêlê derket**

**_ bila tû ligovenda şeytanî xu pîs bikî.Ü ez her ne nivim!**

**_ çê..?Tû nenivisitî?**

**_ xew biçavên min ne ketiye!**

**_ xêr bû?Cihên hewe dinexoş bûn?Nivîn dinexoş bûn?**

**_ nene,cihên me,û nivînên me,jimala me xoştir û paqijtir bûn.**

**_ pa te xêr bû?**

**_ xewna..Xewnên kirêt.**

**_ xudê xêrkit.Ew çi xewn bû,nehêlay tû binivî?!**

**_ berî çend heyveka.min nêçîreka qelew kirbû..**

**_ nêçîreka qelew?Ka jiserî bêje,heta şivêdî!**

**_ tû min diniyasî.ez yê bê bela me?**

**_ baş..Kes wek min te naniyasit!**

**_ ez birêya xu diçûm,min ageh jidiniyayê nebû.**

**_ ê..? Miliyaket,bêje?!**

**_ kiçeka polonî,ya biçûk..**

**_ ya biçûk?!**

**_ erê, çarde..?Pazde salî bû?**

**_ û paşî?**

**_ bela xu jimin venedikir..**

**_ mala min xirap bit bûte,tû gelek yê bê belay!**

**_ min jî dilê wê nehêla.**

**_ raste,tû gelek yê xêrxwazî!**

**_ erê bawer bike,min neşiya bela wê jixu vekim.**

**_ û paşî?**

**_ paşî berzebû.**

**_ çi lê hat?!**

**_ niza..!Min pirsiyar kir,hinda gût ne maye lielmaniya, hinda gût,ya nesaxe.**

**_ nesax?!**

**_ erê..Dilê min qetandin,digûtin"aydizê"ya girtî..**

**_ wey heware..!Û paşî?!**

**_ ez bûme nîvemirov,çu nemabû,min xu kuştî,paşî hizra dixturî bû min peyda bû.**

**_ ê..? Bêje!**

**_ ez çûme dixturî ü min kuntirola xu kir..**

**_ xudê xêr kit?!**

**_ çu diyar nebû,derket direw,lê nîva jiyê min sot.**

**_ dê her rojekê tiştek husa ête serê me.Em na rawestin ser kuriya xu.**

**Hizra cih şir kir.**

**_ erê te negüt?Vê çendê çi peywendî digel şivêdî hebû?**

**_ şivêdî,hemüyê ew kiç mêvana min bû,û min dizanî ya nesaxe,ez jî tûş dibûm.Dibûme rûreş û şermzar, dibûme pêtiranik..**

**_ mala te,jihemü nêçîrên te,ew hate xewina te?**

**_ ne bimin bû,çend çarekê çavên min diketine ser êk,dihate pêş çavên min,xew limin disot.**

**_ hêdî pajû,lezê neke..**

**_ çewa lezê nekim.!Zerî û perî,yên lihîviya me.**

**_ ma te tûbe nekir bû?**

**_ tûba darkukey...Û te..? Ma te negûtbû, piştî mariya çav şîn,jin limin heram bin?**

**_ dîsan,heker çavên wê dişîn nebit,limin heram**

**Bit.**

**Kenyê rê liberberzekir,çu nemabû turmbêla xu liwê turmbêla birex xu ve bidit !**

**Tirsiyan,keniyan wan xav bû.bezîna turmbêlê kêm kir.**

**_ hişiyar be,tû gelek yê dibezî..**

**_ çu nemaye,em dê gehin.**

**_ ez yê birsîme..**

**_ liwêrê xwaringehên xoş hene.**

**_ wesa diyare,hemû tişt liwêrê yê xoşe!**

**_ pa em hinde rê hatîne çi?**

**_ heker biber zehmeta me bikevit,Başe.**

**_ here rêkê,bila dür bit..Kiçê mar ke,bila pîr bit..**

**_ wesa diyare,dê baş berkevit!**

**_ heker me nan xwar,dê dest binêçîra xu kin.**

**_ heker me nanê wan xwar,nabit,em daxwaza namûsa wan bikin!**

**_ linik wan,nan û gan,êk rêzin.mirov bêy heduwa najît.**

**_ wesa?!Pa ew biçi tore dibin?**

**_ ew dibêjin,namûs ne dinav linga daye.Namûs dimejî daye,diserê mirovî daye.Ew tiştê dinav lingara,jibû bikarînanê peyda bûye.Tinê ew jixiyanetkariya welatî,û direwa tûre dibin.Lê birsê û hejariyê,eve çend salin,yên vêrî gelek rewştên xirap kirîn.**

**_ ne em direwa liwan dikin..Ne em xiyanetê liwelatê wan dikin..**

**Tinê ya me jiwan divêt,dû çavên şîn..**

**Herduwa pêkve wek tîpeka honerî.**

**_ û bejneka bilind ü pirçeka zer ü bes..**

**Pêlên keniya wan bidûv turmbêlê ve bilind bûn.**

**rê ü dem hevdijin,eve gelek jiêk sotin.**

**_ wêhe tuxîbe..**

**_min gût,bêhna mêyatyê ya diêt?!**

**_ erê..Baş karê xu bike.**

**_ kuntirul heye?**

**_ kuntirulekê bê seruber,tinê hindek pirsiyara dikin.Ewjî ne hemû cara.ma me çi jê ye?**

**_ü bazara asiya,gelek jituxîbî düre?**

**_ nene,sê çar kîlomîtran,iha wahe bazare,tû dibînî?!**

**_ erê..Wesa diyare ya mezine?!**

**Licihekê taybet,dür jibajêran,dür jixelkê wî welatî, herwekü ew mirovên vî karî dikin,hemü dinesaxin,lewa licihekê hosa kum kirîne da êşa wan xelê dî negirt.**

**Wek bajêrkekê taybete,hemû cûrên jiyanê lê hene, taybetmendiya asiya ya xûyaye,xelkê vî bajêrkî, hemû,vêtinamî,kurî,taylandî...Û welatên dewruberên wanin.**

**Biserve,bazara wan ya aşkira.Firotina cilik ü tiştên nav malê ü diyarîne,dibinive xodê dizanit ka çî ye?!**

**Liberamberî dikanekê,turmbêla xu rawestandin.**

**Bazar,wek çadirgeheka mezine,dikanên bê seruberin.**

**Her wekü liwelatên asiya,wek welatên wan,her çendeka,xu daye êk,dikanek jiçînkûyê,yan jiçadirê, dirust kiriye,tijî cilik û kel ü pelên welatên xu kirîne.**

**Bazara dan ü standinê,kêm û zêde,sohbet û kenî. Newek sopermariktên elmaniyane.her tiştekî bihayê wî lisere.**

**Liher dikanekê,kiçeka ciwan ü şirîn,serperştiya firotinê dikit.Wek gerokan,dimînte bibikirave,da tişta jê bikirin.**

**Gelek caran,bikirên xu lipişt baleka cilkan razî dikit bimaçekê yan dest perxandinekê,hindek Caran , destên bikiran dinav paxlên wanda yariyan dikin,ü desên wan jî diberûkên bikiran da,baş digerin.Hind hest dikin,tijî ber milên wan tişt bûn!**

**_ berî her bazarekê,divêt ez têr bixom,ez jibirsa mirim.**

**_ hemü gavan tûyê birisî!Dê were çavên xu biçerîne, paşî pirsiyara xwarinê bike.**

**_ ez jibirsa diniyayê nabînim.**

**_ dê were,da te têr kim,heker dê min xûy.**

**Jiwan kulkên van hejara bû xu kirîne bazaru pê dijîn. Avahiyekê çiwan û lêkday diyar dikir.**

Binê avahî,xwarngeheka xoş ü paqije,liserda wek otêla diyare.

_ eve xwaringeheka gelek xoş ü erzane.

_ eve hemû xwaringeh?Wesa diyare otêle jî?!

_ erê,otêle,lê ne otêla normal!

_ ew çewa?!

_ piştî xwarinê dê te têgehînim.

_nehewceye,ez têgehştim.Tû bela xodêy,çu tişt nînin,tû nezanî!

_ em yên livê diniyayê dijîn,divêt em hemü tişta jiwê bizanin,diniya wek mala meye,gondê meye.

Çewa em bimirin û çu jigundê xu,mala xu nezanin?!

_ tû nebes belay...Tû feylesûfî!

_ xuzî tinê min nîva te xwandiba !

_ mala xodê ava te nîva min nexwandiye.Heker da diniyayê xirab kî..

_ dê çi xûy?

_ma çi heye?

_ eve ne Kurdistane,dê deh rengên xwarinê hebin.Evê kartê bixwîne û bû xu jê bikire,heta çav reşa he biêt.

_ min soz daye,çav şîn nebin min nevêt.

_ dê zûy be,em nehatîne xwarinê bixwîn.Rêya me hêşta ya dûre.

_ dê hema tû bêje..Şeş lolebû..

_ ma dê çi bit jimirîşka rizî pêve!Em neşên çu xwarinên wan bixwîn jiber berazê heram.

_ mirîşk, mirîşk..Heta em hêka dikin.

_ bêje  ê?!

_ wey hizar cara  ê?

_ piştî xwarinê,em dê hindek tişta kirin bû biçûka,da çu pirsiyar û dûyvçûna nekin..

_ wesa diyare,tû gelek yê şarezay,dê me baş tûş kî?!

_ bazara van,gelek erzane,hindek tişta bû biçûka û bû xu jî bikire.Tiştên baş yên heyn!

**Nezanîn ka çewa xwarina xu xwarin,jilezada..**

**_ em dê jivêrê dest pê kin,çu kun û qolaça jibîr neke.**

**_bla,lê her êk kurê babê xu,Ez birêya xu,tû birêya xû! Em dê piştî seetek dî linik turmbêlê vêk kevin!**

**_ bila,hişiyar be!**

**_ ne tirse..Heta seeteka dî..**

**_ heta seeteka dî..**

**Her jidikana êkê,ew kiçên sinêle ü jinên dev bikenî, biçavên xu yên biçûk.Dihatine berahiya wan,destên wan digirtin,dikêşane nav dikanên xu yên pirî tişt.**

**Biherdû destan,ew cilik û kel ü pelên xu nîşa wan didan.Ciwanî û bihayê erzan,bû wan şirove dikirin.**

**Ageh jiçu nebûn,tinê dema destekê nazik jinav**

**Destên wan diçu der,licihekê xoştir digeriyan.**

**Linav wan bejnên kin,leşên zarokî,mêyatiya wan ya dijwar.Ser jihestên wan stand,hestê nêratiya wan har kir.Jidurhêlê xu derketin.dûrketin jihemü rengên peyweniyan.**

**Hind ageh jixu bûn,tijî bersîngên wan cill ü kel ü pelin!**

**Seeta wan,bû sê çarseet.Hêşta jivê kunê,bû yadî. Nêratiya xu diçerînin.Gelek caran,sê çar seredan dibirine warekê xoş.**

**Agirê dilê wan,nêratiya giyanê wan,bimaç ü perxandina çend paxlan razî nabit.**

**Çend ew kar dûbare dikirin,heza wan hartir dibû, dijwartir dibû,sinêliya wan nû dibû,dibûne gencên çarde salî..**

**Dikunekê ve,milên wan vêk ketin,biriyar dan,vê vistevala reş ü spî,bidawî bînin.Da germatiya leşê wan,hêza gencatiya wan,bû vistevaleka rengîn bimînit,vistevaleka kesk ü sor.Licihekê taybet.Jikumeka kiçan,jinav gelek bejin ziravan,êkê,duwa,bû dilê xu jê bigirin.**

**Licihekê tena,bêy şerm ü tirs,dinav lêvên wan yên sorda xu bidirustî,berze bikin..**

**Qesta turmbêla xu kirin.tijî dest ü bermlên wan tiştin, gelek jiwan tişta ew bixujî nizanin ka bû çine?**

**Gelek jiwan tişta bikêr kesê jibiçûkên wan jî naên.**

**Biçavên hilûy û şor,berê xu da ne êk.Şerim jiêk kirin.**

**eve cara êkêye,hosa şerim jiçavên êk dikin.**

**Serên wan man şor,herêkî diviya bizanit,ka hevalê wî çi kiriye?Çend lêv mêtîne?Çend dest girtîne?Çend paxil perxandîne?Çend cara xu pîs kiriye?**

**_ em gîro bûn.**

**_ erê..**

**Bê dengiya wan,hewar dikirin,hizar pirsiyar jê difirîn.**

**_ te çi kirîn?**

**_ niza...**

**_ niza?**

**_ erê niza... ü te?**

**Kenyê ser jiaxivtina wî stand.**

**_bawer bike,ezjî nizanim ka min çi kiriye!**

**_ dê siwarbe,eve pirove bûn,nêçîra mezin ya may.**

**_ma te hindek vîşek mayne,bû nêçîra mezin?!**

**_diyare te rextê xu her livêrê valakiriye?!Hişiyar be me şermzar neke!Ya tîr ya dibnî may...**

**_ nene,ez babê zelamame,ma te jibîr kir,şeva ew kiça ros jiber birayê te revî?!**

**_ birastî,te wê şevê serê me bilind kir,tû bibû nêrî!**

**_ iha hêşta ez ew nêrî me!**

**_ licihê şerî dê diyar bit,ka sehke pêsîra xu,rengê penteronê te yê hatiye gohorîn!**

**_ma penteronê min bitinê?Teyê xu dîtiye?**

**Keniya wan,ser jişermê stand.Tirumbêla wan kete ser cada serekî, berev pirag.**

**_ 4 _**

**_ navê te?**

**_ Husên...**

**_ welatê tû jê hatî?**

**_ elmaniya..**

**_hatî ye çi?**

**_ geriyanê..**

**_turmbêla te çi mudêl bû?**

**_ mudêl 98**

**_ çi cur bû?**

**_ marsîdis..**

**_ çi reng bû?**

**_ spî..**

**_ çi tişt dinav da bûn?**

**_ gelek tişt..**

**_ hemûya diyar bike,binav.**

**_ya jihemûyan girinktir,pasporta mine,ewên dî çu biha nînin.**

**_ divêt em bizanin,hertiştê dinav da.**

**_ dû çantên pirî cilik ü diyarî.hindek kaxezên taybet bikarê minve.**

**_ çi tiştên dî?**

**_ ez hind dizanim.**

**_ tû kesekî tawnbar dikî bidizîna turmbêla xu?**

**_ nexêr..**

**_ kesekî liwara çavdêriya te dikir?Te guman jiêkî bir? Dema te tormbêla xu dirawistand?**

**_ nexêr..**

**_ te liçi cih turmbêla xu rawstandibû?**

**Wî ziman zanê cezayrî,ewê jiçirka êkê bidüv wan ve, xu gelek wastandî,gelek telefon ü pirsiyar bû wan kirîn, bersiva polîsî da.**

**_ lipirag pênç...**

**_ divêt em cihê rûdanê bibînin.**

**Çend pirsiyarên dî kirin,dû polîs,digel Husên û Reşîd cezayrî yê zimanzan,liturmbêla polîsan siwar bûn,û çûne cihê rûdanê.**

**Şev ya karê xu dikit,pêlên sermayeka şermîn digel davên tariyê dibarin.**

**Serê xu bilind kir,kes nedît,hevalê wî digel polîsa çu, hest bitinêyatyê kir.**

**Dengê wî hevalê digel Reşîd cezayrî,jitinêyatiya wî îna der.**

**_ eve ew çûn,dê gîrobin.**

**_ dê kîve çin?**

**_ dê çine cihê rûdanê,ew karê polîsane.Tû neyê birisî? Neyê têhinî?!**

**_ jişerim ü xeman,min ageh jiçu nemaye.**

**_ xema nexû,malê diniyayê qirêja destane.**

**Bibure,navê min Ehmede,jişepirzeya me,me jibîr kir pirsiyara navên êk bikin!**

**_ navê min Hesene.Tû ne cezayrî?Mane?!**

**_ ez îraqî me..**

**_ em jî,em kurdin.**

**_ ez dizanim,jiaxivtina hewe diyare.Hûn xelkê çi deverêne?**

**_ Kurdistanê..**

**_ Kurdistan nihu gelek xûş û tenaye..**

**_ raste,gelek xûşe,lê heta kengî?**

**_ ew dimînte liser xelkê wê!**

**_ biriyar ne didestê xelkê wê daye.**

**_dê were da biçine vê gazînûyê,tiştekî vexwîn û dê suhbeta xu kin.**

**_ dê keremke.**

**_ çend salin,hûn lielmaniya?**

**_ pitir jideh salaye.**

**_ kar dikin?**

**_ car car,kar kême,jiyan bizehmete,û tû liçîk çi dikî?**

_ ez jî yê livêrê rawestiyaym.piştî gelek welat têkvedayn.

_ çewa dijîn?Wek ez dizanim,livan welata kar nîne?!

_ bû yên wek me,herdem kar heye,em xu jiçu kara nadine paş.

_ liwelatî,reşa malbatê çewaye?

_ mirine,bê kariye,bê omêdiye.Kuştin û tirs û birs.Taybet libexda,cihê malbata min lê dijît!

_ raste,gelên îraqê hemû dizfirokeka dijwarda dijîn.

Hevalê wî cigara xu berdayê,dinav hizra da,digel dûkêla cigara xu bilind bû.

Çavê xu licihî gêra,cih nexşandiye jimêvanan.

Wek qeftên gola,her dû evîndar liser mêzekê yên ketîne şerê evînê.

Lihindek kun û qolaçan,dû evîndar,yên dikuka xoşyê da dijîn.

Kenî jihemü devan mizgîniya paşerojeka geşe.

Hindek,hêşta negehiştîne Miradan,yên lihîviya nêçîreka gêj!

_ berê xu bide van!Keniya wan,suhbeta wan,jiyana wan.Evan çi heye?Çi jime zêde heye.Bi çi dixurin?

Jinav dûkêla çigara xu derket.

_ mejî...!Mejiyê wan,gelek jiyê me saxlemtire!

_ erê ew gaz û dahatûyê me didestên van daba.Da çilê kin?!

_da çine ser banê stêra,ü erdî bû me hêlin.

Keniya wan jituxîbê mêza wan ya biçûk derket.

Serinca herdû kiçên jiwan wêve rakêşan!

Şerê girinjînê û lêv gezandinê dest pê kir.

Livan welatan,tiştê herê pîroz,hevalîniye,hevalîniya kur û kiçan,nêr ü mêyan.Kes bigirinjînê têr nabit.

Rengê pirça wan,gezandina lêvên wan,her dû kiç, wek megnatîzî kêşane mêza xu.

_ biburin,em dişên linik hewe rûnin?

_ heker çih nebit,werine ser serê me!

Kenî tijî cihî bû.Hesenî zanî çavzilkana wî nêçîrek kir.

**Lê nezanî ka egerê keniya wan çi bû.**

**Bêy çu dadwer malê wan lêkvekin,her kiçekê bû xu êk helbijart û ronişte birexve.jiçavzilkanê,ketine dest perxandin û licihên xûştir geriyan.**

**Kiç livan welatan pêdivî çu jivan û huzan û mêranyê nîne.**

**Girnijîneka jidil,çigarek,perdaxeka bîrê.Eve next û nîşaniya wê ne!**

**Markirin,tinê mêtina lêvane.şahî dengê keniya dilê wane,cih û war,sîngê teye,bawerî,girnijîna lêvên tene!**

**Dem kete jêr kartêkirina valywmê.ageh jidûrhêlî neman.**

**Xem,nexoşî,şerim.ew hevalê jigiyanê xu xoştir divêt,ü nihu dibin barê giranê xemnda dinalit,jibîr kir.**

**Ew bejnên zirav,ew pirçên zer,bûne pelên dijwar.befira kul û xemên wan yên turmbêlê,helandin.**

**Xema wî ya jihemûyan girantir,nizanit dê çewa bicilkive kite dinav dilê xuda.**

**Herçende,zimanê wê jî nizanit,lê livî welatî,û licih ü delîvên hosa çu ziman pê nevêt.**

**Dest digel destan,çav digel çavan,lêv digel lêvan.**

**Ma ziman bû çiye?!**

**Dengê telefona diber tenişta hevalê wî ra,jinav pirçên zer înane,ser xemên reş.**

**_ hûn likîvene?**

**_ eve em hatin.**

**Berê xu da hevalê xu.**

**_ divêt em biçin.**

**_ ew kî bû?**

**_ hevalên me zifirîn,yên lihîviya me.**

**Wek biçûkekê jiber sîngê dayê rakin,eniya wan bû girê.**

**_biburin,em neşên pitir digel hewe bin.**

**_ heta dîtineka dî..**

**_ heta dîtineka dî..**

**Her gavek dihavêtin,dû sê cara lipişt xu dizifirîn.Jikeniya wan û girnijîna wan têr nedibûn.**

**Lirexê dî yê çadê,baregayê polîsan,avahiyekê sêwy û bê rewşe.Hevalê wî û ew zimanzanê cezayrî,wek dû peykera libenda wan bûn.**

**_ hewe çi kir?**

**Çu axivtin jihusên nehatin,jitura hizirên xu derneket.**

**_ jibîr bikin,turmbêl çû,tinê serê hewe sax bit.**

**Nav çavên hevalê wî,zerbibûn,lipêş çava bibû mirovekê dî,ne ew Husênê keyfxûş û yarîkere.ne ew hevalê pare linik wî tinê jibû zik û bin zika peyda bûne.**

**_ kak Husên..Xema nexo,ez dê bihayê turmbêla te hemüyê dim,tinê xu ture neke!**

**Serê xu bilind kir,her wekü aveka tezî bileşê wî yê germ da kirî.**

**_ mala te,tû çi dibêjî?!Hizar turmbêl gorî binê pêlava te bin.Xema min ne turmbêle,xema min gûtinên xelkîne.**

**Dê bêjin,çubûne çi lipirag?Tû baş xelkê me diniyasî!**

**_ bila serê xu lidîwara bidin,ew ne mavê wane.**

**Em Azadin dijiyana xuda,kesê mav nîne dadkirina me bikit.**

**_ erê..Lê gûtinên wan..**

**_ herkesê behsê me bikit,ez dê baş bersiva wî dim.Ez kesê jixu şerîf tir nabînim..**

**_ ya jihemûyan baştir,bila kes nezanit eva hatiye serê me.**

**_ ez jikesê neditirsim û ne şerim dikim.liser hemüyêra,vê sohbetê bû kesê nakim,û kes jî neşêt vê pirsiyarê jimin bikit.Û min gelek pêxoşe,bihayê turmbêla te ez bidim,tû mêvanê minî!**

**_ heker tû carekadî vê sohbetê bikî,ez çucar hevalîniya te nakim,turmbêl û pêlava te!**

**Reşîd cezayrî,herdestekê xu dana ser milê êk jiwan.**

**_ wek min gûtî,turmbêlê jibîr bikin!Nihu hewe çi libere? Dê çi kin?Direngî şeve,hûn dibirsî û wastiyay ne.**

**_ bibûre heval Reşîd,me tû gelek wastandî.**

**_ min we ne gût.min gût hûn dê çi kin?Ma hûn ne dipirsî û wastiyay ne?!**

**_em dê zifirin elmaniya..**

**_ vê şevê?**

**_ erê,ma dê lihîviya çi mînin?**

**_ nene,hûn gelek diwastiyay û turene,em nahêlin hûn hosa biçin.Ev şeve lime bibine mêvan,û sobehî bidilê xu herin.**

**Her êkî biriyar hêla didestê yê dî da,çavên wan ketin êk,her zü jêk vekirin,dinav ewrên xemada neqandin.**

**_ serşoştin,xwarin,nivistin.Dermanê heweye,dê hemü xemên hewe digel ava serşoyê çine xwar...**

**Reşîd cezayrî,eve pitir jideh salaye liçîk.Wî jî wek gelek tulazan, jiyê xu hemüyê likulanên ewropa binexuşî ü dikempên penaberiyêve burandiye.**

**Mavê penaberiyê liçu welata ne wergirtiye.Welatê wî jî gera bêkarî û hejarî û şeraye.**

**Liçîk dikuşa jineka çîkî da penaberî wergirtiye.**

**Ew jin welatê wiye,dayka wiye,hevala wiye,paşeroja wiye!**

**Roj bû rojê,girêdana wî biwê jinê ve mikumtir dibit. Welatê xu jibîr dikit.Kurê wan yê çend heyvî.Tameka dî yadaye jiyana wan.Berxudana wî xort tir kiriye.**

**_ hewe çi gût?Eve demekê dirêje min kurê xu ne dîtiye,direnge,ez yê jê xerîb bûym!**

**Keniya wî,tama hevalînyê jê dihat.**

**_ gelek supas,hewyana me liçu ciha naêt.**

**_ malê diniyayê bû xu nekine xem,hema hûn disax bin...**

**Dengê muzîka telefona Hesen,hemû şir kirin.Telefon ji berûka xu îna der,jimara mala wî liser xûya kir.**

**Berê xu da hevalê xu Husên.**

**Her wekü Husên lihîviya pirsiyara wî.**

**_ male! Çibêjimê?!**

**Bidengekê pir xem û kuvan ve gût.**

**_ hişiyarbe!Bila nezanin,da dilê wan jî ne êşit.**

**Telefon da ber gohê xu,jihevala dûr ket.**

**_ helû?**

**_bab,hûn likîvene?Te bû min ew tişt kirîn?Te çi û çi kirîne?Dê kengî zifirin?!**

**Pirsiyarên wî,wek libên tizbiya dane dûf êk,dengê hindek biçûkên dî jî dihat,lê dengê dayka wî jiyê hemûyan bilind tirbû.**

**_ bêjê dê kengî zifirin?Bila xu gêro nekin,bila her ev şeve bizifirin!**

**Çu axiftin jihesen ne hat,tinê her digût.**

**_ erê.. Bila..Her tiştê te bivêt min yê kirî..**

**_ dê bizifirin..Werine mal..Hûn çi dikin?**

**_ bila kurê min,em dê zifirin..**

**_ ev şeve?!Ez nanivim heta hûn bizifirin û tiştên min bînin..**

**_ ne,divêt tû zü binivî,dibit em direng bigehine mal..**

**_ nene.. Zû werine mal!**

**_ başe.. Başe,lê zü binive...Bila?**

**Telefon jidestê kurî îna der.**

**_ Hesen?Ma hûn nazifirin?!**

**_ ê...Dibit em sobehî bizifirin..**

**_ wenekin!Em bitinêne limal,sebra mejî naêt...**

**Werine mal..ê?**

**_ bibure,pîçeka nexoşyê ya bû me dirüst bûy,dibit em gîro bin!**

**_ nexoşiya çi?Te dilê min qetand?!**

**_ nene,çu nîne,netirse,nihu direnge,em dê sobehî zifirin.**

**_ hay jixu hebin!Û gîro nebit!**

**_ heta sobehî..**

**_ heta sobehî..**

**Çavê hemûya lidevê wî bû,ligehên eniya wî bûn, lirengê rûyên wî bûn..**

**Gohên Husên dibel bûn.Ka dê çi peyv jê derkevin? Ka dê musîka dengê wî ête gihorîn?**

**Rengê wî zer bû.gewriya wî hişik bû.Ew xwîna may dirihên leşê wî da,hişik bû.**

**Reşîd,diviya hemû tişta bizanit,diviya jiwê tengavyê dûr bikit.**

**_ mala te bû?**

**_ erê,kurê min bû.Pirsiyara wan çill û diyariya dikir, ewên min kirîn ü mayne dinav sindoqa turmbêlê da.**

**_ xema nexû,ez dê sobehî dû car sê car,hindî wan bû kirim û digel xu bibe.**

**_ supas,tû camêrî..**

**_ çu supasî pê nevêt.Dê da biçine mal,da hûn bêhna xu vedin.Hûn gelek diwestiyayne.**

**_ mal te ava.Me pê xoştire,em biçine otêlekê! Pansyonekê!**

**_ bikeyva hewe ye,lê divêt her hûn tiştekî bixwîn.**

**_ ma dê dilê kê çite xwarnê?**

**_ biraynû..Tiştek bû û burî.Divêt xu hind ture nekin.jiyana xu têk bidin.Diniya û pare,biber çu nakevin,tinê giyanê hewe û yê biçûkên hewe disax bit.**

**_ ez ne dixema malê diniyayê me,xema min,gûtinên xelkîne.**

**_ bila xelk ezmanê xu bicût,kesê çu mav lime nîne.**

**_ dê geremkin!Hûn diwestiyayne.**

**Liturmbêla Reşîd cezayrî soyar bûn,beref pansyoneka linik wan berniyas cûn.**

**Reşîd û hevalê xu yê îraqî,dihemü kun û qolaçên pirag şarezane!Cihên erzan û bê bela baş diniyasin.**

**_ ev pansywna em diçinê,gelek erzan ü xoşe..**

**_ şeveke.Em dê burînin!**

**_ cihê daxê ye,me hûn divî deravî da niyasin.Lihîviya careka dî,hûn bên,da em baş xizmeta hewe bikin. Cihên xoş nîşa hewe bidin!**

**_ pirag,liber dilê min reş bû.**

**_ nene,divêt her em tûla xu lê vekin..**

**Kenyê,wek biçûkekê sêwî,lêvên wan nexşandin**

**Lê her zü digeriya Husên da xendqî.**

**Turmbêl kete nav pêlên cadê.Tariya şevê,xemên giran,serê aloz...**

*****

**... Serê hêstira barkirî,didestê çepê daye.**

**Dû hêstirên dî bidûvra digirêdayne.**

**Kilaşînkuva babê wî didestê rastê daye.**

**Bejna wî,jibejna wê kilaşîkuva bûye yara wî,**

**Negelek dirêj tire!**

**_ ev tivenge,giyanê te ye!Her demê te hêla,ne êye mal !Başe?!**

**Berî hemü hevalan,rê dişeqand,jihemüyan şareza tirbû,xoştivyê hemüyane..**

**Her çend şeveka,dûsê tuxîb dibezandin.Êran..Îraq.. Turkiya.**

**Çend parên xelkê wê çadirgeha bu wan,bûye welat. Kum kirîne.Digel hindek kesên jibû jiyana xu û ya biçûkên xu.şevê gelek cara giyanê xu dikine diyarî.**

**Direngî şev,bidizîve,berev tuxîba didine rê,qesta turkiya dikin,jibû kirîna hindek pêdvyên çadirgehê.**

**Hosa xu û herdû jinên babê xu digel kumeka biçûka xudan dikit.**

**Vê carê,liher sê tuxîba digel hindek hevala yê hatiye durpêç kirin!**

**Pasdar,jilayê rojhelatve..Cendirme,jilayê bakur ve.. Leşkerê îraqê,jilayê başûr ve...**

**Şere,agir jiesmana dipeşit.Lihindav serê wan,sê rengên firokan xu dixon,top ü çekên giran,wek barana biharan dibart.**

**Her sê hêstir bibarve revîn.Heval,terabera bûn.**

**Kes lidura nema.tinê ew bejin şora kilaşînkufa babê wî,kiriye didestada.**

**_ eve giyanê teye!Lipişt xu nehêlî !**

**Biwan destên biçûk,sirmê kilaşînkufê kêşa.Biwî dilê nazik,ü wê hizra çarde biharî,wan çavên mixazirî.**

**Şer digel sê dirindetirîn ü hoftirîn leşker licîhanê kir.**

**Bizîx ü zîrekî ü şarezahiya xu.şiya xu bigehînte cihekê tena.Lê xwîna dilê wî,û gûtinên babê wî,leş lê xuwarin.**

**Mêraniya babê wî,dişer ü xebatê da,wek fîlmekî dihate pêş çava,û gûtinên wî dubare dibûn.**

**_ hişiyarbe!Hevalên xu litengaviya nehêle!**

**_ hişiyarbe!Xu nede destê dujminan!**

**_ hişîrbe!Jiqada şerî ne reve!**

**xu berda didilê gelî da.Ber bû berî,tiraş,bû tiraşê.**

**Heta xu gehandiye hindek hevalan.**

**Çavên hevala bibejna wî ketin,devên man beş bûn,tijî dilên wan hîvî bûn.**

**_ Husên?!Tû yê bisilametî?Em ketibûn dixema teda!**

**_ min her zû xu xilas kir,ez yê litana hewe hatîm.**

**_ em bawer dikin!Tû mêr korê mêranî!**

**_ ü hûn?Çu likesê nehatiye?**

**_ em herdû dibirîndarin,lê birînên me disivkin..**

**_ ka hevalên dî?**

**_ em jî nizanin!**

**_ divêt ez liwan jî bigerm.**

**_ ne,ew dişarezane,xema wan nexo,heker bisilamet bin,dê gehine me..**

**_ dê hilûn,da vî cihî bihêlin,hêşta leşker ne hatî ye xwarê jifirokan...**

*******

**_ keremkin,eve pansyone..**

**Cilivek biHusên ket,leşê wî hemû hejand.Axînkek rahêla,bû kul didilê hemûyan da.**

**Pansyon,dinav pencên daristanka tarî da nivisitiye. Herwekû jibajêrî dûr,bêdengiya wê,pîsatiya cihî,digel xemên wan têkel bûn.Tirsa wan zêdekir..**

**Rengê girtîxanên leşkerî dida.Mêvanên wê hemû hejar û kêm parene.**

**Bêhna pîsatyê,digel ya kiholê têkel bûn,digel bê dengyê,wek dîmenê fîlmekê tirsê xûya dikir!**

**Liber derê serekî,zegzegekê zelama hate pêşiya wan.**

**Jitariyê,ser ü çavên wî baş nedîtin.Tinê çend dularek xwastin,pêtivî kaxez nasname nebû!**

**Ne xwaringeh,û ne gazînûye.hindek jinên jijinkatyê ketîn,xizmeta mêvana dikin.**

**Lidawya wê kolana tarî,derê joreka bê seruber bû wan vekirin.**

**Wekü girtiya ketin ser wan çihên gelek pîs û ne lêkday.**

**_ eve em dê çin!Sobehî zû ez dê êm.Ka hewe çi divêt? Ka dê çi kin?**

**Ez amademe!Lê hîviye,hûn baş û tena binivin,xema tiştê bûrî nexwîn!**

**_Gelek supas,me hûn wastandî.**

**_ çu supasî pê nevêt..Heta sobehî..**

**_ heta sobehî..Çavê kurê xu maç bike..**

**_ supas..Şeveka xûş.**

**Digel dengê girtina dergehê jora wan.Dergehê xem û hizirên wan vebû..**

**Çih şir bû,tarî tijî jor bû,livîn jitirsa hizrada bê giyan ma.**

**Jibêdengiya jorê,zingên jiperdên gohên wan dihat.**

**Tinê hindek çaran,demê êk jiwan,ew bayê genî jihinavên xu dihavête der,dibû volkan û barove.Gohên hevalê xu diêşandin!**

**Digel wî bayê şer digewriya wanda dikir,ü dibû axîng û derdiket.Dihatine ser hişên xu,lê carekadî dibûne hêsik dinavbera,hizir ü xem û xewêda.**

**Çavên zil,mejî lê hişik kirin.Gehên leşê wan,şere digel cihê biyanî,Nalîna wî,xewê direvînit.**

**Yê diçeperî da maye asê,lihemû rexa dujminin,fîşekên wî nemayne,heval didûrin,liesmana,jiber firoka û  muşekan,duayên wî nagehine gohên xodê!**

**Dengê qotana dergehî,dilên wan qetandin.**

**Herwekü sîxorên dujminî,dergehê girtîxanê lê vekirîn,da biriyara dadgeha reş bicih bînin..**

**Herdû,wek dû şerkera,rabûne ser piya.Rengê wan zer û pêtî bû,berê xu dane êk!**

**Şerm jiêk kirin,berê xu dane cihê dengî..**

**Dergeh vebû.Tirsa wan zêdetir lê hat.**

**çewa dergeh hêlabûn vekirî,liwelatekê wek çîk?!**

**_ biburin!Hûn pêtivî çu nînin?**

**Jineka wek zelama,didanên nîv rizî û nîv zêr,hilda jor. Linîva herduwa rawestiya.**

**_ ne,supas..Tinê me divit,em binivin.**

**Dengê qotana dilên wan,sist bû,ew xwîna leşê wan, ya berî wan nav çavên zelamkînî bibîn,hemû revî bû nav mejî.**

**Piç piçe,jurda hate nav gehên xav ü zerbûyn..**

**Dergeh lipişt jinê girtin,hindî xu hejand,xu mê kir, devê xu bikenî êxist.Neşiya çavên wan yên teyîsuk jigirtîxana xema azad bikit...**

**Şev,jinîvyê bûrî.Ketin beramberî êk,jitirsa xew jê sil bibit, pişta xu dane êk.**

**Jûrda,digel pêlên dijwarên hizrada çûne xwarê..**

**_ 5 _**

**_ şeva me jinîvyê bûrî,xewa me naêt,eve çend sale,ez hindî ev şeve nekenîme.xodê xêrikit!**

**_ bawer bike,dijiyana xoda,ez hindî ev şeve ne kenîme, ü çucar hosa min behsê zelamê xu nekiriye,erê.Xodê xêr kit!**

**_ ne tirse,wek te gûtî,dîwana wan ya germe,ew ne çûyne berê beytê.Ya jiwanve,em nizanin ka çi dikin?!**

**Kenî,dîsan bilind bû,biçûk hemû dinivistîne.keniya xu lidûv direngiya şevê û nivstina Biçûkan kêm dikir.**

**_ tû bêjî,dê ev şeve bitinê nivin?!**

**_ ez bawer nakim,yê min bişêt bitinê binivit..**

**_ pa hema yê min agire...Ez bawerim,nihu dû sê liber tenişta wîne !**

**Keniya wan,tuxîbê dem û cihî bezand.Dû sê Biçûka,xu dinav cihên xuda qolopandin.**

**_ erê,hemü jin dizanin zelamên wan van kara dikin?!**

**_ nene,hindek mala xu wêran dikin,tinê jiber gûtinekê, yan sohbeteka direw.**

**_ zelamên me gelek dibaşin.Wek jina qereç gûtî.**

**Zelamên me,dixoşmêrin,dimerdin.Tinê jilayê namûsê ve disistin...**

**Keniya wan dûsê biçûk jixew hişiyar kirin.**

**Hatine ser hişên xu,piştî kenyê ser jihestên wan standî.**

**_ dibit hejara ageh jihindê nebit,bû karê xu çubin!**

**Eve çend sale jimal dûr neketîne,bila çend rojeka biserê xu bikevin,jinav biçûk ü xemên mal dûr kevin!**

**_ mejî çu ne gûtiye,tinê bizifirin,nemînne likulana,bû xu ne kine kar.Wek gelek zelama..**

**_ erê..Wek tewafa hecê,salê carek dûcar..**

**Kenyê ser jiaxivtina wê stand,neşiya sohbeta xu bidawî bînit.**

**_ ne tirse!Heker cihê mêrî limal yê xoş bit!Çucar qesta derê nakit!**

**_ kiçê,nê hindî jinkên van welata dicanin,qehba,bixodê zelam diheqin bidûv bikevin!**

**Kenî tijî jor bû,kenyê kuriya hizra kêşa,dem yê bileze, livîna biçûkekî,hizirên wan cemandin.**

**_ ma tû na nivî?!**

**_ xewa min bêy wî naêt,eve demekê dirêje,ez bitinê ne nivisitîme!**

**_ xodê dizanit,êka çewa licihê te nivisitî ye..**

**Bi keneka bilind ve.**

**_ ez bawer nakim bihêlit binivit..**

*****

**_ binive..Bes xu biwasitîne!**

**_ xewa min naêt.**

**_ jibîr bike,wek gelek nexoşiya..**

**_ raste min gelek nexoşî dijiyana xu da dîtîne,lê wek ev şeve,wastiyan û tore ne bûyme!**

*****

**Raste,min gelek xoşî dijiyana xu da dîtîne,lê wek ev şeve,ez ne kenîme!**

**_ min kenî jibîr kir bû,kes nebû digel bikenim,me demê kenyê nemaye!**
**_ jiyan pêtivî kenî û sohbet ü têkelyêye.Taybet livan welatên sêwy.**

*****

**Pa ez çi bêjim?!Pare korî binê pêlava te,gûtinên xelkî dê min kujin,ez xu gelek diparêzim.**

**_ birastî şeveka reş bû!Nîveka jiyê min sût!**

*****

**_ Birastî şeveka gelek xoş bû.jiyan liber min geş kir..**

**_ divêt hûn çend rojên dî jî linikme bimînin,ez ji sohbeta te têr nabin.**

**_ hûn jî werin,bila bes em bitê bijîn,şeveka hosa, diniyayê bihemû parên wêve dînit.**

**_ ez çucar vê şevê jibîr nakim,divêt her çend heyveka,em hosa kûm bibin!**

*****

**_ şeveka hosa,hemû xoşyên diniyayê disojit.**

**_ gelek şevên nexoş min dîtîne,gelek şeva birisî nivisitîme,liçol ü aqara mayme,şer ü serma,tirs.**

**Wek ev şeve,ez tore ne bûyme!**

**_ binive,nivistin ü jibîr kirin,dermanê mene..**

**_ ne ez dişêm binivim.Û ne ez dişêm jibîrbikim!**

*****

**Xew ü kenî,bibûn dû biçûkên şûym.Dinav lihêva germ û paqijda,dest ji şûymatyên xu bernedidan.Gelek cara, tüxîbê lihêvê derbaz dibû,tijî wê jora cihên wan lê danay dibû.**

**Wek dû zorbazan,dibû şerê xewê digel kenyê.**

**Her çendekê,êk biser diket.**

**Herduwa,şer bû digel spêdê,spêde,herdem ya serketiye,lê bû demekê kurt,şev zirtekên xu kum dikit, dîsan hêrişeka dijwar dibite pêşiya rojê,lê dikite şev!**

*****

**Xew,û axînik û peşêmanî ü şermzarî.Didadgeha rewşt ü dîn û binemal û durhêlî da,gonehbarên dirinde bûn....**

**_ tû mirovekê bê namosî..Bê şerefî..**

**_ çi jite kêm bû?**

**_ xudan jin ü mal ü biçûk.Te çi divêt?Liçi digerî ?**

**Te gohê xu da binê xu.Serê me hemüya çemand.Hey tiff....**

**_ min çu nekiriye..**

**_ hişiş..da gelek tişta kî.Heker eve nehatiba serê te..**

**Dadwerê dînî rabû serxu.**

**_ cihê te cehnema sore,tû zinakerî.Mirovê zinaker,dê hetahetayê biagirê cehnemê sojit.**

**Liroja rabûnê,dê çi bêjiye xûdê xu?Dê çewa bersiva xu dî?Yên wekü te,bê dadkirin,cihê wan cehneme.**

**Dadwerê rewşta rabû,hemû jipêjve rabûn ü xu bû çemandin.**

**_ eve lidemê mirina wî,lê dijiyana xu da dê mirovekê rûreş ü şermzar bit,dinav mirovên xu da.**

**Dadwerê binemalê,nehêla hevalê wî gûtinên xu bi dawî bînit..**

**_ te nebitinê rûyên xu reş kirin...Te em jî bêbiha ü şermizar kirin,eve te çi îna serê me?Heqê te çiye?**

**Bikuştinê,bisotinê.Bêhna me naêt.Heta heta,te navê me hermand...**

**Lidûr xu zifirî,didanên hemûyan diçîq bûn.Hemû lihîviya biriyara dadwera diamade bûn.**

**_ hey hewar..Min çu nekiriye!Min kes nekuştiye!**

**Min malê kesê nexwariye!Çima hûn behsê wan nakin, ewên welatê xu difiroşin?!Ewên giyanê xelkê xu dikine dular ü libankên eropa diveşêrin?!Çima hûn behsê wa nakin,ewên ter ü hişka pêkve disojin?!**

**Dadwera,devên xu birine bin gohên êk.Çavên xu yên sor lihindek efirîta neqandin.**

**Werîsekê zifir,jiesmana hate xwar.Kete tayê dargûzeka pîr.**

**Milên wî girtin,dane ber mist û pêna,libinê dargûzê. Gerdena wî dixilfa werîsî baş çiklandin.**

**Herçend dadwera,digel xelkê hejarê welatî serê werîsî kêşan.Heta pêt wî jiaxê bilind kirîn.**

**Bêhna wî çik bû,xu gevizand,berevanî jigiyanê xu kir.**

**Biqêriyeka şêtane,hevalê xu jinav wê xewna dirinde hişiyar kir...**

**_ Hesen... Hesen.. Texêre..?!**

**Rûnişte ser cihê xu,berê xu da cihî,zanî vêcarê jî jinav pencên xewneka kirêt rizgar bû.**

**_ hey hewar...Eve çi xewn bû?!Eve mirin bû.Ne xewn!**

**Bibure,min tû jixew hişiyar kirî.**

**_ mala te ava,heker ez hişiyar ne bam,dibit ez jitirsa dixewda mirbam!**

**_ jitirsa..?Tirsa çi?!**

**_ xewneka jiyate kirêt tir!binive dê paşî bûte bêjim.**

**_ binivim..?Ez newêrim binivim!**

**_ roj çu nemaye.pêkulê bike binivî,da newastî.**

**Çav man zîq,bêhinhilkêşana gewriyên wan,dengê firokên şerî jê dihat.Her livîneka wan,her xu qolpandinek jilayekî bû yê dî.dengê reniya befirê jê dihat.**

**Dengê dest qotanê jimijulankên wan dihat!**

**Qotana dergehê jora wan,biriyara dadwerekê rast**

**Bû.jisêdara xew ü xewnên girêt,rizgar kirin!**

**Wek komanduwa,xu jinav nivînên xu yên lipêş çava wek tevnekê jiagirî vehandî,havêtine der,soz dan êdî ne çine nav wan nivînên pis da.**

**_ spêde baş...Hîvî ye hûn têr nivistbin!**

**_spêde baştir,nivistinê dil û mejyên tena divên!**

**_ ne,ez vê çendê jihewe razî nabim.Wek ez dizanim, hûn îraqî û taybet kurd,tuşî gelek nexoşiya bûyne?! Herdem hûn diserketî û biomêdin.**

**Turmbêleka kevin û çend pare,hewe jihîvî û jiyanê bê bar nakit.**

**_ kak Husên...Heval Reşîd rast dibêjit!Heker dê hukî,ez dê bihayê turmbêla te dim û..**

**_ kuru,sed turmbêl û pêlava te.Min gelek cara,deh car pitir jidest daye,ev cihê em lê,cihekê pîse.Cihê pûçaye.**

**_ hilûn,da hewe bigehînme westgehê tirênê.**

**Hûn dê min jî tûş kin,eve çend saleke,ez yê pîçek biomêd ketîm.**

**_ bibure,kak Reşîd,birastî me tû wastandî!**
**bikeniyeka dilveker,destên xu bilind kirin..**

**_ ez gelek pêxoşhal bûm min hûn niyasîn.**

**Berî çend heyveka,ez jî lielmaniya toşî nexoşiyekê bûm,kabirayekê kurd ü jibajêrê hewe,û xelkê welatê hewe,limin bû xodan,ez jidestên polîsa rizgar kirim,û bihayê bilêta min jî da û ez hinartme mal.**

**Anku,eve qenciya wî kurê kurde,ez nihu liser xu radikim..**

*******

**Pirag...Wek kiçeka sinêle,pirç zer,jixew radibit.**

**Pirça wê ya ne şe kirî,biser milên wê da şor bûye.**

**Pitir mêyatiya wê diyar dikit.**

**Pêhina şevên kes û sor,jihemû kulana diêt.Herkesê,nan û ava wan vexwar,neşêt gelek dûr kevit.**

**Sed qeda biher hevit birayên wê yên rût ü zirtek bikevin.**

**Kes neşêt,bisanahî wê pirça bijale şe kit û wan rûyên nazik ramosit.**

**Divêt baca wan bidit,divêt bihayê ciwanyê bidit.**

**Welatekê seyre..Pêşketin,mirovayetî,roşenbîrî.**

**Lê birsê û bêkariyê tuşî gelek şaşiya kirîne.**

**Dizî..Dikuşa biyaniya da nivistin..Tiştekê berbelave.**

**_ bila bû te dinav dû nana dabit..Pirag!**

**Nehêla dengê wî bigehite gohên hevalê wî.**

**Hevalê wî,yê digel sîmerxên hizirên xu zifiriye Wê roja kelexê herdû hevalên xu hêlayne lixesta pirag.**

*******

**_ navê te?**

**_...**

**_ welatê te?**

**_....**

**_ tu van diniyasî?**

**_...**

**_ kê ev kare kiriye?**

**_...**

**_ divêt tû biaxivî,heker dê ev gonehe kevite ser te..**

**Dibit te ew kuştbin!Erê..Ma kî wan diniyast?**

**Te bû kuştin?!**

**Berê xu da nav çavên wî polîsê boz û çav şîn.**

**Serê xu hejand,hindek gûtinên wî gehiştin gohê wî..**

**_ bibure,heker tû harî me nekî, em nagehin rastyê,em çu nizanin!**

**Polsî berê xu ü pirsiyarên xu dane wî şofêrê wê şevê digel Hesenî,ew kelex înayne xestê..**

**_ ü tû?Te liwêrê çi dikir?Tû çi dizanî?!**

**_ ez birêya xu diçûm mal,ev kese wek har ü dîna hate pêşiya min ü rê limin girt,min hest kir ku dize,lê piştî ez jiturbêlê kêşayme der,min zanî wî harîkariya min divêt.**

**_ ê..?**

**_ min û wî,kelex havêtine diturmbêlê da û hatine xestê.**

_ û paşî..?Direnge,hewe ez şêt kirim?!

_ ez jivê zêde nizanim..

_ kes liwara nebû?Te goh lidengê golla nebû?

_ nexêr..Lê min divêt bêjim!

_ bêje..Her tiştê tû dizanî bêje!

_ heker vî kesî ew kar kirba..Dişiya gelek bisanahî xu veşêrt,kesê çu jê ne dizanî.Wesa diyare,eve hevalên wîne,yan mirovên wî yên gelek nêzîkin?!

_ ez jî wesa bawer dikim,lê divêt baxivit,tiştekî bêjit,harî me bikit,ew dîdevanê bitinêye!

Dengê çûna turmbêlê sist bû,hişên wî cemiyan.

***

_ eve em gehiştin westgehê,kerem kin.

_ malate ava.

_ divêt tû bû me bilêta jî bikirî..

_ ne tirsin,heta tirêna hewe birê nekevit,ez hewe nahêlim.

_ hîviye,em bişên rojekê qenciya te liser xu rakin.

_ tinê hûn belênê bidine min,ku hûn vê şev û rojê jibîr bikin,bila çu ciha didil û mejyê heweda ne girt..

_ jibîr kirin..aax,heker jibîr kirin neba?Da çi ête serê mirovî?!

***

(iha livêrê bû..Eve şûn gevizka wane,erê iha livî cihî bû!

Eve hêşta cihê golleyên wane liser vî dîwarî..

iha ketine vêrê..Eve şopa xwîna wane..Hêşta tijî difinên mine!

Erê...iha liverê bû !)

*******

**Westgeh kun mêriye.çend xelkê wî bajêrî liwêrê kum bûye.Jiyan dikuka livîn û karî daye.**

**Liser hejariya wan,jiyaneka xoş,bikeyv û kenî dibûrînin.**

**Xemla kiç û jina,serinc rakêşe,mêyatiya wan ya aşkira ye,jidûr gazî dikit.**

**Ne kiras ü vistanên bihizara,ne sorav û spiyavin.**

**Ne kil û qayîşên zêrîne!**

**Çu pismam û kurxal,zêrevaniya wan nakin.**

**ne xwastyên çu kur axa ne.ne dilandikê da likurmamê hatiye mar kirin.**

**Gelek disadene,gelek diheval xoşin.**

**Tinê penteronekê kabûy,kirasekê sade,pirçeka zer, bisanahî serda diberdin.**

**Zû razî dibin,zü sil dibin.Mara wan,cigarek û perdaxeka bîrêye.**

**Daxwaza çu next û nîşaniya nakin.daxwaza çu qesir ü navmalyê nakin.**

**Xwandevane,şarezane,evîndarên jiyanê ne.**

**Çu mavên xu yên siroştî jidest nadin.**

**navê çu seruk û rêbera nizanin.**

**Hejariya wan liberamberî welatên dewir ü bera,çu jiberxudana wan bû jiyanê kêm nekiriye.**

**Kes hest biwê cawaziya mezin dinavbera wan û cîranên wan yên xudan şiyan da nakit.**

**Tinê,qeda bihejariyê bikevit,bibê kariyê bikevit.**

**Dizî,ya bûye vayrosekê berçav,gendelî ya bûye persîv jidifna polîsa şor dibit.**

**Divên wek cîrana bijîn.neşên bihayê jiyanê kum bikin.Nevên jiwan kêmtir bijîn,tuşî karên ne asayî dibin.Yên dihevrikiyeka mezin da dijîn!**

**_ helw..**

**Liser milê xu zifirî,dû çavên jirengê deriyay,pirçeka jidavên rojê,dêmekê jibefir ü xwînê,bejin jiştla spîndarê..**

**Bilêvên sor qurmzî,liber tenişta wî,cih tijî kenî û bişkurîn kir!**

**Lal bû,nezanî dê çi bersiv dit.**

**_ helw..Min gût helw?!**

**_ ê.. Ê.. Helw, keremke?**

**_ tû keremke..Tû lihîviya çî?**

**_ lihîviya hevalekî..Dê bûme bilêta birt.**

**_ dê kîve çî?**

**_ elmaniya..**

**_ ow..Cihê daxêye, dê pirag hêlin..**

**_ divêt em biçin!**

**_ bû divêt? Ez hez jipeyva divêt nakim!**

**Bimîne..Çend rojekên dî lime bibe mêvan,elmaniya na revit..ow..Elmaniya..Ez evîndara elmaniya me.**

**_ lewa tû elmanî baş dizanî..**

**_ ez têra jiyanê dizanim..Tû lielmaniya dijî?**

**_ erê..**

**_ bitinê...?Yan..?**

**_ ez bitinê me,min çu kes nînin.**

**_ heker tû xu bigirî,çend rojeka bibiye mêvanê min, dibit ez digel te bême elmaniya..ow elmaniya..**

**Çend şirîn ü giyan sivik bû,pitir lê hat.Demê peyva elmaniya jinav lêvên wê derdiket.**

**Jinûve elmaniya liber dilî xoş û şirîn bû,jinû bihayê elmaniya zanî.**

**Destekê req,milê wî girt.**

**_ were,nedemê wê ye,dê tirêna me çit..**

**Jiber sîngê xoştiviya wî îna der,jiber tenişta bûka êkşevî,îna der.**

**_ heta dîtineka dî..**

**_ te telefon heye?Nav ü nîşan hene?**

**Destekê wî Husên kêşa ü êk ma didestê wê kiça wek qevteka gola da.**

**Diwê gavê da,jidil diviya bibite dû.êk digel Husên û xemên wî bizifirt,ü êk bikefite davên pirça vê horiya jipaxên biheştê derketî..**

**Xu giran kir,xu mijûl kir.Keniya Reşîd cezayrî,hizirên wî cemandin.Destê xu jinav wan tilên xeyzeranî û nazik, kêşane der,ne jidil xatira xu jê xwast..**

**_ bibure,em gelek bikarin,lê soz bit em bizifirin..**

**_ dê çewa te bînim?**

**Husên bersiva wê da.**

**_ yên wek te tijî piragin..Heta dîtineka dî..**

**Lêvên xu gezandin,dêmê wê evîn jê dibarî..**

**Piştî çend gaveka,dinav pêlên mirovan da berzebû. Hizir û mejiyê û dilê wî digel xu birin.**

**Rê nedît,ew xema girana şivêdî nehêlay binivit,jibîr kir.Gelek cara lipişt xu zifirî,kes nedît.Hind ageh jixu bû, dergehê tirênê lê hate girtin,digel xu beref elmaniya bir.**

**Bû cara dawyê,Reşîd cezayrî,xatira xu lipişt pencera tirênê bibişkurîneka nixaftî jê xwast!**

**Licihekî vala roniştin,herêk jiwan diviya bizutirîn dem bela hevalê xu jixu vekit,da bigehite govenda hizirên xu yên ser ü mejî lê kirmî kirîn.**

**Herçende,dengê wan zirtolazên her êk kiçek dikuşê da û digel hatiye geriyanê,reva kotirên hizirên wan diverevand,her neşiyan bînine ser rastiya jiyanê!**

*******

**_ ka turmbêla te?**

**_.....**

**_ te firût?Pa ka çakîtê te?Ka tiştên te?**

**_.....**

**_ texêre?Bû bersiva pirsiyarên min nadî?!**

**_ turmbêl çû..**

**_ kîve çû?!**

**_ ma min negût,bes pirsiyara bike!**

**_ divêt ez bizanim ka çi liturmbêlê hat?Û ka te xêre?!**

**_.....**

**_ ez bila xu jite venakim,heta rastyê bizanim!**

**_ rastî !Tû êk pirsiyara dî bikî, dê tijî devê te xwîn kim!**

**_ tijî devê min xwîn bikî! Serê min jê bikî!Divêt ez rastyê bizanim!**

**Destê xu bire paş,eniya wî bibû kun düpşik,xuha leşê wî har bibû...**

**Digel keniya wan tulazên jiwan wêve,bihemü şiyana xu,kire hewar..**

**_ turmbêl çûw,tû jî here..Telaqên te....**

*****

**Ew mirovên diwê fargona tirênê da,hemû înane ser hişên wan,bê deng kirin.Çavên hemûyan man licihê deng jê hatî.**

**Şerm jixu kir,xuha leşê wî zêde bû,lerzikê girt,bîstê wî sor bû,zer bû.xu kire qormik dinav kursîka xuda..**

**Hevalê wî destê xu dana ser milê wî,biçavan berevanî jişerma wî kir,derdê wî baş dizanî..**

**Careka dî,her êk çu dîwana hizirên xu,piştî hindek hizirên dî lê zêde kirîn.**

**Hevalê wî pişta xu da kursîka xu,çavên xu jidil neqandin.**

**_ ey hewar..Eva min dîtî,heker rastî ba!**

**Da çi ête serê min?Dawya jiyana min da çi bit?**

**Wesa diyare,Husên jî xewneka hosa kirêt dîtiye.**

**Ew qêrî û hewarên xewneka dirindene.Xudê xêrikit...**

*****

**_ tû mirovekê direwînî..**

**_ tû mirovekê bê wefayî..**

**_ te hevalên xu jibîr kirin.**

**_ te gûtibû,ez çucar hewe jibîr nakim.**

**_ te gûtibû,ez çucar na ême pirag.Pirag limin heram bit.**

**_ te gûtibû,ez dê çime malên hewe,ez dê dayk ü babên hewe bînim,dê rastyê bû wan bêjim!**

**Serê wî tijî pirsiyar bûn,her pirsiyarekê diser da hizar deng vedidan.**

**_ hîviye hûn bihêlin ez berevanyê jixu bikim.**

**Min çucar hûn jibîr nekirîne,hewe jiyana min ya kiriye filmekê tirs û xwînê..**

**_ bes direwa bike,tû jî wek hemûyan yê fêrî direwa ü xoşiya bûy.**

**_ piştî wê rûdanê,min xoşî yên jibîr kirîn.**

**_raste...Tû baş yê fêrî direwa bûy,wek hevalên me yên xebatê..**

**_ hewe çi jimin divêt?Ez çi bû hewe bikim?!**

**_ em dê dadgeha te liwî cihê em lê hatîne şehîd kirin kin!**

**_ dadgeha wî ya kiriye.Tinê dê biriyara dadgehê bicih înin.Divêt wek me bête golle baran kirin,liwî cihê em lê hatîne şehîd kirin...**

**_ lê ew na bite şehîd!**

**_ ne, ew ne şehîde..Ew direwîne...**

**Hest kir,hevalên wî yên xebatê,dê biriyara dadgehê bicih înin.**

**_ ne bextê hewe û yê xudê,wê nekin,min hûn jibîr nekirine.**

**_ min bawer nedikir,tû mirovekê hosa tirsinûkî.**

**Ma ne tûbûy,çu çeperên dujmina liberte asê nedibû?**

**_ ez jimirinê natirsim..Tirsa min bêbextiye,mirina birûreşiye.**

**_ te direw kir,tû hatiye pirag,te em jibîr kirin,tû nizanî ka kelexên me likîvene...**

**_ ê.. Çi bêjim..**

**_ çu direwên dî neke,em baş dizanin ka tû hatibûye çi!**

**_ ez hatibûme wî cihê hûn lê hatîne şehîd kirin,min jidil rondik barandin.**

**_ lê tû ne jibe me hatibûy..**

**_ em neşên digel te dirêj kin.**

**Milên wî girtin,pişta wî dane wî dîwarê hêşta şûna golleya liser.**

**Berê dû kilaşînkufa dane sîngê wî yê tijî hîvî û xem...**

**Berî deng jidevê kilaşînkufên hevalên wî bêt,dengê Husên jiwê xewna kirêt hijiyar kir.**

**Neviya binivit,ne wêriya çavên xu danite serêk.**

**Tirên ya dibezit,rê ya berevanyê jimana xu dikit,dem yê rawestiyaye,bê giyane,nalivit!**

**Tirs dirindekê zale,hevalcêmkê jiyana wane,diêk roj da bûyne,û pêkve dê mirin.**

**Kuntirol hêşta ya may,Husên yê bê kaxeze.Polîsên van welata çu ezmana nizanin.**

**Tirên rawestiya,rengê wan zerbû.**

**_ pasport..**

**Berê xu da navçavên polîsî ü yên hevalê xu.Daxwaza harîkariya wî kir.**

**_ bibure,turmbêla me lipirag hate dizîn,pasporta hevalê min dinavda bû,digel hemû kaxezên wî..**

**Bikeniyeka sar.**

**_ keremkin,werine xwarê..**

**_ 6 _**

**Gelek cara lidewr û berên xu nêrî,biçavên tijî tirs.**

**_ divêt em dihişiyarbin!Divêt me ageh jixu hebit!**

**Hevalekî bikeniyeka sivikve gût.**

**_ livan welata jî divêt em bitirsin?!**

**Pitir jinîveka hevala,serên xu hejandin,bersiva wî bierê dan.**

**_ Erê...Dujminê me xodan parew hevale!**

**Dengekê,bêhna tirsê jê dihat,gût.**
**_ hewe goh lê nebû,serokê mafiya dujminî berî çend rojeka çi digût?!**

**Pirsiyar,wek narincûkekê dinav hizirên wanda peqî,**

**Gohên hemûyan bel kirin!**

**Geleka cihên xu xoş kirin,lez lixudanê pirsiyarê kirin.**

**Bêhna wî jiya hevalên wî teng tir bû,wî jî diviya zû sohbeta xu bikit.**

**_ digût...Em şanazyê bixu dibin,dûjminên me neşên liçayxane û meyxanên pirag jî bixirabî behsê me bikin!**

**_ raste..Lê divêt tirs rê liber me berze nekit,armanca me jipêş çavên me nebit.**

**_ nexêr..Ez we nabêjim.Ez dibêjim,divêt me ageh jixu hebit,baweriya xu bihemû kesa ne înin.**

**_ raste...Berî çend rojeka,sîxorên dujminî,kiropeka mezin ya partiya kumunîst libexda aşkera kirin,serçavkên wan,pirag bû!**

**_ erê,gelek nav livan welata diêne aşkera kirin.**

**Çi bixwîngermî,çi bixiyanetkarî..**

**_ şoreşa me,rêya wê dirêje.Em pêtivî hevalîniya hemû tex ü çînên milletê îraqê ne,divêt em digel hemûyan**

**hevalbend bin,dibit lirojekê pêkve disengerê xebatê**

**da şerê êk dujmin bikin!**

**Dibit lirojekê deshelat bikevite didesê wanda!**

**_ bibure Mamusta,erkê me çiye?**

**_ peywendiya hewe,divêt ya nihênî ü snordar bit.**

**Hevalên xu bû kesê diyar nekin.Taybet ewên liwelatî.**

**_ erê Mamusta?!Piştî çend dem hijmêrên dî,em dê digel,gelek reng ü deng û partên îraqî kum bin.Helbet em dê bû wan diyar bin,dê me hemûyan niyasin?!**

**Û wek em hemü dizanin,ewên amade,ne hemü şoreşgêrin.Sedased,gelek çav ü gohên dujminî dinav da hene.Û..**

**_ bibure,axivtina te raste,jiber wê çendê,dê**

**beşdariya me ya sinurdar bit.**

**Em ewên bû dujminî aşkira,dê beşdar bin,ewên hêşta ne diyar,divêt her dûr bimînin,em dê lirojên tengav pêtivî wan bin.**

**_ gelek başe..**

**_ lidawyê,min divêt bêjim,piştî kumbunê,em dê livî cihî dîsan kum bin.**

**Heker kesê çu pirsiyar nebin Verevin?**

**_ 7 _**

**Wek pêzanînên min liser welatê hewe...**

**Ê...Kirdistan..Mane kirdistane.Hûn dibêjnê kirdistan?!**

**_ erê..Kurdistan!Me sedan hizar şehîd daye jibû wî navî..**

**_ bibure,biburin,ez digel xebat û daxwazyên heweme, tinê min diviya bêjim!Wek ez dizanim kurdistan pitir ya tenaye.Ne wek parçên dî yên îraqê?!**

**_ erê,ewjî jiber milletekê hişiyar û dil sozin.**
**_ pa bû hûn nazifirin?!**

**_ pirsiyareka dicihê xu daye!Gelek eger hene!**

**_ wek çi?!Bibure,min divêt bizanim ka ew eger wek egerên me cezayriyane?Yan hewe hindek astengên dî hene?!**
**_ ma egerên hewe çine?Hûn jî tijî diniyayê bûn!**

**_ bêkarî..Birs.. Berîkanê jibû parew desthelatdariyê.. Ciyawaziya mezin ya hizirî..Em cîranên ewrupa ne!Ew hizar sala liberî mene!**

**_ egerên me êkin..Xebata çendîn sala..Şehîd û mal wêranî..Hemû bûne pare ü kursîk û berjewendiyên hindek kesên nezan û şoreş nedîtîn!**

**_ weye..Me liwelatê xu pitir jimelîwn şehîda dan.**

**Nihu her ew xudan şehîd dibirisîne.Her şoreşgêr jibîrkirîne.Xodan pare liher dû kuza diçerin.**

**Wek mişarîne,bû serê dixwîn,bû binî xwîn!**

**_ wesa diyare,lewma eve paşeroja gencên cezayriyane!**

**_ hemû welat,dixoşin,tinê mirovin welata nexoş dikin, dema nezan cihê zana digirin.**

**_ em jî kuvandarên welat û gelê xu ne. Me serkirdên hêja ü bikêrhatî hene,lê jiyan hûye,ewê rast ü dirust karbikit,dê ête jibîrkirin,dilên sax nagehine çu Miradan!**

_ gelek cara babê min digût,livî welatî,geleka nan jidevê biçûkên xu înaye der ü bû Şoreşgêra hinartiye  geleka tulazên xu biçek û cil ü berg kirîne û hinartîne şoreşê...

_ weye..Kesê wekû kurdan şoreş neviyaye.Kesê hindî wan qorbanî nedayne.

_ me kurdan,Kurdistan jigiyanê xu xoştir divêt, çunemaye me gorî nekirî..

_ herçende,ew wastiyana me,roj bû rojê diête jibîr kirin,lê ez bawerim û min nevêt jipêş bêxemiya wave hêceta bigirim.Dibit jiber şer û durpêçên abûrî!

Seruberê îraqê,neşên gelek tişta bikin.Hêşta em dibin destin...

_ bin destiya çi?!Mala te,eve deh pazde sale em desthelatdariya xu dikin,kes çu may dikarubarê me nakit.

_ nene,bawerbke,em neşên nanî bêy hindek layen û cîrana bixon!Hemû dujminin,dujmin!

_ û çare?!Heta kengî em dê libin rehma wan bin?!

_ heta ga bizêt!

_ erê..Liserdemê şoreşê,digûtin bêhna xu fireh bikin, şoreşe..Liserhildanê gûtin,serhildane ü dujmin yê hare..Lidestpêka hukmetê gûtin,hukmeta savaye û sedam yê saxe..Lişerê birakujyê gûtin,şere û nexoşiye.. Lipêkhatinê gûtin,dû hukmetn..

Nihu dibêjin pirsgirêk libexdaye.Sobehî dê bêjin,heta  em têr bin!

_ helbet,çucar têr nabin.Lê divêt mirov pê bextyê nekit.Azadiye,gelek jidagîrkerekê bê dil baştire!

_ erê..Ew şoreş û qorbanî,nebû vê bitinê bûn.ligelek welatan çu dagîrker nînin,lê jiyana wan wek duzexê ye!

_ liwelatê me,jiyan başe,Kurdistan ya berew baştir diçit.Hîvyên me dimezinin!

Me gelek tişt didemekê kêmda divêt!

_ jiber wan nexoşyên me dîtîn,jiber wan şehîd ü qorbaniyan.em diheqin!

_ erê,lê nabit em bêhna serkirdên xu teng bikin.

Ewjî wek me mirovin,û jime pitir diwastiyay û bihîvîne, barê wan gelek jiyê me girantire!

_ gazinda me jiwan kesên hatîne ser qazanê ye,bêy wastiyan.

_ raste..hindeka şoreş nekirîne,lê xûdan şiyanin.Nabit bêne jibîr kirin.Welat welatê hemûyane.

_ jigazindên hewe diyare, Kurdistan jî wek cezayrê şêl ü bêle..

**_dibit,lê eve hosa Namînit,em yên berev pêşvediçin,roj bû rojê,genc ü zana yê cihê xu digirin.**

**_ heta em bimirin, biçûkên me wê xoşyê nabînin.**

**_ nene,we nebêje. Pêşmerka xebat bû kesayetiya xu nedikir,lihîviya çu xelat û para nebûn.Tinê hîviya wan welatekê azad ü serbexu bû,jibû wan û biçûkên wan.**

**_ nûke turmbêla me çu mane?**

**Kenî tijî dîwana wan bû,babet hate gohorîn.**

**Reşîd diviya pitir keniya wan bînit..**

**_ tû pirsiyara turmbêla xu dikî..Hevalê te pirsiyara wê kiça ciwan dikit!**

**Ez pirsiyara hewe dikim.Ez bû hewe çi bikim?!**

**_ min turmbêlal xu divêt..**

**_ ü te?**

**_ wek te gûtî..Min ew kiça ciwan divêt..**

**Kenyê rengê wan sipî kir.**

**Reşîd cezayrî,bidilekê xemgîn ve gût.**

**_ ez jidil dibêjim,xuzî min şiyaba daxwazên hewe bicih bînim!**

**_ bibure,em sohbetê dikin,te çu liser xu nehêla.**

**_ em qenciya te çucar jibîr nakin,zor supas.**

**_ 8 _**

**_ biburin,ew herdû birîndarên şivêdî çi lê hatin? Likîvene?!**

**_.....**

**_ dixtur..Dixtur..Ew hevalên min yên şivêdî çi lê hatin?**

**Destê xu dana ser milê wî,bire dijoreka biçûk ü lêkday ve!**

**_ tû wa diniyasî?**

**_ erê..Jigiyanê xu baştir!**

**_ ê...Bibure,êk nemaye..Û yê dî...**

**_ heware...Kî jiwan nemaye?!Kî miriye?Kî saxe?**

**_xu tûre neke,eve qedera wane.**

**_ min divêt yê may bibînim..**

**_ geremke digel min were,lê divêt tû bê deng bî.**

**Neşiya xu liser piya bigirt,xwîna wî hişik bû,tinê dû çavên zil xu diserî da zîq dikirin.Dû lêvên hişik ü qeşavî dilerizîn!**

**Dixturî derê joreka biçûk vekir.Tijî amîru sondene. Kelexekê mirî dinaf lifaf û pilastera da rapêçaye.**

**Ew amîrê lihindav serî,şûna dilê wî xu diqotit,bêhna wî biser diêxt.**

**Lihindav serî rawestiya.Hişik ma,kete zifirokeka kûr...**

*****

**_ hûn markisyên kurd,jibû çi xebatê dikin?!**

**_ markisyên kurd?!**

**Keniya wî tijî wî gelyê bidarubar bû.**

**_ erê...!Hûn kurdin,û markisî ne.**

**_ nexêr..Em mirovin û markisî ne.**

**_ ma kurd ne mirovin?!**

**Dîsan kenî,û jidil kenî lê jitirsa hevalê wê ture bit,zû xu bû bersivê amadekir.**

**_ kurd babê mirovane.armanca me êke,lê rêya me cûdaye.**

**_ bibure heval,ez tê negehiştim!Jikerema xû bû min şirove bike.**

**_ dê were rone û wê perdaxa çayê bide min,da serê min tena bit,dê bû te jiserî..Heta binî fêra çim!**

**_ kak Hesen..Hişiyar be!Eve te diser rê da nebit!Gelek yê lidûr te dizifirt.**

**_ wela heker armanca me êk bit,wek ew dibêjit!**

**Ez amademe bibime hevalê wî..**

**_ wey tû gelek bixêr hatî.**

**_ dê bêje,yan bêy ça na ête gûtin?!**

**_ bêy ça,çu tam têda nîne.**

**Keniya liser lêvên wî,serinca dixturî rakêşa,Zanî yê digel wî bihemû hest û giyanê xu.jor bû wî hêla û derket..**

**_ em dizanin xebata me jibû çiye.Me welatekê azad û serbixû divêt.Me azadiya gelê kurd divêt.**

**Hewe çi divêt?Hewe divêt diniyayê hemûyê rizgar bikin?!Ez nizanim hewe çi divêt?Hûn liçi digerin?!**

**_ belê tû baş dizanî me çi divêt!Te gût..**

**Me divêt diniyayê rizgar bikin.Bawer bike,heta aştî û azadî lidiniyayê hemûyê belav nebit,milletê kurd rizgar nabit.**

**_ heta hûn aştî ü azadyê lidiniyayê belav dikin,dê pêt me bine cût!**

**_ ça te geleka xoş bû,niza te çigareka wesa xoş jî heye?**

**_ ça,bihayê wê pirsiyara min bû!çigare bihayê çiye?!Hemû tiştên hewe biberamberin?**

**_ ma jihevalîniya me bibihatir heye?**

**_ kes neşête hewe bû ezmanî.Nexêr jihevalîniya me bibihatir nîne,lê xuzî tû hatibay ser riya rast.**

**_ ez jî her we dibêjim,xuzî kak Hesen hatiba ser riya rast.**

**Kenî tijî wan kun û qolaçên asê bûn.**

*****

**Dengê dergehê jorê,hemû hevalên wî jidûra revandin.**

**Kiçeka ciwan,bidev ü lêvin tijî kenî hate jor.**

**_ bibure,nabit tû gelek lihindav serî bimînî..**

**Hate ser hişên xu..**

**_ ez çu denga nakim,tinê min divên lihindav serê wî bim.**

**_ bibure,nabit,nihu dixtur dê êt,divêt tû jijorê derkevî!**

**_ ez dernakevim,bila dixtur bêt.**

**_ lê hosa nabit,bû wî nebaşe..**

**_ ez bawer dikim,sebra wî gelek bimin dêt!**

**_ wî ageh jixu nîne!**

**_ tinê ageh jimin heye.**

**Berê xu da navçavên wî,zanî derketina wî ya bizehmete.**

**Destê xu da wê çekmeça birex textê azad liser dirêjkirî.Hindek kaxez û wêne înane der.**

**_ eve yên wîne,dipaxla wî da bûn,tû dişê digel xu bibî.**

**Herwekü narincûkeka kilîl vekirî kiriye didesitî da,haha dê dinav destanda peqit!**

**Ew kaxer û wêne,jinav wan destên nazik û sipî înane der.Liber tenişta textê azad ronişt ser erdî.**

**Kaxez û wêne têkvedan.Çavên wî biwênê kiçeka ciwan ü xemilandî ketin.Bişkurîna dêmê wê,tijî diniyayê bibû.Lipişta wêney,nivêsî bû..**

**(azad..Ez libenda teme.Ma tû nazifirî?Min soz daye mêra nekim.Bijîm bûte me,bimirim bû axa welatî me. Xuştiviya te jiyan..)**

**Neşiya xu,tijî gewriya wî girî bû.**

**Wênê wê pîrejina lêkday,hevrikî digel giriya wî kir!**

**Lipişta wêneyî nivêsî bû (kurê min azad,çavên min lirêya te tarî bûn,ez çavê te maç dikim,hîviya sax û silametiya te û hevalên te dixwazim.Were..Min divêt berî bimirim te bibînim,berî bimirim bejna te himbês kim,eniya te maç bikim.Were..Ez gelek nesaxim,dibit tû min nebînî!Lê hîviye xû biparêzî,gerdena te aza..)**

**Serê xu dana ser lêva textê azad,kete dixirîkêna giriyê da..**

**Çavên xu vekirin,tijî hindav serî dixtur û sistir in..**

**_ çi bûye?!Ez likîve me?!**

**_ silametiye,tû mêvanê meyî!**

**_ mêvan?!Jiber çi?Çi limin hatiye?**

**_ tû pêçek gêj bibûy,lê sopas bû xûdê,nihu gelek başî.**

**_ ez dişêm biçim?**

**_ dê kîve çî?**

**_ min divêt biçime nik hevalên xû!**
**_ bila dixtor bêt,paşî.**

**_ ê..**

**_ bibure,em neşên bêy dixtorî izina te bidin.**

**_ ez dişêm pirsiyarekê bikim?**

**_ keremke?!**

**_ çi liwî hevalê min yê dî hatiye?**

**_ divêt ez pirsiyar bikim.Navê wî çi bû?**
**_ Elî..Elî necefî**

**_ alî...Aly negefî...**

**Dest da telefonê, digel cihekî axivt,dîsan gût,alî negefî..**

**Berê xu da wî,ka nav dirust gût!**

**Telefon dana û lê zivirî..**

**_ ew tiştên digel wî,yên lipirsgehê,kelexê wî yê dinav tezîngehê da libenda êk wergirt!**

**Diniya hemû bû bar,kete ser milên wî,çav lê zîq kirin, tijî dev û difina kefa sipî bû.**

**Sistirê zanî karekê şaş kir,zanî axivtina wê golleka topê bû,ser û mejî lê hêran.**

**Kire hewar,dîsan çend sistir û dixtorên liwara lê kum bûn.**

**Leşê wî perxandin,ava tezî lê reşandin,dermanik dane ber difna wî...**

**_ nihu tû baş tirî?**

**_...**

**_ bêhna xu fireh bike.Vê hepkê bixû digel hindek avê, dê êye ser hişên xû.**

**_ ka ew tiştên wî?**

**_ tiştên kê?**

**_ yên Elî necefî..**

**_ tû yê wastiyay,dê paşî bû te înin.**

**_ min nihu divên..**

**_ başe..Xu ture neke,dê bû te înin.**

**Sistirekê qesta cihê tişt lê kir.Qefteka kaxez û wêna kire didesitîda.**

**Kuma wan veda,berekê pan kete ber desta...**

*****

**_ Elî...?**

**_ belê..Keremke?!**

**_ ew çi bere digel te?**

**_ eve berê(turbe ye)**

**_ te jikîve înaye?**

**_ ji necefa şerîf.**

**_ willa ez bawer nakim!**

**_ belê bawer bike.**

**_ te bû digel xo înaye..?**

**_ tuberke,nivêj bêy wî naêne kirin!**
**_ mala te,eve jiberî hizar û pêniçsed sala libiyabana bikar diînan.jiber xîzî,da eniya wan nekefte dinaf xîzîda, nihu tû liewropay,eve pirage,pirag,ne biyabam ne?!**

**_ liherchê mirov nivêjê lê bikit diête bikar înan.**

**_ te ne gûte me?Te çewa likuntirola derbaz kir?**

**_ ma ez çewa derbaz bûm?!**
**_ rast...?Jinecefe?Yan jiwî robarê tû her roj diçiye ser jiber jinkên nîv royis?!**

**Keniya azad bilind bû û gût.**

**_ heker jiwêrê bit..Eve gelek yê pîroze!**

**Hemû pêkve kenîn,keniya wan leşê wî bijiyan kir.**

*****

**Recivka leşê wî,hizirên wî jihevala dûr kirin.**

**Lez liwan kaxeza kir,ligiyanê wî geriya..**

**Yê dinav kumeka mirovan da rawestiyaye.**

**Lirexê rastê,jineka ciwan bicilên erebî rapêçaye.**

**lirexê çepê,kurtulazekê sinêleye.Lirexên wan dapîr ü bapîrên,dikuka xoşyê da dirawestiyayne.**

**Li hindav serê wan,wêneyekê îmam Elî bidîwarê malê ve hilawîstiye.**

**Hemû yên lihîviya wî,çavê hemüya yê lilivîna wî qeramê dinav gomên avê da.Gohê hemüya ma lifirîna balindekê avî.**

**Dibit,lipişt wê qefta qeramê he xu veşart bit?!**

**Dibit,piştî  livîna kuma qeramê he,serê xu jinav wî püşî bilnd bikt û bête nav zincên me yên jileven û qeramî dirust kirîn.**

**Dibit,ev şeve liber tenişta dayka heîder binivit!**

**Devê hemûya tijî keniye,hemû yên lihîviya wî.Hemû çaverê ne!**
**deng jiwî wênê biçûk hat,kiçeka dûsê salî.**

**_ ka babê min?Vê carê gelek gîro bû?**

**Piştî ava goma hişik kirîn, piştî qeram û püş sotîn.**

**Êdî lime nabit mêvan?**

**Ka babê min? Çi lê hatiye?Dê kengî zifirt?!**

**Dizifiroka pêlên pirsiyarên wê da xendqî.**

**Bilez wênê wê kire dibin hemû wênada.**

**Çavên xu neqandin,bêhna xu çik kir,ma lihîviya dengê wê..**

**Bê dengyê çih dagîr kir,tinê deng jihindek amîrên jiwî wêve dihat.**

**Neviya çu kaxezên taybet bixwînit.**

**Dibit navên hevalên wî yên rêkxstinê têda bin?!**

**dibit nameka evîndarî jixêzana wî dinav da bit?**

**dibit hindek huzan,yan bîrhatin yan peyvên wî yên taybet dinavda bin!**

*******

**Tû dizanî Gomên me yên avê,wek çiyayên hewe**

**Ne?!**

**Bi keniyeka sivik..**

**_ çiya likîrê?Û gom likîrê,malate?!**

**_ belê!Hûn xu liçiya xudan dikin ü xu diparêzin,em ligoman!**

**_ ha?Wesa ?**

**_ erê..Heker me jî ew gom neban,dibit nihu em diqirkirî bûn.Wek çiyayên hewe,ewên hûn jidujminan parastîn.**

**_ ne tinê çiya em parastîne.Mêraniya me,ü nanê me,û mejiyê me em parastî ne.**

**_ dujminê me,ne mêraniyê dizanit,ne nan ü mejî,**

**dujminê me dirindekê hare..**

*******

**Dengê dixturî ü herdû sistirên digel da,heval jikuçka wî revandin.**

**_ demê te baş..Nihu tû yê çewanî?**

**Sistirekê persiv da..**

**_ gelek yê başe,dişêt biçite derê..**

**Dixturî berê xu da wê sistira diaxivit,û diberra hindek kaxez têkve didan.**

**_ kaxezên wî dirust bikin,hindek dermana bidinê û izna derçûna wî bidin..**

**Dest da hindek kaxezan.**

**_ bibure,jiber tû bitê van mirovan diniyasî.Tû dişêy kaxez û nasnamên wan wergirî..**

**Rast rabû ser xû..**

**_ azad jî mir?**

**Dixtur kenî,diviya xem û barê wî sivik bikit..**

**_ nene,azad yê başe,lê divêt bû demekê dirêj livêrê bit.**

**_ ez dişêm bibînim?**

**_ her demê te bivêt.**

**_ min nihu divêt!**

**_ bibure,nihu yê nivisitiye,nabit hişiyar bit.**

**Zanî nivistina wî dê dirêj bit.Kaxez jidestê dixturî wergirtin.Û liser kaxezeka dî îmza kir.**

**_ derbarey leşê Elî necefî,te çi rêk,yan pêşniyar hene?Çi lê bikin?**

*****

**_ heker ez livan welata mirim,min liber lêva gomeka avê veşêrin,leşê min lixu nekine bela,bû mala min ne hinêrin..**

**_ ji ber çi?!**

**_ ez dizanim,jiber çiye!**

**_ kes nizanit..Jiber çiye.**

**_ belê..Da dayka heîder şû nekit..**<br>**keniya wan ser jixemên wan stand..**

**_ ne,bawer bikin,da keyva dujminî ne êt,da nebêjin, eve êk jişoreşgêra kêm bû...**

*****

**Dixturî zanî hizrên wî dür çûn,destê xu dana ser milê wî..**

**_ eve qedera  wiye,gel bivan rêya digehine azadyê..**

**Axivtinên dixturî xwîna dilê wî êxiste karî.**

**_ te çi gût?Em çi lileşê wî bikin?**

**_ min giyanê wî diviya..Leşê wî bila bû hewe bit!**

**Pişta xu da wê xesta baştirîn hevalên xu lê hêlayn.**

**Êk wek kumeka goşt û hestiyan,yê dî lihîviya îsa pêxember jiesmana peya bibit,bidestê xu yê pîroz, birînên wî vemalit!**<br>**neşiya jixestê dür kevit,lirex ü durên wê dinivist, dixwar.ew baxça birex xestêve,bibû mala wî.**

**Jora xu hêla,hevalên xu hêlan,jiyana xu jibîr kir,çu tişt neman lipêşiya wî,tinê hizir û umêda wî bû ew demê lihindav serê hevalê xu azad dirawestit!**

**_ bibure,evro leşê hevalê te,Elî necefî licihekê taybet bi islamêve hate veşartin..**

_ supas..Bû hewe hemûyan.

_ ê..Min divêt bêjim?

_ keremke?Bêje?

_ berpirsên xestê jiseruberê te ne dirazî ne..

_ seruberên çi?!

_ bibure,tû wek..

_ wek çi?Hema bêje?!

_ sehke xu,tû dê zanî..Ez bawernakim,êdî bihêlin tû husa bêye dixestê ve!

Leşê wî pitir giran bû,zanî dê hevalê xu yê dî jî jidest dit.

Kete dinav pêlên bajêrî da,nivistin jibîri kir,xwarin nema. Gelek şeva liber lêva cada,dikabîna telefonê da

dinivist.

_ kak Hesen..Kak Hesen..

Serê xw yê giran jinav destên xu înane der,çavên wî ronahî jibîr kir bûn,xudanê dengî neniyasî..

_ tû kî?Te çi divêt?

_ hilû Mamusta,eve te xêre?Tû mirovekê roşenbîrî. diniya bişehîd bûna dû hevala xirab nabit.

Milletê me sedan hizar şehîd dayne,her kesê hevalekê wî şehîd bû wek te kir,pa dujmin liçi digert?!

Êkî dî milên wî girtin,jiaxê bilind kirin.

_ Mamusta,hêşta gûtinên te libîra mene,dema te digût: Şoreş ne bû me bitinêye,dibit nebû kurên mejî bit,bû nevyên me ye,bû kurên şehîdaye..

Hişên wî cemiyan,ewên lidurên xu,niyasîn.

_ biburin,liwelatî min pitir dişiya xu ragirim.Lixerîbiyan,em yên bê hêz ü bê xudanin!

_ te digût,ew welatê mirov azadiya xu têda ne bînit, ew ne welatê miroviye.

_ hilû..Eve ne cih û demê van sohbet û bîrhatinane. Divêt tû baş karê xu bikî,serurîhên xu bitiraşî,hindek cilkên paqij û lêkday bikiye berxu.Me gelek tişt lipêşiya xu hene,em karî bû bikin,ne demê girî û gazinda ye!

_ raste..Kes bigirî û bîrhatina nagehite armanca.

**Liwê jora gelek cara digel wan hevala serê xu têve dixwarin,xu têve rüs dikirin,jihizir ü bîran,jikerb û kîna çînayetî,ü gelek cara jicil ü bergan jî...**

**Jor ya bêserubere,pîsatî tijî hemû kun ü qolaçaye.**

**Eve demekê dirêje,nehatiye jora xu,newêrt lê binivit, hest dikit,hêşta giyanê Elî necefî û azad hewlêrî lihîviya wî ne.**

**_ eve min xu paqij kir,têr xwar ü vexwar.Hûn nabêjin hewe çi jimin divêt?Hewe çi limin veşartiye?**

**_ Mamusta..!Tû jikesên nêzîkî azad hewlêrî bûy.**

**bibiriyara şoreşê,tû digel hindek hevala dê beşdariyê dibehiya azadî da kin...**

**Rengê wî pêtî bû,neşiya xu liser piya bigirt,kete ser nêzîktirîn kursîk,dû hevala danane ser cihekê baştir..**

**Jor bê deng bû,hizir neliv man,xwîna dilê wî şer digel okscînê dikir!**

**Perdaxeka ava tezî bizûrî berdane devî,hişên wî hêdî hêdî kum bûn.**

**_ azad jî şehîd bû?!**

**Kesê newêriya bersiva wî bidit.**

**_ kengî eve bûye?**

**Berê xu da wî hevalê bivî karî radibit!**

**_ bibure Mamusta,eve dûsê rojekin!**

**Tijî nav çava kerb û kîn bû.**

**_ eve dûsê rojekin!Hûn min agahdar nakin?!**

**_ bibure,cih nema lipirag,em lê negeriyayn,te xu berzekir bû!**

**Zanî,jidestên hemûyan derket,zanî biturebûnê nazifirt..**

**_ nihu hewe çi jimin divêt?Çi liser mine ez bikim?!**

**_ wek min gûtî Mamusta.biroska şoreşê dibêjit. Mamusta Hesen digel hindek hevalan,binavê şoreşê beşdariyê dibehiya şehîd azad hewlêrî da bikin!**

**_ başe..Ez amademe!**

**_ 9 _**

**Çavên biçûkan bipencera ve şil bûn,leşên wan yên nazik,wastiyan.Ew xoşiya didilê wan da,ya dibite xewin. Jivê pencerê,diçine yadî.Bi çavên xu yên biçûk,rêya babên xu kuntirol dikin!**

**_ babê min dê divî cihî ra êt,eve rêya wî ya hercare.**

**_ ne,ez dibêjim dê direxê dî ra êt!**

**_ ma dê çewa diwî rexî ra ên?Nê cihê turmbêla wan nîne?!**

**_ ha...! Raste,dê êne cihê hercar.Livî rexî..Mane?!**

**_ erî..Dê bû min cil û pêlavên werzşî û kulavekê ciwan înin,û wî gût min yên kirîn jî...**

**_ bû min jî dû destên kirasa û tuqew guharika yên kirîn..**

**_ ma tû ya bê kirasî?!**

**_ manê tejî çend pêlav û cilkên wezşî yên heyin!**

**_ dê hişbe..Bila bû tejî bînit...Lê gelek gîro bûn!**

**_ erê..Dadê jî her we dibêjit!Ez nanivim ü na xûm na vexûm,heta ne ên.Bila jibirisa bimirim!**

**_ tû mirbay,baş bû,da tû bes axivtbay..**

**_ erê..Te babû bû xu bitinê divêt.Mane babê min jî ye?**

**_ ez yê mezinim,berî te babê min bitinê bû.**

**_ û başî yê min jiye!**

**Dengekî jipencera dî gût..**

**_ babu hat...Babû hat..!**

**Hemû pêkve rijiyan ber wê pencera biçûk.**

**Dayka cih jibiçûkên xu standin,çavên xu tijî dîmenên bejna wan ya wastiyay kirin!**

**_ xudê qeweta hewebit.**

**_ supas..**

**_ hûn dibirsîne..!Mane?**

**_ tinê me divêt,têr binivin!**

**_ hewe xêre?!Çi bûye?!**

**Berê xu dane êk,her êkî diviya yê dî bersiva pirsiyarên wan yên civêl bidit.**

**_ babû?Ka turmbêla te?**

**Zenga mejyê wî lêda,cerekê ava tezî,berdane ser leşê wî yê kerim!**

**Daykê jî xu havête ser birînên wî yên kûr.**

**_ erê wila,ka turmbêl?!**

**Çav lê şor kirin,rengê wan zer ü pêtî bû.**

**Biçûkekî dî gût.**

**_ ka cilkên me?**

**Yadî gût.**

**_ ka kirasê min?Ka pêlava min?Ka..? Û...?**

**Daykê zanî,tiştek jihêza wan mazintir rûdaye,lewma hosa bê huş ü deng kirîne.**

**Libiçûkan xurî,hemû ji jorê kirine der.**

**_ hişbin,eve ne demê heweye,babê hewe yê wastiyaye,herne jorên xu..Dêyî..**

**_ em naçin,heta diyariyên me nedite me.**

**Çu nema liberahiya wan,berê xu dane navçavên êk,zanîn neşên pitir veşêrin.**

**_ turmbêl hate dizîn!**

**Hemû şir bûn,bê deng man,bêhna biçûka tengtir bû.**

**_ û diyarî?!Ka diyariyên me?**

**Milê kurê xu kirt.**

**_ kurê min.Ew jî dinav turmbêlê da bûn.**

**Yê dî gût.**

**_ diyariyên me jî hatin dizîn?**

**_ erê..**

**Yê dî gût.**

**_ kê dizîn?!**

**Dîsan dayk lê xurîn,çinklên wan girtin,rakêşane dijorên wan ve.Da ew digel babên wan bidilên xu biaxivin û çîroka wan bizanin!**

**_kurê min,babê te yê wastiyaye,ne demê pirsiyara ne,ez dê bû te hemû tişta kirim.tijî sûka me ew tiştin.**

**_ min tiştên vêrê nevên,min yên pirag divên.**

**_ carekadî,em dê digel wan çin.Ka te çi divêt,Bû xu bikire!**

**Dergeh lê girt,qesta babê wan kir!**

**_ ka bû me jiserî...Heta binî bêjin,eve çi bû? Çewa hate dizîn?Û...**

**_ kicê jê bigere,bila gorî wan û biçûkên me bin, malê diniyayê ne çiye!**

**_ erê..Lê min diviya bizanim,çi nexoşî bû hewe ne çê bûne?!**

**_ ne,em bisilametn.**

**_ cihekî bû min danin,da ez têr binivim,başî dê bersiva pirsiyaên hewe deh carî dim!**
**_ hilûn,cih amadeye..**

**Liser cihê xu yê xuş ü tena,xu dirêj kir.Hest biaramyê kir.Xav bû,xu mirand,diviya binivit,diviya bû demekî hemû tişta jibîr bikit.Jicîhanê dûr kevit,goh likesê nebit, tinê digel giyanê xu yê wastiyay bimînit.**

**Dilê tijî hîvî,mejyê tijî hizir.Ew biçûkên lihîviya diyariyên xu.xew lê sil kir,neşiya leşê wastiyay bibine dîwana xu!**

*******

**_ tû mirovekê bê sozî...**

**_ tû mirovekê bê dilî...**

**_ tû her ne mirovî...!**

**Lirexê rastê,çend binemala azad hewlêrî dikumin. Dayka wî liserê dîwanê,bizotekê agirî didestdaye, haha dê kite dinavçavên wî ra!**

**_libinê dîwanê,yara wî,bixemla caranve,gupalê pîrebabê wî jidestan îna der,û liteniştên wî hate çepa..**
**lirexê çepê,mala Elî necefî hemû pêkve yên lihîviya mala azad,dema ew jê têr bin,da bibite gera wan. Hemû diamadene,bimist û çeqo û dar beranve.**

**Weku aşorayê,xu didine ber mist û qamçiyan û lidur kelexê wî zikirî dikin.**

**_ te çewa kelexê babê me hêla lixerîbiyan,linaf kafiran?**

**Kurê wî heîder yê mezin bûy,gelek rengê babê xu didit.**

**_ babê min dinamên xu da digût..Min dû bira yên heyn, ez hest bixerîbyê nakim.**

**Dayka wî bersiv dida..**

**_ erê..Her digût,ew min nahêline bitinê,dê min parêzin, ew hevalên man ü nemanê ne!**

**Diviya berevanyê jixu bikit,diviya bêjit..Dem û cih ne diharîkar bûn!**

**Diviya bêjit..Giyanê min limin bela bû, da çi likelexên wan kim?!**

**Yara azad,bilewendiyên sorve,hate dîlanê..**

**_ azad jî digût..Min dû bira yên heyn,gelek jibira baştirin.**

**Wî nezanî birayê wî,dê kelexê wî lixerîbiya veşêrt,û dê bite êxsîrê nêratiya xû..**

**Dengê herdû binemala têkel bûn,nezanî ka çi dibêjin?**

**Ketin dan ü stanê.Mezinên wan,serên xu pêkvenan. biçûkan kirine xûpêşandan,lê her zû gehiştin biriyarekê.**

**Gohên xu vekirin,diviya bizanit ka çi tevin bû wî diraçînin?**

**Jinav çavên wan diyar bû,biriyara wan ya dijware!**

**Diviya biaxivit,diviya berevanyê jixu bikit.**

**_ nabit tû biaxivî..**

**_ nabit tû berevanyê jixu bikî..**

**_ biriyar,biriyara meye..**

**-- Biburin,min tinê divêt bêjim!**

**_ hişiş..Ne axive.Nihu dê biriyara me liser te ête xwandin..**

**Kaxezeka mezin,rexek didestên dayka azad da û rexek didestên dayka heîder daye.**

**Wek tîpeka hunerî biriyar xwandin!**

**_ biriyar.Jibinemala azad hewlêrî.Û binemala Elî necefî.**

**Ev biriyare hatine dan!**

**Piştî xiyanetkariya te,piştî te berevanî jigiyanê wan nekirî ü xu likelexên wan nekiriye xudan,ü liwelatekê sar û biyanî,bêy nivêj liser bête kirin,hatine veşartin.**

**Piştî em herdû binemal,gelek lihîviya wan çaverê mayn.**

**Me biriyar da,te bidar ü beran bikujin û liwelatekê sar û bê xudan veşêrin,da kes çav lê nekit!**

**Berê xu dane êk,navçavên wan gorî jê dibarî.**

**Hemûya pêkve qesta kelexê wî yê wastiyay kirin.**

**Piştî jiqotan û lêdana wî têr bûyn,dest ü pên wî baş girêdan.**

**Neşiya bikite hewar,neşiya birevit,çav lê zil bûn,hişik ü bê deng ma,çu jê nehat.**

**Dergeh vebû,kurê wî yê biçûk,xu jinav destên dayka xu îna der,xu havête dinav cihê babê xuda.**

**Bab jinav desên wan îna der..**

**_ bab..?Bab..?**

**Rast rabû ser xu,dengê hirçekê jê hat,wek har ü dîna kire hewar..**

**_ ne...Wenekin...Heware.. Ne.. Ne..**

**Kur,tirsiya,paşve revrî,qesta dayka xu kir.**

**_ dadê?!Babê min yê dîn bûy?**

**Daykê,hemû tişt hêlan ü qesta jora wî kir.**

**Yê dinav xoha leşê xuda bûye av,rengê miriya yê girtî,bêy biaxivit,bidesta gûtê, hindek avê..**

**Kopekê ava tezî kire didestda.Piştî av dinav hinavên wî geriyay.Bêhna wî hat,qotana dilê wî sist bû.**

**Berê xu da navçavên jina xu,zanî hizar pirsiyar diamadene.**

**_ texêre ?**

**_...**

**_ biçûka nehêla tû binivî?!**

**_ mala wî ava!Baş bû ez hişiyar kirîm,dibit ez dixew da jitirsa mirbam!**

**_ malate!Xêrbit?Te ez tirsandim,ka bêjeç bû?Te çi xewin dît?**

**Jiber lerzika leşê xu neşiya biaxivit..**

**_ paşî... Paşî...**

**_ ez jibin serê te naçim,heta rastyê nebêjî!**

**Zanî,çu care neman,zanî,yê bûye barek giran liser milên wan jî.**

**Wî jî diviya êşa xu bû êkî derkit,êk wî barê giran,harî wî hilgirt..**

**_ her ew xewnên berêne.Carekadî limin dibine mêvan!**

**_ xewnên berê?!Xewnên çi?!**

**_ ew hevalên min yên lipirag hatîne şehîd kirin,berî çend salan!**

**_ ew kengî bû?Mate ne jibîr kirbûn?**

**_ belê..Lê carekadî ez cume wî cihî.**

**_ cihê rodan lê bûy?**

**_ erê...Hemû tişt limin nû kirin!**

**_ min gelek pênexoş bû hûn biçine pirag,lê jiber Husên min şerm kir bêjim!**

**_ min hemû tişt jibîr kiribûn.Çucar min bawer ne dikir, ez dê çime wî cihî!Eve çend sal bûn,min hizra wan ne dikir!**

**_tû neheq bûy!Ma te çi dest dirüdana wan da hebû?! Mate çi pê çê dibû bu wan bikî?Ew baştirîn hevalên te bûn.**

**Serê xu hejand,herwekü diviya hindek hizirên giran jê bipeşin.**

**_ tû neyarê giyanê xûy,biturebûnê çu nazivirt,te jin û biçûkên heyn,wan jî mav liserte heye.**

**_ erê.. Raste, lê bû dilê min bêje,bû mejyê min bêje, bû wijdana min bêje!**

**Jor bê ding bû,carekadî xu dirêj kir,diviya bimînte bitinê.Jinê lihêfa wî biserdada,û der ket.**

**_ deng jikesê ne êt,babê hewe yê wastiyaye.**

**_ wastiyayê çi?Hindî bûme tişt yên înayn da biwastit!**

**_ ezmanê xu dirêj nekin,tijî bazarî tiştin.**

**Dijora dî ve.jina Husên wek îzraylî lihindav serî bû. nehêla binivit,nehêla çu hizra bikit.**

**_ Te hay jê hebû?!**

**_ çî ye?Ew kî bû?**

**_ dengê Hesen bû!**

**_ ka sehkê,wî xêre?!**

**_ jê bigere,dibit libiçûkekî kirbite hewar!**

**_ ma tû nahêlî ez binivim?!**

**_ heta rastyê nizanim,tû nanivî!**

**_ turmbêl çû,hate dizîn..**

**_ hate dizîn?Yan...?!**

**_ yan çi?Ha?**

**_ yan wek gelek cara te libinê xu da?!**

**_ malate!Bihayê turmbêlê jipênc hizar yuruya pitire,ma dê hemûya libinê xu dim?Ma dê mar kim?Nê ew hîviya jime dikin,heta em digel wan biaxivin!**

**_ belê...!Hema diêne berahiya hewe..**

**_ erê wela biçigarekê razî dibin.Dê vêca bela xu jimin veke,da biniv!**

**Balîvik,pirçqande bin serê xu.Xemên giran,hizrên belav, dengê biçûka.Xew revand.**

**Gelek ma lihindav serî,çu jê nezanî,dinav bê dengiya wî da hêla.Dergeh lê girt û derket.**

**Hevala wê ya dina hizirda berzebûy.**

**_ ew çi deng bû?**

**Serê xu bilind kir,zanî neşêt veşêrt.**

**_ kiçê hema hişbe,ev zelame hindî yên ture bûyn.**

**Ez jê ditirsim!**

**_ eve pitir jidemjmêrekiye,ez bi Husên ve,min neşiya tiştekî jê bizanim.Jibilî,turmbêl çu..Hate dizîn..Û çu pirsiyara neke!**

**_ sed turmbêl kurî pêlava wan bin.Yê min xema turmbêlê ya jibîr kirî.Xema wî ya berî çend salan,ya nû bûyeve.**

**_ xema çiye,berî çend salan?**
**cihê xu xoş kir,berê xu da wara,ka çu biçûkan goh lê nabit!**

**_ berî çend salan,lipirag,dû hevalên wî bidestên sîxorên behsiyan hatibûn kuştin.**

**_ êê?**

**_ ewjî digel wan bû.Hemû tişt biçavên xû dîtibûn,ü**

**neşiya çu bikit.Çu pê çê nebû.**

**_ erê...Û çewa piştî van hemû salan carekadî ew hizir kirin?!**

**_ dûhî,bû wê belayê,çubune cihê rodanê lipirag.**

**ew cihê herdû baştirîn hevalên wî lipêş çavên wî hatîne kuştin!**

**_ ew qêriya berî bêhnekê,jidilê wî bû?Ne libiçûka xorî?!**

**_ erê...Jinîva dilê wî bû.Jixewneka dirinde hişiyar kir!**

**Tirsiya,ew êş zelamê wê jî bigirt,zifirî qesta jora Husên kir,wek diza, dergeh vekir.**

**Husên yê şerê diniyayê hemûyê dikit.**

**Didanên wî haha dê êk hêrin,lêvên wî wek dû şêra, şerê wane!**

**Tirsiya,ew jî qêriyeka weku hevalê xu vedit,ewjî wek wî nîv dîn bibit.Zanî yê dinav pêlên xewneka harda.**

**Ronişte bin serî,destê xu dana ser eniya wî ya ter jixohê. Neşiya xu,neviya pitir dinav destên wan dirindên har da bihêlit.**

**Milê wî hejand,gazî kirê..**

**_ Husên ? Husên ?!**

**Cilivek vê ket,rast rabû serxu.**

**_ çiye?Ew kî bû?**

**_ bisimla..!Texêre?!**

**Çavên xu vekirin,hişên wî kom bûn..**

**_ hewe xêre?Tû û hevalê xu neşên binivin?!**

**_ avê..Hindek ava tezî bidine min.**

**Bilez perdaxeka avê kire didistî da.**

**Herwekü,ew perdaxa avê bihindek pelên kel da kirîn. Bêhna wî hat,lidur xu zifirî.Berê xu da navçavên jina xu. Hizar pirsiyar jê dibarîn..**

**_ çu pirsiyar û sohbeta neke..Turmbêl çu!**

**_ kuru,hizar turmbêl gorî binê pêlavate bibin.**

**Ma eve hemû jixema turmbêlê ye?!**

**_ Ezjî nizanim jiber çiye!**

**_ hevalê te haha dê dîn û har bit,tû yê wek har û dîna jixew radibî..Hûn nabêjin,hewe çiye?Çi lihewe qewmiye?!**

**_ ya min pasporte,pasporta min çû!**

**_ dê her êkadî dine te,te nahêlin bê pasport.**

**_ erê..Lê dê dilê min helînin,heta didine min.**

**_ eve ne xewna pasportê bû.Te çi dixew da didît?**

**Te şer digel nivînên xu dikir!**

**_ bîra min ne îne.Baş bû te ez hişiyar kirîm.**

**_ tû dizanî hevalê te wek har ü dîna jixew rabû, qêriya wî biçûk tirsandin?!**

**_ şvêdî lipirag,me xew nedît,xemên wî yên berî çend salan,lê nû bûn.**

**_ ma hûn çewa çûne wî cihî?**
**_ bêy em bizanin,me hind dît,em yên licihê rodanê.**

**Ew cihê hevalên wî lê şehîd bûyn.Her weku ew gav,her weku ew roj ü ew çirke!**

**_ divêt em sobahî bizifirine mala xu.**

**_ sobehî ne,sobehî ez dê çime polîsan,û daêra pasportan,û gelek çihên dî da hemûya pê agadar bikim.**

**_ em jî dê ên,me bibe mal ü tû here ser karê xu.**

**_ nene,ez dê paşî zifirme hewe.**

**_ dê hilu serekî lihevalê xu bide,diyare gelek yê tureye!**

**_ jê bigerin,bila bimînte bitinê digel giyanê xu,dibit bersiva hindek pirsiyara jê bizanit.**

**Dengek jijora xwarinê hat.**

**_ werin,xwarin amadeye.**

**Biçûka wek roja cejnê kirine xar,beref jora xwarinê çûn.Her êkî xu havête ser kursîkekê ü dest da xwarinê. Her wekü eve cara êkêye vî rengê xwarinê dibînin.**

**_ hilu bila ne mînine lihîviya me,nuke tû gelek yê birisî.**

**_ min birs ya jibîr kirî!**

**_ malate,dê xu hosa bikula kujî!Turmbêl û pêlavate. Hema biçûkên te disax bin.**

**Milê wî girt,jierdî bilind kir,da berî xu ü bire dijora xwarnê ve.**

**_ cihê babê xu bikin.Keremke.Rûne vêrê.**

**_ ka Hesen?**

**_ diyare yê nivistiyeve,min gûtbûyê xwarin amadeye! Dê nihu hişiyar kim.**

**_ nene, jêbigere,nivistin bû wî jixwarinê fer tire!**

**Xu liaxivtina wî negirt.Lihindav serê wî rawestiya.**

**Xewê hemû leşê wî dagîr kiriye,livîn jê naêt,tinê bêhna wî,wek berevanî jigiyanê.hindek cara biserdikevit ü    diçite nav hinavên wî.**

**Baş lihêf biserdada,û hêdî dergeh lê girt.**

**_ biburin,yê nivisitî.**

**_ bila binivit,em ne dibiyanî ne.**

**_ mala heweye.**

**Berê xu da navçavên Husên,wekü pirsiyarê jê kir.**

**_ min çucar nedîtiye hosa kür nivisitî!**

**Birsiva Husên ya amadebû.**

**_ ez derdê wî baş dizanim,xudê harîkar bit!**

**_ keremkin..Hîviye xwarina me bidilê hewe bit.**

**_ gelek xuşe..dest xoş.**

**_ min bitinê ne dirust kiriye,eve xwarina dû kabaniyane!**

**_ bawerke gelek bitam û xoşe..Destên hewe dixoş bin.**

**_ afiyet bit.**

*******

**Jor ja kere,xew şirre,hizir dibelavin,xem digiranin,leş wastiyaye!**

**Dengê hevala jibnê wî gelyê asê ü tarî hat.**

**Keniya wan,yariyên wan,serketin û silametî jê dibarî.**

**Xwe jiser wî berê bilind yê zêrevanî liser dikir.Havête xwarê,qesta kuma wan kir.**

**_ wey hun bixêr hatin..**

**Gelek denga gûtin.**

**_ xêrendar bî.**

**_ êk, dû, sê... Deh...yazde...?!**

**Careka dê hemû hijmartin..**

**_ eve çî ye?Hûn deh bûn,nihu hûn yazdene?!**

**_ em na êne şehîd kirin!Tû lihîviya şehîd bûna me bûy?!**

**_ heker dirêya azadiya welatî dabit,bila ez berî hewe hemûyan şehîd bibim.**

**Baweriya wî her nehat,carekadî hevalên xu hijmartin.**

**Ji tariya berê spêdê,seruçavên wan jêk neniyasîn.**

**tinê kelexên wan diniyasîn.**

**_ eve kiye digel hewe?**

**_ ew hevalekê erebe.**

**_ ereb..?!Em jiber ereba yên revîne serê van çiya.**

**Livêrê jî bela xu jime venakin?!**

**_ eve ji erebên hevale,ewjî yê gehiştî ye şoreşê.**

**_ ereb!Digel şoreşê..?Ez bawer nakim!**

**Keniya wan,înana navê ereb,serinca mêvanî rakêşa.**

**Diviya bizanit ka çi dibêjit,lê hemû dibirsî û wastiyay bûn.Gûtin,paşî..Dê bixu tê gehî..**

**_ em ketin jibirisa..**

**_ berî nanî,min ça divêt..**

**_ ne hûn xwarinê dixun,ne çayê!Heta bû min çîroka vî kabiray ne bêjin!**

**_ piştî xwarinê,bextê te da..**

**_ ezdê bêjim û tû xwarinê amadeke.Mane başe?!**

**_ nebaşe..Lê min çu care nînin.Dê bêje?**

**_ ev kabiraye me birêve dîtiye,ewjî yê revî,biharî kariya hevalekê kurd,xu gehandiye cihên tena.**

**Wî divêt bigehite hevalên xu liîranê !Tezanî?Dê vêca em jibirisa mirin..**
**_ û hewe bawerî pê hat?!Ma jibîra hewe çu?Salê çendên wek wî diêne nav me jibû karên xirab ?!**

**_ em baş dizanin,lê ewî ne vêt linav me bit,em jî dê gehînine hevalên wî.Ew ne xema me ye.**

Mêvanî zanî sohbet liser wî ye.

_ netirse,bira ne tirse!

_ ez jiserokê te netirsiyayme.Tirsa min jixiyanetkariyê ye.

_ min jî wek gelek jihewe.Dû birayên şehîd hene,min jî gelek kes û heval digirtîxanên dujminî hene.

Ez jî yê jisêdarê revêm !

Zanî,dilê wî ma.Hevala jî gazinde jê kirin.

_ madê çi pê çê bit malate,heker şiya linav meda tiştekî bikit,pa em dê çewa şên welatekî rizgarikin?!

_ heker wesa bit?Tû liser ser ü çavên me hatî.

Dê keremkin,xwarin amadeye.

Pariyekê nanî kire didestê mêvanê ereb da..

_ ereb dibêjin,heker mirovî nanê êkî xwar.Çucar lê nabite dujmin!

Nan jidestê wî îna der,sê cara maçî kir,û havête didevê xu da.Tijî navçava bişkurîn û kenî bû..

_ ehlan û sehlan..

_ şokiren.. Sopas..

Xew giran bû,hizir dibin kabosî ve har bûn,leş lawaz bû!

Milê wî bimilê, Elî necefî ve ye.Berahiya wan girtî ye, pişta wan berdaye.

Leşkerê dujminî,bîseka mezin dirêya wan da vedaye. Lihindav serî,sê çar firokene.jidûr,agir jidevê topa dibart. Erd ü esman agire...!

_ ez birîndar bûm...Tû xu qortal ke..!

_ ez te nahêlim,piştrast be.

_ ez her çûm,bila tû ne keviye didestên wanda.

_ netirse,dê litana me ên.Baregayên hevala dinêzîkin. Xu ragire,çu lite nehatiye,nazdariya neke!

_ hîvîdarim tû digerewa min da ne çî !Xu qortal ke.Ez dê şerî kim heta mirinê.

_ ew pariyê nanê te daye min,hêşta tama wî ya didevê min da.Dê çewa te hêlim.Bes biaxive,ez tenahêlim,xu biparêze,heta hewar bigehite me !

Dengê peqîna û agirî,ser jiaxivtina wan stand.

**Elî dinav agirê peqînekê da berze bû,deng gelek nêzîk bû,bersiva wî ne dida..**

**_ Elî....? Elî...?**

**Xu nêzîkî cihê wî kir, xwîn bi dûvra dirijiya.**

**Elî..? Çi lite hat?!**

**Dengekê nizim jibin kuma ber û axê der ket.**

**_ ne tirse,ez yê bisilametim,ez hosa bisanahî na ême kuştin..**

**Xu jipşt wî berî, havête berekê nêzîkî cihê Elî.Zanî birîna wî hêşta ya germe.Lê leşê wî yê sist dibit.**

**_ Elî, katû?**

**_ xu biparêze,dengê golla yê nêzîk dibit.**

**Kilaşînkufa xu bilind kire ser wî berê lipişt.**

**Ew sacora liber kilaşînkufê,vala kire cihê dengê remiya çekê sivik jê hatî..**
**_ her bijît,iha hosa xo ragire,bila dujmin bizanit,em bi sanahî şehîd nabin !**
**hêşta Elî jipesna wî bidawî nehatî,erdu esman bûne agir.Jihest û hişa bû.**

**Cih ker bû,deng nema.**

**Çavên xu vekirin,cih ne ew cihe,mirov ne ew mirovin.**

**Serê xu bilind kir,zanî yê licihekê tena.Lidûr xu zifirî.**

**Elî necefî,yê birex wî ve dirêj kiriye.**

**Lirexê dî,tulazek yê pertukekê dixwînit.**

**Xu livand,deng jixu îna..**
**serinca wî telazî kêşa.Pertuk dana bin Balîfkê xu..**

**_ silametiye,tû hişiyar bûy?Nene,tû gelek yê başî!**

**_ ez likîve me?**

**_ dinav hevalên xuday.Jiwê pirsiyarê bigere,nuke tûyê birisî?Mane?**

**_ erê,ez yê birisî û têhinî me.**

**_ serçavan,nuke dê hemû tişt amade bit.**

**Gazî hevalên xu kir.**

**_ hevalînû,xwarinê bû mêvanê me amade kin.**

**Dê lezê bikin..**

_ serçava..Silamtiye..

_ sopas.Û hevalê min?Çi halê wiye?

_ ew jî yê başe.Berî te ew hişiyar bibû,birîna wî sivke, wî jî pirsiyarate dikir..

_ ü te? Te xêre?Tûjî yê birîndarî?

_ piştî xwarinê,em dê hemû sohbeta kin.Bila?

Serê xu hejand,dilê wî tena bû.

_ xwarin amadeye,keremkin.

_ sopas hevalînû.Dê keremke,navê min azade,dibêjine min azadê hewlêrî..

_ ez Hesenim..

_ û hevalê te kiye?Jirengê wî diyare,erebe!

_ ew Elî necefiye,yê jizulma dujminî revî.Diviya biçite îranê, bigehite hevalên xu.

_ Elî.. Elî..

Dengê Hesen wek zengê diserî da deng vedida.Rast rabû ser xu,xu havête hevalê xu,da bersîngê xu.

_ hizar hizar cara sopas bû xudê tûyê saxî!

- sopas bû wan hevalên em rizgar kirîn.

Kak azad,te ne gût?Hewe çewa em rizgar kirin?

_ piştî tû têr nan û nîskê bixûy.Û çayeka reş biseda bikî, ez dê hemû sohbetê bû hewe kim.

Biburin,eve xwarina şoreşêye!

_ nîsk, bab ü biraye.

_ dê kerem kin..

Xew bû dirindekê har.Hizir bûne didanên pîrheviyeka pirsî.Nivîn bûne gorekê teng û tarî!

Dengê firukên dujminî,lihindav baregayê wan keniya wan şêland.

_ xu veşêrin..Xu biparêzin..

Her êk bû xu çû,xu dikunberekî da veşart.

Jiber birînên xu neşiya jichê xu dür kevit.

**Dengê kerba dujminî jinêzîk hat,agir berda wan dar ü bera,cih tijî dukêl bû..**

**Elî milê wî girt,jiwî cihî dûr êxist.Azad leşê wî da bersîngê xu yê birîndar.Harî Elî jiaxê bilind kir.**

**Licihekê tena veşartin.**

**Berê xu da navçavên wan,tijî bişkurîne.Tirs newêrt xu nêzîkî wan bikit!**

**_ hûn natirsin?**

**_ tirs, jime ditirst!**

**_ firokên dujminî yê lihindav serê me?!**

**_ heker mêrin,dê peya bin!**

**Libin wî berê mezin,hersêya xu kirbûn êk.**

**Jitengaviya cihî,ü jiber tevşên agirê firokan,bibûn êk leş.Êk giyan.Bêhna wan pêkve biser diket.**

**Gelî şirr bû,agir vemiriya.**

**_ herwekü ev kun bere bidilê hewebû?!**

**_ ma çikêmasî divê kun berî heye?Wî em parastin.**

**Lihindav serê azad hewlêrî,marek jikuneberî derket.**

**Çavên wî vê ketin,neşiya biaxivit,lal bû,hişik bû.Destê xu jibin kefşên xu înader.Wek mirovekê seqet,bilind kire serê marî.Bidengekê nizim,gût.**

**_ hişiş..Deng ü livîna nekin.**

**Azad,zanî tiştek yê liser milî.**

**Patka marî girt,ü hşik şidand,Elî necefî jî harî wî kir.**

**Lê jiber birînên xu yên hêşta xwîn jê diza.Marî şiya serê xu jinav destên wî bînte der,devê xu havête zenê wî, bihemû hêza xu,kire hewar.Rast rabû serxu.Yê dijora xu ve,dinav xohê da bûye av!**

**Lidûr xu zifirî,kes nedît,berê xu da dergehê jorê,kes litana wî nehat.**

**Wênê wî dixudîka kentura cilka da,dibûne sê çar mirov!**

**Diviya avê vexût,av nebû,diviya gazî êkî bikit,tirsiya hevalên wî birevin!**

**Carekadî xu dirêj kire ser chê xu.xew verevî, hevalên wî berze bûn.**

**Rast rabû,wek har ü dîna qesta kenitura cilkên xukir. Çantek reş jê îna der.**

**_ Eve ptir jideh salaye,ev çante nehatiye vekirin.**

**Eve pitir jideh sale,min hûn jibîr kirîn!**

**Carekadî,hûn bûne hevalên min,beşek jijiyana min.**

**Ew şeva min lipirag burandî,ez dîsan kirme hevalê giyanên hewe.Ev şeva pirag,ew şeva jiyana min deh sala paş ve înay,û sed sala pêşve birîn.**

**Ew şev dê heta kengî digel min bit?!**

**Çante vekir,her wekü mîneka bin erdî dinav destên wî da.Haha dê peqit.Haha dê dengê hevalên wî ête goha!**

**Çante vekir,navçavên azad hewlêrî,wek her dem bikenî bûn.**

**Çante vekir,Elî necefî,berî her sohbetekê,hizar cara digût.**

**_ û Elî.. Û ebas.. Û..**

**Û jinü dest bisohbeta xu dikir..**

**_ kak Elî..Me bawerî biaxivtina te heye.Pêtivî van sonda nîne.**

**_ û Elî.. Ez neşêm bêy sond biaxivim.**

**Keniya wan tijî gohên wî bû.**

**Çante vekir,dizanî,baş dizanî.Êmanetê azad dikîjan berukê daye.**

**Baş dizanî,êmanetê,Elî necefî,çewa veşartiye.**

**Destê wî ma lihindav çantê vekirî,nezanî kîjan êmanetî berî yê dî vekit?!Neşiya biriyarê bidit.Neşiya cûdahyê dinavbera wanda bikit.**

**Destê wî gelek wesama,tirsiya lezê bikit,tirsiya dilê êkî jiwan jixu bihêlit.**

**_ eve azad dûsê fir licigarê dan,te ne gûtê bese!**

**Lê demê lêvên min nêzîkî cigarê dibin,tû dikiye hewar û jimin disitînî.Eve çi dû rûyatiye?!**

**_ lêvên azadî dizirav û nazikin.Yên te wek dû geliyane,  ger cigare kete dinavda,ji nîvê dibûrt!**

**Kenî bilind bû,azad kete ser cihê xu neşiya jikeniya da biaxivit.**

**_ heker jiber lêvên min bit!Tû heqî!**

**_ bawer bike,heker ev sohbet û axivtên xoş û ciwan jiwan lêva derneketban,diviyaba te ew lêv birî ban!**

**Hêşa azad jikenyê rizgar nebibû.**

**_ tû dizanî?Dayka heîder çi digût?!**

**_ çi digût?Digût ez ya peşêmanim,min şo bite kirî.Dê rojekê biwan lêva min daurî..**

**Dîsan tijî cihî kenî bû,azad neşiya jikenyê beşdariya sohbeta wan bikit.**

**_ nene,digût,ciwaniya te,şirîniya te,ew lêvên mezin in!**

**_ ev çi xodê jê staniye?!**

**Azad bikeniyeka bilind ve gût..**

**_ ma em nabêjin.. Erebê lêv doqçik!**

**Kenî nêzîkî gohên wî bû..**

**Jiber gûtinên Elî û sohbet ü dil saxiya wî.Dest da êmanetê Elî û berî bînite der.**

**_ bibure heval azad,ez dê berê êmanetê Elî vekim.Da digoraxuda ne bêjit,te cudahî kir.**

**Da ne bêjit,te azad jimin xoştir divêt.**

**Destê xu bire wê berûka êmanetê Elî necefî têda. Herweku kore marekê birîndar xu têda veşartî!**

**Kumeka kaxez û wêna,dinav turkekê naylunî baş rapêçay da diveşartî ne.Jiwê roja biriyar day,hemû nihênyên hevalên xu baş biparêzit.**

**Mav neda xu,çu tişta diyar bikit,yan bizanit.**

**Evro, peşêman bû,evro jibiriyara xu lêve bû.**

**Zanî dermanê serêşana wî,ew nihênîne,piştî çend salan, çu giringiya nihêniya neman.**

**Tinê derdê kul û birînên wî ne.Taybet piştî wê şeva dicehnema pirag da bûrandî,çu derman nînin,çu tişt wî tena nakin.Tinê ew kaxez ü ew wêne ne,tinê ew êmanetê girane xemên wî diverevînin.**

**Destên wî dilerizîn,çav zilkanê digel wê koma kaxez ü wênên dinav destan da kir!**

**Wênê heîderê kurê Elî,kete beramberî stêrka çavên wî.**

**_ heîder wek mine,dilê şêra yê hey,natirsit.**

**Direwa nakit,her jibiçûkatiya xu hêmayên serkirda yên heyn!**

**Tilîliyên dayka Elî,dibin kaxezave dihatine goha.**

**Huzan û stiran bibejna îmam Elî û Hesen ü husêna ve digûtin.**

**Namekê,dinav destan da,serê xu dixwar.Bêhna kêmiya baranê jê dihat.**

**(bû hemû hevalên peywendîdar..!Bilez..!**

**Jiserçavkên me yên nêzîkî dujminî.Dujmin yê karê xu dikit jibû hêrişeka mezin bû ser hemû devera goma..!**

**Ya aşkiraye,her rikeberiyeka hebit,dê jilayê dujminî ve bidirindetirîn çek ête bersiv dan.! Bidîtina me,dê vê carê çekê kêmiyay bikar înit wek gelek caran ü gelek cihan!**

**Vêca bilez cihên xu vala bikin,xu ü biçûkên xu biparêzin.Hewil bidin çu berihingariyê nekin!**

**Name bidawî hat)**

**_ em deh kes bûn,me xu nêzîkî bngehekê dujminî kir, berî em dest bihêrişa xu bikin.Erd ü esman lime bûne agir.**

**Ma..Hizirên xu kirin,tilên xu hijmartin,paşî perxandin, royên xu pê vemalîn.Berê xu da banê jorê..**

**_ bihemû rengên çekî,neşiyan çu lime bikin,neşiyan dengê me bin ax bikin...**

**Dûsê ründik dinav rîhên wî yên puş da hatine veşartin.**

**_ dû firuka, lihindav serê me agir dibarand.**

**ew qeramê em diparastin,hemû sot.Agirî jî nedişiya çu lime bikit,em jiagirê top ü teyarên wan bihêztir bûn!**

**Giriyê ser jiaxivtinên wî stand..**

**_ tinê wê bêhna jiwî agirî dihat,em gêj kirin.Min kes nedît,ez ketim bin avê, dinav hindek pûyşê hêşta ne hatiye sotin.Hevalên min man dinîva dûkêlê da.**

**Bê deng bû..**

**Azad neşiya xu,gût.**

**_ û paşî...?Tû çewa rizgar bûy?!**

**Berê xu da navçavên azadî,çavên wî tijî tirs û pirsiyar ü hîvî bûn.**

**_ bawer bike ezjî nizanim ka çewa ez rizgar bûyme!**

**Tinê hevala digûtin.Em nêzîkî hewe bûn,piştî firuke çûyn,em lihewe geriyan,me tû dîtî dibin av û pûyşîve mabûy sax!**

**_ dibêjin,av yan patekê ter,mirovî diparêzin.Raste?!**

**_ bawer neke.Ev çekê dirinde biavê bête berevanî kirin!**

**Piştî hizir kirineka kurt..**

**_ ez lipêşiya wan bûm,ez gelek nêzîkî bingehên wan bibûm.Firuka nedişiya jiber bingehên xu,cihê min tûp baran kin.Û wek te gûtî,min jî dersoka xu baş ter kirbû,ü didev difinên xu pêça bûn.Dibit ewjî harîkar bit?!**

**_ hevalên te?!Ew çi lê hatin?!**

**Dengê giriyê jigewriya wî biserket..**

**_ te divêt çi lê bên?Lihindav serê wan tûp barana xerdel û siyanîdê dibarî..**

**Her leşên wan yên pîroz jî nehatin dîtin!**

**Jor bê deng bû.**

**Deng jikaxezeka azad hewlêrî hat.Hişên wî cemandin.**

**Kaxezên Elî necefî,ewên didestîda,wek pertukeka pîroz danane ser cihê xu.**

**Litana wê gaziya jikaxeza azadî hatî çû.**

**Kaxez jiçantê xu înane der,danebersîngê xu...**

**_ hosa bûte naçiteserî.Divêt tû jî bêye ser dînê me..**

**_ ma bû tû naêye ser rêya me?Rêya rast,rêya hejar û palan?!**

**_ ez sozê didime te,her demê milletê me azad bû, herdemê em bûne xodan ala ü dewlet.Ez bême ser rêya te.Da em pêkve yeksanyê ü dadweriyê û azadyê liwelatê xu belav kin!**

**_ bawer neke,heta ewên te gûtîn nebine serwer, çucara tû nabiye xudan ala ü dewlet!**

**_ ez neşêmete biezmanî..**

**_ tû neşêye min birastiya!**

**Name,vekir..Bêhna azad tijî difina bû!**

**Birengê sor hatibû nivêsîn..**

**... Hevalê xebatê..**

**Dujmin yê har bûy.Wesa diyare vayrosa xiyanetkariyê ketiye dinav endamên bê wefa yên meda.**

**Xu biparêzin,hevala biparêzin.Çu livîn û peywendiya nekin.Heta namekadî..**

**Her bimînin jibû xebatê..Dawî.**

**Keniya wê kiça ciwan ü xemilandî,nama didestî da ü ew agehdarî jibîra wî birin.**

**Pejna wê,tijî wêney bibû,deng jilêvên wê yên sor diderket..**

**_ azad,ez gelek jite xerîb bûyme,sebra min bikesê naêt.Were,min jî digel xu bibe,ez gelek ditirsim, dujmin dê me girt.Hemû dizanin,ez yateme, mala min jitirsa dê min firoşin,were,were!Dê berze bim,dê beref nemanê çim..Were,ez libenda teme...!**

**Dengê kenî û yariyên biçûka,jidervey jora wî, hevalên wî tirsandin.Hemûya xu veşartin,kes lidura nema...**

**Ew kaxezên didesitî da,têkivedan,kes nedît.**

**Dengê qotana dergehî,cih şir kr.**

**Qotana dilê wî zêdekir.Tirsiya,recifka leşê wî bû xuh. Herwekü lihîviya sêdarê,haha dê milên wî girin, haha dê kevte beramberî giyanê xu ü hevalên leşê wan lixerîbiya hêlayn!**

**_ ew kiye?!**

**Dergeh vebû,bikeniyeka tijî hîvî.**

**_ ma dê kî bit?!Te xêre?Mêvanên xu yên hêlayne liser xwarinê bitinê û wek pîremêra dergeh lixu girtî?!**

**_ ew ne mêvanin, mal mala wan.**

**_ raste.Lê yên jiber te hatîn,ne hatîne xwarinê bixun!**

**Berê xu da wan kaxezên dinav desitî da,didilê xuda gût, baş bû ev kaxeze nedîtin!**

**_ ka bû min bêje?Tû bû nehatiye ser xwarinê?**

**Min hizir kir tû yê nivisitî!**

**_ ez yê têrim.**

**_ wenîne!Rengê te yê zer bûy.Eve şivêdî tû hatî,ne nan ü ne av te ne biriye devê xû!Ma min ageh jite nîne?!**

**_ bela xu jimin veke.**

**_ dîsan ew çi kaxezin te înayne der?Ma te jibîr ne kir bûn?!**

**_ eve beşek jijiyana minin,dê çewa jibîr kim?!**

**_ em jî beşek jijiyana tene,heker ez neşaş bim?!**

**Mejî mav liserte hene!**

**Berê xu da navçavên wê,ew kenî ü bişkurîna berî wê gavê nemaye,tijî çava rondik bûn,wek biçûkekê sava, xu havête nav sîngê wê da û jidil pêkve giriyan.**

**Giriya wan,serinca biçûkekî kêşa.Qesta birayê xu kir.**

**_ bû babê min û dayka min digiriyên?**

**Husên jinav hizirên xu derket.**

**_ babê te digiriyêt?**

**_ erê.. ü dayka min jî.**

**Qesta jora wan kir,dergeh qota,ew xoşiya herdû têda bû nehêla.**

**_ keremke?**

**_ biburin,eve çî ye?Raste hûn yê digiriyên!**

**_ evî mala min wêran kir.Piştî van hemû salan.Hêşta yê bû hevalên xu digiriyêt!**

**_ zehmet nebit,me bihêle bitinê.**

**_ keremke,hîviye tû bişêy jinav van xem ü kaxeza bîniye der!**

**Destê xu dana ser milî.Ketine beramberî êk.**

**Hizra herdû birine roja niyasîniya wan ya êkê.**

**_ kurê min êmanetî teye,heker tû digel xu nebiye ewrupa,ez wî nahinêrim.Yê kêm xwandine,çu ezmana nizanit.Dê berzebit.**

**_ tû mirovekê gelek zanay,tinê ya jite kêm,êkî wek mine.**

**_ ez dixema sohbeta babê tedanim.Digût yê nezan û ne xwandeware.Dê berze bit.Negût dê hewe hemûya bite ser avê û têhinî zifirînit..**

**Bişkurî,Husên jî jinav hizirên wî azad kir.**

**Ronişte ser lêva textî birexve.**

**_ heker dê hu kî?Ez çucar têkiliya te nakim.**

**Ez baş dizanim,ew heval çi bûn dijiyana teda.**

**Lê eve çend sal bûrîn,ü te çu dest diwî karî da nebûn.**

**tû ne eger bûy.Ne goneha tebû!**

**Serê xu bilind kir.Wek biçûkekê gonehbar.**

**_ min çu bû wan nekir.Min tula wan venekir.**

**Min kelexên wan lixerîbiya hêlan.**

**_ ne bite bû,dem û cih ü kawdana,wesa dixwastin. Kesê çu desthelat nebûn.**

**_ raste , raste..**

**_ vêcarê,ez bûme eger!Şaşiya min bû.Te jibîr kir  bûn. Min tû biriye wî cihî.ez kunehbarim.**

**_ nene,neke kuneha xû.Min çucar jibîr nekirîne.**

**_ wek min gûtî,ez gonehbarim,heker tû xu nekiye mirov û jivî kevlujankî dernekevî,ez dê hest bigonehbariyê kim ü ez dê têkiliyate lixu heram kim.Tezanî?!**

**_ gelek bizehmete,gelek bizehmete.**

**_ çu tişt bizehmet nînin,heker mirov zelam bit.**

**Berê xu da navçavên wî,zanî barê wî yê giran kirî,tirsiya wî jî jidest bidit.**

**_ xema ne xu,hevalîniya te bû min geleke!**

**_ heker rast bit!Hilû here çavên xu bişo,û were têr bixo,da ez bawer bikim.Ü başî dê te bime cihekî xoş,da tû diniyayê ü xemên wê jibîr bikî.**

**Lê berî hemû tiştan,divêt tû van kaxez û wêna bisojî.**

**_ ne..!Bibure,ew êmanetin!Ew wek pirsgeheka pîrozin bû min.Herdemê ez şaşiyekê dikim,ez qesta wan dikim.**

**_ divêt tû van êmaneta bidiye xudanan.Da tû jibenda wan rizgar bibî.Hewil bide diseredaneka welatî da,biçiye malên wan.**

**Erê,here malên wan,digel kes ü karên wan biaxive, rastyê bû wan bêje.Ez bawer dikim dê bêhna te fireh bit.Dê jivî baznê te bû xo çêkirî derkevî.**

**_ min gelek ew hizir kiriye,lê min ew dil ü ew şiyan nebûne.**

**_ diçara bêt da ez û tû dê pêkve çin,ü dê van kaxez û wênên wan jî digel xu bin,ü dê çine malên wan ü dê digel hemûyan axivin,dê rastyê bû wan bêjin.Da tû tena bî.**

**_ sopas.Te dilê min tena kir.**

**_ karê xu bike,divêt em tula xu bû kiçên pirag ne hêlin!**

**_ ez neşêm bême pirag.**

**_ em tûla xu bû kesê nahêlin.Wan dilê meyê sotî.**

**Vê carê jidil kenî,ew kaxez ü wêne pêçan,û carekadî kirine diwî çantê reş da,û çante havête dibinê kenitura cilkada ü qesta cihê dest şoyê kir.**

**Carekadî,kenî û sohbet tijî dîwana wan bûn,lê pirsiyareka har,serê jinkên wan dixwar.Taybet jina Husênî.**

**_ divêt hûn rastyê bêjin!**

**_ rastiya çi?!**

**_ rastiya xem û tûrebûn û..!**

**Jina Hesen pirsiyara sîyê kir.**

**_ ü dizîna turmbêla hewe..?**

**_ turmyêl çû..**

**_ bila wêvetir biçit, lê çewa çu?**

**_ hate dizîn!**

**_ çewa..? Û likîve?!**

**Hesen neşiya xwarina xu bixot,kaçikê xu dana ü ma hilawîstî dinav pirsiyarê wanda..**

**Husên dengê xu bilind kir.**

**_ turmbêl çu,hate dizîn ü bes! Bihêlin ev camêre nanê xu bixût.**

**Herduwa zanî nedemê van sohbetaye,sohbet gohartin.**

**_ hûn dê evro me kîve bin?Dê çi şîv dine me?**

**_ binîva dilê heweye.**

**_ tinê medivêt jivî avahî derkevin.Em nehatîne ronin.**

**_ ü tû çi dibêjî,kak Hesen?**

**_ wek te gûtî.Binîva dilê wane.**

**_ dê bixû,ü karê xu bike,da dinav bajêrî bigêrînin.Da bajêrê xu nîşa wan bidin.Û bila baş birisî bibin,başî...**

**_ başî em dê zanin ka dê çi kin..**

**Dengekî kire hewar..**

**_ gelî biçûka xu lêk bidin,em dê çine bazarî,dê çine (mêkdunalsê).**

**Hemûya pêgve kirine keyv û qêrî.Her êk bezî dayka xu,ü karê xu kirin!**

**Bajêr yê jixew rabûy.Cade,kulan,bazar.Ditijî mirovin. Evro,roja bêhnvedanêye.Hemû yên linîva bajêrî kum bûyn.Kirîn û firotin, dikuka xodaye.**

**Her êk jiwan çar biçûk hene.**

**Heşt biçûk.ü çar mezin.Her cihê diçinê, tijî deng ü livîn dikin.Serinca xelkî dikêşin.**

**Livî welatî,herkesê jidû biçûkan pitir digel bit,wek tiştekê ne siroştî diyar dikit.Dibite temaşe,hemû kes biçavekê hinêrî berê xu didinê.**

Bêhna zelama teng bû.

_ da biçine cihekê bê mirov,şerma me çû.Em yên bûyne pêtirankên xelkî!

_ bila xelk serê xu lidîwara bidit.Ma jiseyên wan çêtir nînin?!Her êkî dû sê se yên digel!

_ welat,welatê wane.Sa xûdan kin.Kera xûdan kin, mayê me tê naçit!

_ mayê wan jî dime naçit..

_ raste,belê em wastiyan bivan biçûka ve.

Da biçine baxçekê xoş,dê biçûk jî pitir azad bin ü dê bû xu yariya jî kin!

_ bi keyva mêvanaye..

_ hûn rast dibêjin,van biçûka em hêr kirin.

_ ez dê hindek xwarinê kirim ü em dê çin.

Hewe çi divêt gelî biçûkan? Dê çi xün?!

Her êkî rengekê xwarinê daxwaz kir.

Libaxçê mezin û berfireh.Her biçûkekî qesta yariyekê kir.Xwarin bû dayk ü baba hêlan.

Herdû dayk,ketin sohbet û axivtinên taybet.

Herdû baba xu jihemûyan dizîn,dûr jiwan ketin beramberî hizirên xu.

_ ez dizanim,te divêt bitinê digel giyanê xu bimînî!

_ nene,bawer bike,heker tû nebay ü sohbetên te yên xoş neban,ez da dîn ü har bim.

_ ez te nahêlme bitinê, pişt rast be.

_ min jî nevêt bimînime bitinê.

_ min gût turmbêla min çu,ez dê jite pitir ture bim.Lê..!

_ malê diniyayê qirêja destaye,diçit ü diêt.Lê dema mirov heval û xoştivyên xu jidest didit.Wî demî pare û malê diniyayê dibine xolî..

_ ew şeva em lipirag mayn,xew neçu çavên min.

Ez neketim dixema turmbêlê da.Min zanî tû nazifirî wek berê.Wê şevê heta spêdê,tû dixewda daxivtî..

_ ma ez kengî nivistim?!
_ te gelek sohbet kirin,wek dîna lite hatibû,ez jite di tirsiyam.

_ wê şevê,ez zifirandme berî çendîn salan.Berî serhildanê.Ez zifirandme şoreşê,girtîxanê,xerîbiya, hevala.

Heta ez înayme ser kelexê azad û Elî...

_ wê şevê, ez jî jidil ü wijdan hejandim.Min jî eve çend sal bûn hizra çu tişta nedikir,hizra wê şoreşa me kar bû kirî,hizra şehîd ü hevalan,hizra kes ü karan,hizra dayk ü baban.

Eve demekê dirêj bû,ez bibûm kerê karî.Jikarî pêve min ageh jiçu nebû!

_ kar ne şerme,lê nabit hemû dem û mejyê mirovî bû karî bit.

_ tû baş dizanî kak Hesen,min çend hejarî ü nexoşî dibiçûkatiya xu da dîtîne.Min nevêt biçûkên min hest bikêmasiyekê bikin,min nevêt Ewa min dîtî,ew bi bînin.

_ netirse!Dem ne ew deme,cih ne ew cihe!Jijiyana wan ne tirse.

_ erê.. Ma heta heta em dê livî welatî jîn?

_ tejî libere bizifirî?!

_her kesê welatek hebit,divêt gurê wî liwelatê wî bit.

_ eve cara êkê ye,min goh lê dibit,tû behsê mirinê dikî. Xudê xêr kit...

_ mirin bila bixêr bêt,tinê min tola xu vekir ba!

_ tû liser tolvekirinê yê rijdî?!

_ çu pê nevêt!Ez tola xu bû kesê nahêlim.

_ ma tû pêve naçî?

_ ne..Ew tumik bû,da kiçên pirag kehî bin,bisanahî bikevne davên me.

_ hejara ew bixu dibê çeng û kehî ne!Çu tumik û dav pê nevên.

Lidur xu zifirî,ka kesê goh lê nabit,devê xu bire bin gohî.

_biserê te yê ezîz,ez cihekî dizanim,tû dê mîniye heyirî û nizanî ka kî jikîjikê ciwantire!

_ pate bû em birine nav kuna diza?!

_ zikê min yê diriyay.

_ erê.. Sera birisê..Kete hebsê.

_ mal mîrata nehêlan em çu bikin,min diviya bûte bikime hilketin.Min liber bû te bibime wê malê,ü te pavême nav kuma wanda,û bêjimete.Dê heker tû mêrî,dê zanî ka kî jihemûya ciwantire!

_ şüna kiçên ciwan,te ez birime nav diz û polîsan.

**_ suz bit,ez tola wê rojê û wê şeva giran vekim.**

**Şiya lêvên wî bikeniyeka sar bixemlînit.**

**_ tûjî suzê bide,wê karesatê jibîr bikî.Bese te jiyana xu û ya biçûkên xu kiriye dozex.**

**_ ez neşêm sozê bidim,heta binemalên wan ne bînim.**

**_ eve hizireka başe.Here seredaneka welatî,ü here malên wan,ü rastyê bû wan bêje.Ez bawr dikim, ew jimêje rastyê dizanin,herdû endamên dû parta bûn, nuke her pirsiyara wan hatiye kirin!**

**_ dibit,lê dilê min tena nabit,heta dayka azad û kurê Elî, gerdena min aza nekin.**

**_ herkesê goh lite bit,dê wesa hizir kit,te ew yên kuştîn!**

**_ min ew nekuştîne,lê min ew hêlan bitinê lixerîbiya.**

**_ kesê nedişiya bu wan çu bikit,çu rê nebûn, partiyên ew endam têda,neşiyan çu bikin,rûdan ji hemûyan mezintir bû.**

**_ partyên kesê bû çu nakin!Lê heval bû hevalî xu didite kuştin.**

**_ dê here welatî,û wan bibîne,paşî tû dê bawer kî. Herkesê çû,hate jibîr kirin,kes xu gorî kesê nakit.**

**Te jin ü bçûkên yên heyn,wan jî mav liserte heye,wan jî divêt tû dinav wanda yê amadebî.**

**Dengê keniya dû kiça,sohbeta wan birî.Berê her duwa kete cihê kenî jê hatî..**

**Kiça zanî keniya wan nêçîrek kir,xu pitir çivêl kirin.**

**Nêratiya wan har kirin,jin û biçûk jibîr kirin.**

**Bû çavzilkanê digel wan.**

**Kiçekê qesta wan kir..**

**_helû... Hewe cigarek heye?**

**_ me dû cigare yên heÎn..**

**_ me tinê êk divêt..**

**_ wey serçavan.. Keremke.**

**_ sopas.. Heta dîtinakadî.**

**_ bû heta dîtinekadî?Werin pêkve cigara xu bikêşin.**

**_ heker hewe bivêt.Hûn werin?!**

**_ eve em hatin.**

**_ dê kîve çî?Ma tû garana biçûka digel xu nabînî?!**

**_ biçûk xemate,eve ez çûm.**

**_ dê were,jê bigere,ne demê wane.**

**_ pa kengî demê wane?Heta em pîr bibin,Mane?**

**Dengê biçûkekî, nêçîra wan revand.**

**_bab.. Bab.. Werin da biçine mal.**

**_ iha min çi gût?**

**_ dabiçne mal,bihîviyateve bit,me ter nekir.**

**Berî bêne nik biçûkên xu,xatira xu jiherduwa xwastin,soz dan carekadî bêne vî cihî.**

**Wek dû peykera dinîva biçûka da man mendehoş. Diniya lê tarî bû, beref mal dane rê!**

**_ 10 _**

**Serê wî bibû zikê jina liber biçûk bûnê.**

**Diviya wê kula didilî da kêm ü edavê girtî,bipeqînit. Diviya wê bakuzîrka dimejî da vemirînit.**

**diviya wî robarê şêlî yê dinav dilê wî da.zelal bikit.**

**_ ewa me kirî.Ewa hatîye serê me.Hemû hate jibîr kirin?!**

**Serê xu yê giran hejand.Tijî lêvên wî bişkurîn bû,hate bîra dema hevalê wî yê pêşmerge digût:**

**_ sopas bû xudê em nehatin şehîd kirin.**

**Ne jitirsa giyanê me,lê jitirsa biçûkên me da mînin bê xudan,ü da berpirsek jina me mar kit,yan da kite êvelî!**

**Wî demî,gelek kenî.Nihu zanî ka wî çi diviya bêjit!**

**Kesê ageh jiyê dî nîne,her kes libere zikê xû têr kit.**

**Bila hevalê wî yê birsî bit.Her wekü eve ne ew kesên xu gurî êk dikirin,xu bû êk dikirine çeper!**

**Xebat hate jibîr kirin.Ewên lidestpêkê wastiyayn.nihu pitir diwastiyayne.Şehîd tinê liahenga diête bîra wan,tinê çend çirkeyeka bû giyanê wî dirawestin,paşî çihên xu liser kursîka xoş dikin.**

**_ biburn,ez yê limala azad hewlêrî digerim?**

**_ azad..Azad hewlêrî!Tû dizanî nîva hewlêriya navên wan azadin..**

**_ lê tinê êk bû jihemû dilê xu bû welatî kar dikir.**

**Zanî yê wastiyaye,zanî barê wî yê girane,hêla ü çu ser rêya xu.**

**_ bibure ez nizanim..**

**Rêya hindekên dî girt..**

**_ ez yê limala azad hewlêrî digerim..**

**Bêy digel biaxivit,tila xo dirêj kire malekê..**

**Dergehê malê qota,li hîvyê bû azad bû dergehî vekit!**

**_ eve ye mala azad hewlêrî?**

**_ nexêr..Eve mala Mamusta Salare.**

**_ diyare Mamusta Salar birayê şehîd azade?!**

**_ şehîd azad?!Me çu şehîd nînin!**

**_ tû jivê malêy?**

**_ ez xêzana Mamusta Salarim.**

**_ ez dişêm Mamustay bibînim?**

**_ belê, keremke.**

**Lijoreka mezin û lêkday ronişt,lidîwarê beramberî wî, wênê serkirdekê mezin hilawîstîye.Li rexê dî wênê bûk ü zava diperwazekê zêrîn da hilawîstîye.Dinav ciwaniya jorê da berzebû!**

**_ tû bixêr hatî,ez Salarim.Keremke?Ez dişêm biçi xizmeta te bikim?**

**_ bibure,Mamusta.Ez Hesenim,hevalê şehîd azadî me..**

**_ azad...?Ha...!Birastî wî kuleka kûr êxiste dilê me mirovekê dil sax ü xoştvî bû.**

**_ ez bawerim,tû birayê wî yê mezinî?!**

**_ belê, raste.**

**_ min diviya dayk û babên wî bibînim,min diviya xoştiviya wî bibînim..**

**_ bibure,behsê xoştiviya wî neke.Û dayk ü babên wî yên mirîn!**

**Serê wî pitir giran bû.**

**_ ez dişêm bizanim ji bû çi pirsiyara xoştiviya wî nekim?!**

**_ xoştiviya wî ya şû kirî,û gehiştiye mal ü mêrên xu!**

**_ lê..?**

**_ bibure,min dem nîne.Heker te tiştek taybet heye bêje?**

**_ birastî ez digel bûm demê şehîd bûy...**

**_ ez dizanm.ew çu xu gorî welatî kir.**

**Neşiya xu,çavên wî tijî xwîn ü rondik bûn.**

**_ herweku hewe yê bîr kirî?!**

**_ divêt em bijîn,çi libîra me bit yan ne.**

**_ lê eve çend sale jibîra min ne çûye.ez neşêm baş bikenim,jigiraniya barê xu,ez neşêm bijîm.**

**_ wesa diyar hûn gelek hevalên êk bûn!Bibure,divêt ez bigehme karê xu libaregay.**

**Kulan lê hate êk.Rê tarî bû.Nezanî dê kîve çit.**

**... Dayka wî ya mirî...Babê wî yê mirî...Xoştiviya wî ya şû kirî...Birayê wî yê jibîr kirî...Kelexê wî ligoristanekê linêzîkî pirag tijî ser giyaye!**

**_ bira..Tûjî bes xema wî bixû.Eve te biçavên xu dît ü bigohên xu goh lê bû,ka birayê wî çend xema wî helgirtiye?!**

**Diniya hûye,yê çû,ew hate jibîr kirin.**

**_ ez jî dê wan jibîr kim..Erê,ez jî wek kes û karên wan, wek yar û hevalên wan,ez jî dê wan jibîr kim.**

**Lê ez nizanim dê çewa wan jibîr kim...?!**

**_ te çewa mala Elî necefî dît?**

**Serê xu kire dinav destên xu da,hişik şidand,diviya mejyê wî bizêt,diviya tiştek jinav naxê wî derkevit.**

**_ bîra min ne îne!**

**_ divêt ez bizanim,da bişêm harî te bikim.**

**_ kes neşêt harî min bikit.Tinê şev ü roj dê min kine mirov!**

**Cih şir ü bê deng bû.Giyanê wî bû kutirek û digel hizirên wî zifirîn.**

**_ ez yê limala Elî necefî digerim,Elî necefî?Babê heîder?!**

**_ nîveka xelkê necef navên wan Elîne,ü hemû babên heîdern..**

**_ berî çend sala lipirag hatibû şehîd kirin?!**

**_ lipirag..?!Pirag çîye?!**

**_ pirag paytextê çîke.**

**_ çîk...?Ma şoreş jigoma derbaz bibû?!**

**Kenî tijî kulanê bû.Lêvên wî jî xemilandin.**

**_ biburin,ev kese yê pirsiyara mala heîder dikit!**

**_ wî çi divêt?Mane bese?Ew jî gurî xu kirin?!**

**_ xoşkê..Ew ne xelkê vêrê ye.Hevalê babê heîder bû...**

**_ babê heîder..?! Elî?!**

**_ erê..Ez hevalê Elî bûm.**

**_ hewe Elî gurî xu kirin.Hûn têr nebûn.Hewe bela xu ji heîder jî venekir heta ew jî gurî xu kirîn.Nihu me kes nema.Xu bigirin,heta kurê heîder mezin dibit,da wî jî gurî xu bikin,yan dê hema vê gavê bin....?**

**Giriya wê,dilê wî sot,tep ü mstên wê lileşê xu didinan, herwekü liserê wî diketin.**

**Wî jî biherdû desta biserê xu dada..**

**_ heîder jî şehîd bû?!**

**_ erê jibû çi hûn rojekê misteka arî....?Parçeka cilkî...? Dû filsa?Digel xu bû van sêwiya naynin....?!**

**Dengekê awazên giriyê jê bilind bûn.**

**_ tinê navên wan şehîdin..Kelexên wan jî diberzene...**

**Roj,wek tîrorstekî lihindav serî bû,agir jitîjkên wê dibarî. Leşê wî yê wastiyay,hest ü hizrên wî yên birîndar,di gezandin.**

**Kulan tijî gilêşe,tijî sêwy û gerokin.**

**Liher kujiyekî,mirov hest dikit,tîrorstek yê çavzilkanê digel giyanê mirovî dikit.**

**Liser her dîwarekî,dehan navên şehîd û kujtiyan dihilawîsitî ne.**

**Bazar û kulan,tijî patên kesk û reşin.Navên her sêzde îmam û hemû serkirda,ji navên xu baştir dizanin!**

**Nan dilüliya tivenga ra digehte gewriyên wan.bêhna xwînê jibangê nivêja diêt!**

**Mezarên îmama,yên bûyne baregayên partên siyasî. bazara kirîn û firotina baweriyan,jibazarê gazê bibiha tire!**

**Rengê jiyanê ya hatiye gohartin,dan ü standin ya  hatîye gohartin,çil ü berg yên hatîne gohartin.**

**serusîmayê bajêrî,berev gohartin diçit!**

**_ bibure mamusta..Livêrê ne mîne!Ev bajêre ne yê arame.**

**_ heker necef ya ne aram bit?!Pa kîrê arame?!**

**_ ez dibêjme te!Zü bizifire wî cihê tû jê hatî livî welatî çu cih diaram nînin.**

**_ min kes jimala Elî nedît!**

**_ kes jimala Elî nemaye tû bibînî!**

**Tijî gerîyên eniya wî xoh bûn,bilêva kirasê xu eniya xu vemalî.**

**Berê xu da navçavên wî rêberê eve çend roje digel wî, jibû dîtina binemala Elî necefî.**

**Zanî yê rastyê dibêjit!**

**_ dayk ü babên wî digirtîxanê ve mirin**

**Dû pismamên wî,sêdare dan.jina wî piştî zanî yê şehîd bûy şü kir.**

**Eve berî çend heyveke,kurê wî heîder jî bidestên tîrorstan hate şehîd kirin..**

**Roj lihindav serî har bû,hest kir,mejyê wî jorda digoh û difinan da bû şirrik ü hate xwarê!**

**Rengê wî zer bû,tirs tijî pîstê wî bû.**

**Lipişt xu zifirî,kes nedît,pitir tirsiya,dev lê hişik bû,li avê geriya.**

**Rêberî zanî axvtinên wî karê xu liser hest û mejyê wî kirin.**

**Perdaxeka avê kire didest da.Av dihemû gehên wî yên kel geriya.**

**Hişên wî yên nivistî hişiyar kirin.**

**Cih lipêş çava xûya bû.Jiyan digêleşoka xokujtin û berevanyê da ye.**

**Hizirên hemûyan dişêlîne,paşeroj nediyare.Tirsa wî zêde bû.**

**Dinavbera wefadariya wî,bû hevalînyê,û rastiya jiyanê.Şerek dijwar rû da!**

**Leşê wî yê westiyay û lawaz,dilê wî yê jar û bikuvan, mejyê wî yê aloz.Gorepana wî şerê dirinde ye.**

*******

**... Jina wî şü kir... Kurê wî şehîd bû...**

**Elî kîye? ... Şehîd...?**

**Babê wî,dayka wî,pismamên wî,kes nemayne!**

*******

**_ tû şêrê gomanî..Tû bazê nêçîranî...!**

**_ malate,hindî me goh lê bûye.Di bêjin.şêrê çiya.. Û bazê lata.. Ma gomajî şêr û baz hene...?!**

**Keniya wan biser çiyay ket,ew çûçkên dinav wan diriya ra,jiser hêlîna revandin.**

**_ şêrê çiya û bazê lata,ew tûy,ew min bû te hêlayne,lê bêhna te ya teng,nehêla ez sohbeta xu bidawî bînim.**

**_ jê bigere,wî hemû tişt bû xu divên.**

**Dibit şêrek û bazek,bû seredan çûbne goman?!**

**Eha ez ew şêr û bazim!**

**Keniya wan diniya hemû tijî keyv û birayetî kirin.**

***

_ bibure, min dem nîne..!

- Azad kî ye?

_ Xuştiviya wî şü kir...

- Dayk û babên wî bikula mirin!

***

Hewlêr,lipêş çava,wek pîrejineka nesax xûya dikir. Kulanên wê,wek kezyên sipî ü nevehandî bûn.xem û nexoşiya,cihê kenî û girnijînê liser lêvên wê yên qormçî girtibûn.Kelha wê,wek sîngê pîrejineka xudan nevên hejare.

tijî hejar û bê mal bûn.Dilê wê jihîviya yê hişke.

Kes xo lê nakite xodan,kes berevanyê jê nakit.wek caran.demê liser dibû şer û berîkanê jibû ramosana wan hinarên rûyan.

Rûyên wê yên çirmisîn,kes simbêlên xo vêra na husît. Çavên wê yên hişik bûyn,rondik jê na zên.

hejar ü evîndar avê jê vexon.Kes sirûd û huzana bi bejna wê nabêjit.

Kiras û kurtekên wê,parçe parçe,"liŞêxlla" hatine firotin.

Hemû pêkve,heval ü neyar.Liser qerqodê wê yariyên siyasî dikin!

Çu kenc nînin,çu telaz nemayne,lişevên serma ü rojên birsî,xo gorî kiçeka hejar litaxekê bê moxtar bit!

Hewlêr,ya pîr dibit...

Şer,dijwar bû,hest zifir bûn,peywendî veqetiyan, mirovayetî,bû peyveka biyanî,zanist bû bazirganî.

Ewên dohî guştê şoreşgêra dixwarin.Evro liholên berfireh,pesna wan diête kirin.Pêkve dilîstekê da xo dihelbjêrin!

Şer,bû agirekê sor,mejî lê ron kir.Ew kula didilî da bûye kêm û edav.Peqand.Licihê kêm û edavê,xwîn jê hat!

***

_ tû mirovekê seyrî!Te divêt diniya hemû wek te bit!

**Ew rojek bû,nihu rojeka dîye.Cihekê dîye.hindek mirovên dîne.Divêt tû xu bigihorî.**

**Divêt tû ji kevilujankê xu derkevî.**

**Ne tû bitinê livê diniyayê dijî !**

*****

**Kete dizifirokeka dijwar da,reng jibîr kirin,hest biçu tama nedikir,mirov lipêş çava bê seruçav xûya dikirin.**

**_ erê, te ne gûte min? Te çewa welat dît?Te çi kir?Ew egera tû jibû çûy?Te bicih îna?**

**Pirsiyar negehişte goha,ew devê deng jê derketî.Wek dupşkekî hate pêş çavan!**

**Diviya bitinê bit,diviya digel giyanê xu bimînit.**

**Livîn,axivtin,awir..**

**Bibûn gorgên har,leşê wî didane ber leqan!**

**_ xu mijûl neke,ez te nahêlme bitinê.Divêt ewa didilê teda,derkevit,da leşê te tenabit.**

**Serê xu bilind kir,hêşta şerê wefadariyê û rastyê dimejî da yê likar bû!**

**_ te çi jimin divêt?!**

**_ min divêt tû xu bikiye mirov.Wek mirova bijî...**

**_ ma ez ne mirovim?**

**_ bibure,tû ne mirovê vî serdemî!**

**_ dibit.**

**_ min pirsiyara te kir?Te welat çewa dît?**

**_ welat,her ew welate,mirov ne ew mirovin..**

**_ wek min gûtî,tû neyê vî serdemî..**

**_ û min gût dibit.**

**_ û ew egera tû jibû çûy?**

**_ evera çi?!**

**_ ez baş dizanim,tû jiber çi çubûy,vêca bêje ka te çi kir? Te mirovên wan dîtin?Çi gûtin?Tû jiwî êmanetî rizgar bûy?!**

**Kenî,jidil kenî.Ew kenî bû destpêka serketina rastyê liser wefadariyê da,dişerê man ü nemanê da!**

**_ mirovên çi? Şehîdên?Kesê ageh jikesê nîne.**

**_ ma min çi digûte te.Herkesê çu,her weku dayka wî berhavêtî.**

**_ raste..Hemûyan we digûtin,lê mixabin.Bêjin daykên hindek şêran,berhavêtin... Mixabin.**

**_ çu tişt nehejî mixabinyê ne.Tinê ew şeva me lipirag jidest day!**

**_ tû jiya xu venabî!**

**_ heta mirinê..Her kirine!**

**_ kirin jibû paşerojê?Yan jibû pêsîrê?!**

**_ ma paşerojek jipêsîrê baştir heye?!**

**_ 11 _**

**Cih,rêyeka tenge,dinav daristaneka tarî da...**

**Dem,yê jibîrkiriye.Heval,dengê hindek çûçik û balinda ye.**

**Dujmin..peyvên mirovayetî,hevalînî,wefadarî,welat, şehîd,xebat,dîn,xoda,kes ü kar,millete!**

**Armanc..berjewendiyên taybet,pare,jinên ciwan, jiyana bisanahî,kursîkin!**

**Şer dikuka dijwariyê daye!**

**_ tû mirovekê seyrî!Te divêt diniya hemû wek bit.**

**_ şoreşa çi? Şehîdên çi?!**

**_ te divêt her kesê rojekê wastiyay.Şevekê nenivisitî. Qamçiyeka dujminî leşê wî maç kirbit.Bigehite mavê xu. Kes ne ête jibîr kirin!**

**_ padê çewa qesir ü bêla avakin?!Padê çewa bine xodan pare libenqên ewrupa?!**

**_ tû mirovekê dînî..Tû ne yê vî serdemî!**

**Dengê firîna balindekî,şer rawestand!**

**Zanî jibajêrî dür ket.Tirsiya.Lidür xu zifirî,diviya xu veşêrt.**

**_ hişiyarbe!Xu veşêre,dujmin yê nêzîk bûy!**

**_ dujmin jihindê kêmtire,ez xu bû veşêrim!**

**_ ma tû jigiyanê xu natirsî?**

**_ ew armanca ez jibû xebatê dikim,tirs dinav peyrewê wê da nîne!**

**_ mirov çend yê mêrxas bit,her ditirst.**

**_ tirs ne bimêranyê ye,bibaweriyê ye!**

**Heker mirovî bawerî bixebata xu hebit,natirst.**

**Vêca dibite mêrxas.**

**_ dengê xu kêm ke,eve hatin..**

**_ bila bên,ez amademe...**

**Dengê reva sivorekî leşê wî hemû hejand.Tijî mejyê wî tirs kir.Lihemû rexa zifirî,çu dujmin nedîtin.Diviya birevit, diviya bikite hewar.Çu cih nedîtin xu lê veşêrt!**

**Sivorey,liser çeqekê darê,bihemû dengê xu pê kenî...**

**_ te digût ez natirsim,xoş mêr?!**

**_ sivorê pîs,heker tû mêrî dê êye xwarê jidarê..**

**_ heker tûjî mêrî dê êye min liser darê.Hahaha...**

**Dest da tayekê darê hişik,bihemû hêza xu disivorey werkir.Her nêzîkî cihê sivorey nebû.**

**Zanî yê bê hêz bûy,tiv kire cihê sivorey û pişta xu dayê. Sivore jivî çeqî çu yê dî...**

**_ pîratîye,ez jitank û topan ne ditirsiyam!**

**Çu nemabû jiber vî sivorê pîs,min tijî derpê xu mîz kirî.**

**Lipişt xu zifirî,ka kesê nedît!**

**_ tirsa çi..?Ez jiçu tişta natirsim.Lê divêt ez bizifirim,ez gelek yê dûr ketîm.Heker limin bibite şev!Dê dinaf vê darstanê da gorg min xon!**

**Lez kir,destên xu kirine diberûkên xuda,her çendekê lipişt xu dizifirê!**

**_ tû jî wek hemûyan,pirsiyara xu bike,daxwaza mavê xu bike,te jî biçûkên heyn,te jin ü mal hene.**

**_ min jibû pare ü kursîkan,xebat nekiriye.**

**_ lidemê xebat ü şoreşê,kesê daxwaza çu berambera ne dikir.Lê nihu şoreş ya bûye dewlet ü xodan şiyan.**

**Çu şoreş,hevalên û endamên xu jibîr nakin.Lê divêt tû jî pirsiyar bikî,kes neşêt teraziya hemûyan dirust bikit.Berpirs,bihindek tiştên giringtirve dimijulin.Nabit em hemû gazindên xu biêxne ser milên wan!**

**_ ya min diviya bicih hat.Milletê me jibin zolim û zordariyê rizgarbû.Nihu ez yê biazadî çavên xu bi ala Kurdistanê kil dikim.Min jivê pêve çu nevêt!**

**_ ew ala,kilê çavên me hemûyane.Nan ü jiyan, bizehmetin.ü tû..Bibure,tû yê mezin bûy,pêtivî harî kariyêy.**

**_ babê te yê mezin bit.Ez hêşta yê çarde salî me,jiçarde saliya hêşta bihêz tirim!**

**_ ez bawer nakim..**

**_ bawer bike.nesehke van çend mûyên sipî.**

**Ew ne pîratîye, ew serborin!**

**_ heker tû rast dibêjî,dê ev şeve digel min êye cihê çarde saliya!**

**_ te diniya hemû ya gurî zik û bin zikên xu kirî..**

**_ ma min çi maye jiwan pêve?**

**_ tû bê minetî.ez amademe..Lê divêt kesê niyas mene bînit.**

**_ hêşta tû ditirsî?**

**_ ez natirsim, ez şerm ji jiyê xu dikim.**

**_ ma min ne gût tû yê pîr bûy?!**

**_ em dê ev şeve pîr û tulaza bînin !**

**Keniya kiçekê dikuşa hevalê xuda,kasêta hizirên wî birî...**

**_ te ez xwarim..**

**_ xwarin kême,ez dê te cûym!**

**Kenî mê bû,şer har bû,hizir nêr bûn!**

**_ dê çi kî?!**

**_ dê te xûm.**

**_ çilkên min hemûya bêxe..Min rûs ke..!**

**_ tû jî min rûs ke.**

Deng bilind bû,mejî dikêleşoka şer ü xebat ü nêranyê da,kete dizifirokeka dijwar da !

***

_ kî jihewe,ewên bê jin û mal,sîngê kiçekê dîtîye?Yan maçek likiçekê daye?!

_ eve çi pirsiyarên bê meirîvetin?

_ nene,jê bigerin,ez jî wê pirsiyarê dikim.Kê heta nihu yarek heye?Kê leşê jinê dîtîye?!

_ ewên lileşê jina digerin,naêne vî cihî!

_ bû?!Ma em evên livî cihî ne mirovin?Ma dilê me naçite leşê jina?!

_ birastî divêt em pitir hizra xu divan pirsiyara da bikin. Jin beşekê serekiye djiyana mirovî da.

Lê jiber dîn û xêl rewştên kirêt,me ya xu jijinê tirsandî û..

_ bibure heval.her tiştê mirov mavê wî bidirustî biditê,ne dîn û ne rewşt ü ne xêl.nabine asteng..

_ kesê bersiva min neda.Ez dê dîn bim?!

_ diyare te tiştekê hey?!Hema bû me bêje.

_ erê wesa diyare,dê bêje,bike ser berkê...

_ ez şivêdî...

_ ê..?

_ şivêdî ez dixewda yê bûyme zava...

_ wey liser xêrê bit.Nexşe lirastyê...

Kenî tijî nav tiraşa bû.

***

Dengê gohnêlyê jinêzîk hat.

_ te çi divêt?Dûr keve..Berazê pîs.

Hind dît yê lihindav serê herdû leşên rûs.

_ bibûrin,min hûn ne dîtin.

**Herdû leş dimijûl bûn bialîstina êk ve.jikerbên wî da,pitir dengê gohnêaya xu mê û dijwar kirin.**

**Paş ve revî,lez lipên xu kirin.Gelek çara lipişt xu zifirî.Rê liber berzebû.Leşê wî yê wastiyay,jixuhê ter bû.**

*****

**_ tû na tirsî.Ez baş te diniyasim.Tirs jite ditirst!**
**_ sopas heval.Ez amademe jibû xizmetê.**

**_ tû û dû hevala bû xu jê bigire.**

**Divêt hûn wî sengerê dirêya meda,ev şeve bisitînin.Da em jibû hêrişa mezin amade bin...**

**_ çu heval pê nevên,ez dê bitinê çim.Tinê hûn libenda bersiva min bin.**

**_ lê...**

**_ ez bitinê têra deh sengerên weku wî Heme.**

**Wek min gûtî,lihîviya bersiva min bin!**

*****

**Dengê horêna turmbêlekê,xwîna wî hişik kir.**

**_ ma tû yê kurey?Berê te likîve ye?**

**Leşê wî germ bû,jibinê piya lerizî,çav lê tarî bûn,xu jilêva cadê dûr kir.**

**Li ber dîwarekî rawestiya,hişên wî kum bûn.**

**_ eve min xêre?Çu nemabû turmbêl min bikujit!Divêt ez pitir gohê xu bidime xu... dengê telefona diberuka wî da,dil lê qetand.Recifa wî zêdekir..**

**_ helw?**

**_ eve tû likîvey?Min jideh cara pitir telefona te kirî ye.Tû bû bersiva min nadî?**

**_ deh cara ?Bawer bike,min goh lê nebûye,bibure.te çi diviya?**

**_ ma dê min çi jite vêt?!Were mal,were nav biçûkên xu. Matû birisî nabî?Matû nawastyêy?**

**_ ez ji birisa mirim..**

**_ dê were,xwarin amade ye..Gîro nebe, ha!**

**_ eve ez hatim..**

**Bajêr, lipêş çava yê biyanî bû,kulan,nediniyasîn,mirov dibê seruçav bûn.Deng jihemû tişta dihat,ser lê hêr kirin. Gelek cara dîwar,wek turmbêlan liser tayêra dibezîn.**

**Mirov wek balnda difirîn.Ew kaxezên liber piya,dibûne çiya!**

**Dengê telefona mala wî,hemû jixewa giran hişiyar kirin.**

**_ helw..?**

**_ biburin,eve mala Heseniye?**

**_ belî keremke,tû kî?**

**_ ez dixiturim.Hesen mêvanê meye.Da hûn bizanin.**

**_ çi lê hatiye..?! Wî xêre..?!**

**_ netirse, çu lê nehatiye,tinê tûşî gêşbûnê bibû.Nihu gelek baştire.**

**_ ez dişêm nihu bibînim?**

**_ pêtivî nakit,nîvşeve ü yê nivisitiye,sobe tû dişêy bêye seredana wî.**

**Wek min gûtî,yê başe,lê divêt dûsê rojeka bimînte lixestê.**

**_ sopas dixtur.**

**_ şev baş..Heta sobe..**

**_ heta sobe..**

**_ 12 _**

**_ te ne gûte min,wê nîv şevê hewe çi dikir liwî cihî?!**

**_ bîra min ne îne,min ya jibîr kirî.ü min nevêt carekadî bînime bîra xu.**

**_ tinê rastyê bêje.Hûn liçi digeriyan?!**

**_ tû baş rastyê dizanî.**

**_ min divêt tû jiserî heta binî bidevê xu bêjî.**

**_ bela xu jimin veke.**

**_ heta ez rastyê nizanim,ez bela xu jite venakim.**

**_ em jikumbunekê dihatin.Hevalekî em daxwaz kirne xwarinê licihekê taybet.**

**_ cihekê taybet?!**

**_ erê..Ne ew cihên tû hizir dikî !**

**_ ê?!**
**_ em jiwî cihî dihatin,piştî demekî xoş me burandî.**

**Me nezanî ew kes hevalê dujminî bû.Em kirine dinav tora sîxora da.**

**_ hewe çewa bawerî pê hat?**

**_ hevalekê nêzîkê Elî necefî bû,Elî gelek bawerî pê dihat.**

**_ hîvîdarim min xemên te giran ne kirbin.Tinê min divêt tû wê rodanê jibîr bikî.**

**_ bivan gûtinan,xemên min giran nabin,ez yê vêrbûym.**

**_ te soz dabû,wê roydanê jibîr bikî.**

**_ erê...Sozbit.**

**_ te çi libere?Dê çi kî?**

**_ ez yê lihîviya hevala,liwelatî,dê cihekê baş bû min diyarkin.Dê zifirim xizmetê kim.**

**_ cihekê baş...?Wek çi?!**

**_ ez jî nizanim,ew baştir dizanin,her cihê bû min diyarkin. Ez amademe.**
**_ hindeka belên dayne te?Dê harî te kin?**

**_ xebat û qorbanyên min,dê harî min kin!**
**_ ji bîr neke,divêt tû jî pirsiyara mavê xu bikî.**

**_ min ne jibû mavê xu bitinê xebat kirî ye!Ez beşekim ji milletekî.**

**_ millet!Hêşta tû yê liser demê şoreşê dijî!**

**_ pîroztirîn dem bû...**
**_ erê...Lera ez dibêjim pirsiyar xu bike.Eve ne demê şoreşê ye !**

*****

**_ helu? Çi lê hat?**

**_ çi liçi hat?!**

**_ çi liwê belêna hewe daye min hat?**

**_ belêna çi?**

**_ ma hewe ne gûtibû min,em dê karekê baş bû te peyda kim?!**
**_ karê çi?**

**_ hevala gûtbûne min,em dê karekê baş bû te bînin.**

**_ kê gûtibû te?**

**_ hevalên min yên şoreşê..**
**_ hevalê te berûka teye!**
**_ xebata min,hevalê mine.**
**_ reşo bidestên xo,heker av dê tebit...!**
**_ ew çewa....?!**
**_ bawer bike.**
**_ ez jivêrê jî bûm,ü liwêrê jî hatime jibîr kirin?**

**_ liwêrê bû xu bineciheka baş dane.Tû xudan biçûkê !**

**_ ez neşêm livan welata bijîm.**

**_ livêrê jî tû yê biyanî.Jiyan ya bizehmete..**

**_ helu.. Ez çi bikim?!**

**_ para kum bike,xanî zeviya bikire..**
**_ min pê çê nabit.**

**_ hevalên te diniya xwarin!Tû çi dikî?!**

**_ helu.... Helu...?**

*****

**_ min çidigûte te?!**

**_ ez tênagehim?!Ka heval û bîrhatinên me?!**

**_ roj hate gihurîn.Jiyan hate gihurîn.Mirov jî...**

**_ ne bêje mirov jî hatin gihurîn...?**

**_ tinê mirovin bisanahî diênegihurîn.Şev û roj her wek xüne!**

**Serê xu yê giran hejand.**
**hevalê wî zanî barê wî yê girin dibit.**

**_ ne...Hişiyarbe,wek geleka ne bêje,ez peşêmanî wan roja û wê zehmetê me?!**
**berê xu da binê esmanî,herweku litişţekî berze digert.**

**_ min liber geleka,çu nekiriye.Ez çucar peşêman nabim. Min ne jibû malê diniyayê şoreş kiriye.min ne jibû çu kesa şoreş kiriye.Şoreşa me jibû azadiya milletekî bû. Jibû welatekê serbixû bû.**

**_ erê, welat azad bû,lê em hatin jibîr kirin..!**

**_ dibit,lê liberamberî biçûkên şehîda,me çu nekiriye.**

**_ tinê xema min ewe...Xudan şehîd ü xudan şiyan ü ewên zehmet dîtîn,ne êne jibîr kirin.**

**_ jibîr bike.Hilû da te bibime cihekî,tû diniyayê bixemên wêve jibîr bikî...**
**_ herwekû min şoreş bû te kirî...!**

**_ min gûtete,hemûyê jibîrbike.**

**_ min jibîr kir..**

**_ dê hilû, karê xu bike..**

**_ ez amademe.**

*****

**Welatên ava û bixudan.Jisiroştê wê diyare.Çiya,rê ü cade,daristan xizmeteka dirust.**

**Xemên milleta sist dikin.Kes xema nan ü tenahyê na xut. kes jibirsa tuşî xeletiya nabit.Çavê hemûyan lipêşvebirina jiyanê ye,hemû lihîvîn geştir digerin,pêtivî nakit,mayê xu dihemû karên siyasetmedara da bikin.**

**Jiyan wek demjêra ye,ne bikêm razî dibit,ne bizêde.**

**Liber lêva robarekê zelal ronişt.Pêlên avê hizirên wî digel xu jorda birin.**

**Cih bê denge,şirre.Ew qêriyên jipêlên avê diên,wek mezîqeka xemgîn,bezê mejyê wî dihelînin.**

**Hevalê wî yê biwê kiça dikuşê da mijûyle.çîhan ya rawestiyay,tinê hindek caran deng jihindek pêlên har ü dengê hevalê wî û wê kiça dikuşa wî da,û hindek cara ew çoçkên şûym,dîwanawî dişêlînin.mêvanên wî sil dibin.**

**Mêvanên biha giran,hevalên xoştivî,zû dizifirin.Kêm caran dîwanawî ya valaye.**

*****

**_ dê kengî min xwazî?Ez neşêm êdî digel te der kevim.**

**_ xwaztin..?! Tû baş dizanî,ez dê gehime şoreşê,dibit jiyan linav şoreşê bizehmet bit...!**
**_ bila.. Ez jî wek te.Min jî ew welat divêt,ez jî dê wek xu xebatê kim.**

**_ wek xu..?! Ew çewa?**

**_ belê..Heker min xizmeta te û ya hevalên te kir?Eve min jî beşdarî dişoreşê da kir,ma tû nabêjî,şoreş ne tinê çekdarîye?!**
**_ raste.. Raste.. Lê..**

**_ nebêje lê..Wesa diyare tû yariya biviyana min dikî. Tinê demê xu diburînî..**

**_ ne.. Bes wê nebêje.Ez jigiyanê xu pitir hez jite dikim.**

**_ heker rast bit,min digel xu bibe nav şoreşê.**

**_ ez ditirsim tû peşêman bibî.Tûya fêrî paqijyê û xwarina xoş û ronahyê bûy.**

**_ ewên linav şoreşê,hemû kur ü kiçên dayk ü babanin. kes jibin bera nehatîye..**
**_ erê.. Weye..**

**_ tinê te dû helbijar hene..Min jibîr bike..Yan min digel xu bibe...!**

**_ herdû helbijar dizehmetin,tinê min dem divêt,heta karê xu bikim...**

**Dengê dû firokên şerî lihindav serî agir jê dibarî..**

**Cih kire agir ü barût.Her kes birexekîve revî.**

**Dengê biçûk û jina tijî gelî bû.**

**Lipişt xu zifirî,diviya litina wan biçit,diviya liyara xu bigerit.**

**Hevalê wî bikeniyeka sar ve gût..**

**_ hilû, gerate ye..**

**Serê xu bilind kir,jineka nîv rûs,mirov jiciwaniya wê têrnabit.Ya qebê wî dixwazit..**

**_ bila gera min jî bû te bit.**

**_ xêre dîsan?!Vî robarî tû kîve birî?Çi bû te gût?**

**_ ez birime pîroztirîn cih,pîroztirîn dem,pîroztirîn bîrhatin..**

**_ berê xu bide pirça wê,bejna wê,paxlên wê.ya qebê te dixwazit..**

**_ hindek tiştên dî jiwê dijwartirin,yên qebê min dixwazin.**

**Eve ez çûm,bila bû te bit..**

**_ dê kîve çî?Em gelek jibajêrî didürin,dîsan dê berzebî..**

**_ dê bipiya çim.Gelek cara min dûsê cara pitir daye ber sîngê xû ü ez ne wastiyay me.Ma jibîra te çû?**

**_ raweste,eve ne ew roje ,ü tû ne ew mirovî.Raweste em jî dê ên..Te roja me têkda..**

*****

**Firokên şerî,jorda çûne xwarê,agir vemirandin,dukêl sist bû,diniya şirr bû,kitkite jibin ber û taraşa hatine der.**

**Her êkî biçûkên xu hijmartin..**

**_ ka kurê min?Ka kiça min..? Ka birayê min..?**

**Bêhna xwînê tijî gelî bû,leşên wan licihekê vala kum kirin lidura bûne kum.**

**Pirça wê ya dirêj,dinav kelexada ya diyar bû.Dayka wê xu havête ser parçên leşê wê.**

**Hemû man lihîviya wî,çavên wan jiçavên wî venebûn.**

**Hemû çîroka wan dizanin,hemûyan viyana wan pê xoşe.**

**Girî bilind bû,hevalên wê liser leşê wê kirine dîlan.Gelek dayka,leşên biçûkên xu hêlan,û liser leşê wê behiya xu danan!**

**Çavên gondiya zîq man biçavên wî ve.Girî bilind bû.**

**Dengê wê diserî da deng vedida..**

**_ te ez û şoreş yan min jibîr bike..**
**_ hemû dizanin,ya dinavbera me da..**

**_ ez şerm jibab û birayên xu dikim.**

**_ viyana me bike rastî.Diyar bike da biazadî viyanê bikin.**

**Neşiya xu pitir ragirt,agir kete nav hinavên wî,lerizî,gêş bû,bihemû hêza xu kire hewar ü xu havête ser parçên leşê wê yên hêşta xu jê diza...!**

**Kes nema liser hişên xu,çavên hemûyan tijî rondik bûn. Rewşit û tîtalên kirêt jibîr kirin.**

**Hemûyan evînî bitiştekê pîroz zanî,hemûyan xuzî**

**dixwastin bibine evîndar..**

*******

**Dengê giriya wî,biser ket.Hevalê wî lêvên wê kiça wek benîştî dicûyt,berdan.Destê xu dana ser milî,zanî yê zifirî ye rojêt pîroz..**

*******

**Liber derê malawî turmbêl rawstand,xu jê havte der, bêy xatir xwastin,qesta mal kir.**

**Limal biçûkên wî lihîviya wî ne,gelek kar lihîviya wî ne, gelek kaxez libenda îmza wî ne,geleka pirsiyara wî kirîne.**
**_ tû likîve bûy?Eve gelek çara cihê karî pirsiyara te kirin. Tû bû naçiye karî?!**

**_ ez neşêm çu kara bikim.**

**_ dê harîkariya me birin,heker tû kar nekî.**

**_ serê min bibirin ez neşêm kar bikim.**

**Biçûkekî,şeredeva wan bidawî îna.**

**_ bab,eve gelek cara Mamustaya me daxwaza amadebûna te kir,tû bû rojekê wek babên hemûyan na êye xwandingeha min?!**
**_ min çu pê çê nabit bû hewe bikim,ma dê ême çi?**
**_ divêt her êk jihewe amadebit.Tû yan dayka min.**
**_ bila dayka te bêt,ez yê nesaxim.**
**_ divêt tû van kaxeza îmza kî..**
**_ bila dayka te îmza bikit.**
**_ divêt tû...**
**_ bes baxivin,ez çu kara nakim..**

**Daykê da bersîngê xu û jijorê bire der.**
**_ jê bigerin,yê wastiyaye,dê ête ser hişên xu.**

**Çavên biçûka man zîq heta reşatiya Daykê berze bûy.**

**Her êkî qesta jora xu kir,man hilawîstî bidavên hizrave.**

**Liser cihê xu yê nivistinê,xu dirêj kir.**

**Zanî hestê kurê xu birîndar kir,zanî dilê jina xu hêla, zanî yê bûye girê dimala xuda,zanî êdî gelek tişt pê çê nabin,zanî jiber bê loqiya wî,dê mala xu toşî gelek nexuşiya kit.**

**Dengê dergehî,hizirên wî yên kirêt,belavekirin.**
**xu diber kelexê wî yê wastiyay da dirêj kir.**

_ tû her serwerê vê malêy,tû her dê mînî bab û heval û yar ü hemû tiştên me.Ez dizanim tû yê wastiyay.

lê bibure,biçûk wê çendê nizanin.Ev welatê nanî didite me,wê çendê nizanit.Tinê tû xu ture neke,xu ne wastîne. Ez dê hemû karên malê kim,ez dê jipêş teve çime karî. Ez dê çime xwandingeha biçûka,ez dê bihemû kara rabim.

Min nevêt tû nesax bî,min nevêt tû jimin dür kevî.

Ez bêy te najîm.
xu qolpande ser piştê,berê xu da wan çavên tijî hîvî,wî dêmê hêşta jiyan jê dizêt.

Destê xu havête nav tenga wê,kêşa ber sîngê xû, givaşte nav dilê xuda.

Piştî demekî dirêj,jinê jipşitve dergeh girt û xu havête dibin lihêfa wî ya germ ve.

_ 12 _

Spêde baş..

_....
_ bibure,ez dişêm rûnim?Ez yê nesax û wastiyay me.

Berê xu da bejna wî ya ne lêkiday.

_ tû wastiyayê çî?Hindî tû dinivî?Yan hindî tû karê reş dikî?!

_ bawer bike,ez ne dinivim ü ne karê reş dikim.

Keniyeka girêt jilêvên wê yên nazik der ket.

Neşiya xu bigirt,karê ronştinê kir..

**_ ne rone...!Min izina roniştinê ne daye te.Eve ne cihê roniştinê ye.Vê kaxezê bigire û der keve..**
**_ kaxeza çî ye?**
**_ nav ü nîşanên karekî ne.Divêt tû sobehî zûy liwî cihî amadebî, jibû kar kirinê..**
**_ tû baş dizanî,ez neşêm kar bikim.**
**_ tû jî baş dizanî,heker tû kar nekî,em dê harîkariyate birin.**

**_ lê ez yê...**

**_ bibure,min dem nîne digel te dirêj kim.Hemû tişt diwê kaxezê da dinivêsî ne.Yadî liser te dimînit.Geremke, derkeve.**
**wê şevê,heta berê spêdê,xew jê sil bû!**

**_ xu ture neke,karên dewletê bisanahî ne,tinê xu mijul kirine.**

**_ ez neşêm çu kara bikim.**

**_ tû yê zîrekî,xu bes bêxe,tû dişêy hemû kara bikî.**

**_ ez ne biçûkim!Tû min na xabînî.**

**_ bawer bike,nihu tû jitulazekî bihêz tirî.**

**_ tulaz...? Ez kirine tulaz..!**

**_ û jibabê tulaza jî bihêz tirî...**
**tijî nav çava bişkurîn bûn.**

**_ heker min tu nebaye,ez da berzebim...**
**_ heker minjî tû nebaye,ez da dîn ü har bim!**
**xu havêtine êk.Ketin diviyaneka dijwarda.**

**Wan çend demjêrên mayn bû spêdê,biramosan û viyanê ve burandin.**

**_ min negûtete!Tû jitulaza bihêz tirî?!**

**_ hilû karê min bike,da biçme karî..**
**_ iha wesa,min divêt tû yê zîrek bî.**

**_ ez neyê leş saxim.**

**_ xu mijîl bike,bikarî dê giyanê te pitir tena bit.**

**Dê mejyê te zelal bit.Kar tendirusitî ye!**

**_ bila dixtura min!**

*******

**Hevalên wî yên karî,hemû dikalin,hemû dinîve mirovin. Seqet ü kêm endamin.Fêrbûyên dermanik û kihulê ne.**

**Çu kar jikesê naêt,ew xoş mêrê hemûyane.**

*******

**_ tû dê biye serkêş ü rêberê me.Mêraniya te,zîrekiya te ya berçave.Her biriyara tû bidî,em dê bicih înin.**
**_ sopas bû hestên hewe.Em hemû birane,em hemû rêberin,ez bihewe mêr ü zîrekim.Herkes jihewe têbîniyek hebit,em dê godariyê kin.Karê me karê komêye.**

*******

**_ karê me yê evro,piştî hûn cigarên xu dikêşin ü bîrên xu vedixün.Em dê qopkên cigara liber lêva cadê rakin.**

*******

**_ karê me yê ev şeve,piştî em cagirên xu dikêşin,ça xu vedixün.Em dê xu berdine nav dilê dujminî,liber lêva cadê û lirexên sengerên dujminî,dê jimîna paqij kin,da li berê spêdê jibû hêrişa me amadebit...**

*******

**Çend carekê ew bejna bilind û wastiyay diçemande qopkekê cigarê,yan pirteka kaxezê,şevek û rojek jijiyê wî disotin.**

**Her çendekê lidur xu dizifirî,ka kes nabînit!Ka kes pê nakenit!**

**Hevalên wî,her çendekê bêhna xu didin,cigara dikêşin, vexwarinên kihulî vedixun.Dibite kenî û sohbeta wan.**

**Ew her yê bitinê ye,yê bê hevale,yê berzeye.Digel giyanê xu yê havî ye!**
**wê êvariyê,careka dî,piştî demekê dirêj hest biêşana hindek gehên leşê xu kir.Wastiyana vê carê,newek hercare,wastiyana vê carê,tameka taybet jê di êt. Taybetmendiya wê,jiber nazdariya wî ye.**

**Vê carê,hest dikit biçûkekê savaye,xu nazidar dikit bû jina xu.**

**Jin,bihemû şiyan û şarezaya xu ve,ya liber xizmeta wî rawestiyay.**

**Eve demekê dirêje,husa hest bixoşyê nekiriye.husa xu nazdar nekiriye.**

**_ leşê te sax.Te çewa kar dît?Roja te çewa bûrî?!**
**_ ez bikarî ve mirim,ez neşêm xu liserpiya bigirim.**
**_ diyare karê hewe yê bizehmet bû?!**
**_ her jispêdê heta êvarî,em liser piya dirawestiyay bûn.ü qopkên cigara liber lêva cadê kum dikirin.**

**Bişkurînê dêmê jina wî girtin,zanî nazdariya wî ne ya wastiyan ü karî ye.**
**_ malate,dê fêr bî.Tû jî xu hind ne wastîne.**
**_ madê jinü fêr bim?!**

**_ erê,Ma min ne gût,tû tulazî!Dê her liberdilê min tulaz bî.**

**_ pîrate diêt?Demê min hevt heşt gond didane ber xu, çend çiya û rê dipîvan,Heta dihatime seredana te . Jibû dîtina van çava?!**
**_ ez çucar wan roj û şeva jibîr nakim.Ez ya biwan bîrhatina dijîm!**

**_ hizar xuzyên wê jiyanê.**

**_ ka xu dirêj ke,da pişta te vemalim.**
**_ xuzî...Wek wan rojan.bivemalîna pişta min,ew êş û wastiyan vedrevîn!**
**_ ew ne bitinê jiber vemalîna piştê bû!Ew jiber hindek egerên dî bûn!**

**_ egerên çi?!**
**_ jiber viyana te bû min bu, jiber viyanate bû welatî bu, jiber baweriya te bikarê te bu...**

**_ raste..Te rast gût!Lê nihu jî min tû jigiyanê xu xoştir divêy.**

**_ ez bawer dikim,lê te giyanê xu jidil nevêt.Giyanê te yê li te bûye bela!**

**_ ewjî raste.. Weye..**
**serê xu hejand,çavên wî ketin ser êk.Wan til û destên nerm.Giyan jigehên wastiyay dizîn.Bê deng bû,xirênî jigewriya wî hat.**

**Hêdî lihêfa wî biserdada,dergeh girt,hêla dinav pêlên xewê da.**
**_ kes dengî nekit.Babê hewe yê nivisitî!**

**Biçûk hêbetî bûn,eve caraêkêye,babê wan berî wan dinivit!**

**_ da..? Dayê..?!**

**_ min gût dengî nekin!**

**Devê xu bire bin gohê dayka xu,bidengekê nizim ve.**

**_ babê me xêre?!Ma yê nesaxe?!**

**_ ne dayê,yê wastiyaye.Evro çubû karî.**
**_ kar..?!Mala xudê ava,babê me kar dikit.Tû dizanî dayê,em lixwandingehê şerim dikin,dema dibêjin babê hewe yê bê kare?!**
**_ raste kurê min,lê babê hewe yê nesaxe,û zimanê wan baş nizanit,kar bû yên wekü wî dikêmin.**
**_ ez dê sobehî bêjime hemû hevalên xu, babê min kardikit..**
**_ hişiş, bê deng bin,herin hûn jî bixwînin,da zü binivin.**
**_ hêşta zûye,nedemê nivistinê ye.**

*******

**mal bê deng bû,livîn nema,jor tarî bû,xew bû kabûsekê dirinde.**

**Bejna hevalê wî Husên,lipêşiya wî,bibû kêl.**
**_ Ma me çi gûtbû?!**
**_ me çi gûtbû?Bîra min naêt?!**
**_ Ma me ne gûtbû,em dê tola turmbêla xu likiçên pirag vekin?!**

**_ ma kiçên pirag turmbêla me dizî ye?!**

**_ ne..Lê birayên wan ya dizî.Ü em jiber wan çûbûne pirag!**

*******

**Derê jorê vekir,yê dinav xoha leşê xuda ter Bûy.**

**Neviya jixewa şîrîn hişiyar bikit,jor bû hêla,çû dijora biçûkave,liber tenişta kiça xu nivist.**

*******

**_ karê xu baş bike,eve ne wek her care,eve xwîndariye, tol vekirine.**

**_ te carekê direwek ya limin kirî!**
**_ direwa çi?Ez direwa lidiniyayê hemûyê bikim.Ez lite nakim?!**
**_ te kûtibû,dê te bime pirag licihekî,tû nizanî kî jikê ciwantire.**
**_ iha min evro ew libere.**
**_ iha ez jî jidil amademe.**

**Li cihekî dûr jibajêrî,liwarekê bê deng,bê mirov, lixaniyekê bitinê.bûne mêvan.**

**Dergeh vebû,dû çavên şîn,wekü yên pişîka,dû lêvên sor ü tijî bişkurîn,pirçeka zer,bejneka bilind.Pêşwaziya wan kir.**

**_ keremkin..**
**çavên wî jê venebûn,lipişt xu dizifirî,neşiya biçite jor.**

**_ were,ew kirêta hemûyan.**
**lijoreka mezin,pitir jideh kiçên bijare.Her weku jibû berîkana ciwanên cîhanê helbijartîn,diamadene.**

**Hemû jipêşve rabûn,her êkê,wek xu pêşwaziya wan kir.**

**Lidur xu zifirî,berê xu da wê jora ciwan û lêkday.wan kiçên jibaxçên biheştê înayn,hest bimirinê kir,**

**_ ma ez mirî me?!**

**_ nene, tû yê saxî.**

**_ pa eve çi huriyên biheştê ne?!**
**_ eve biheşta ser diniyayêye.**

**_ Mela Elî digût,tinê biheşt ya libin diniyayê.**

**_ wî vêrê ne dîtiye,lewa we dibêjit.**

**_ digût,libehştê bitinê hurî hene,û her biheştiyekî,dê çil hurî gehinê..**
**_ eve biheşta mine,heker te bivêt,dê sed huriya bû te înim?!**
**_ biheşta te hosa ya xuşe.Pa cehinema te ya çewa ye?!**
**_ licîhana min,cehnem nîne,tinê biheşte ü biheşte,ü biheşt!**

**_ tû xuda bendekê dil nermî..**
**_ dê,heker tû rast yê şarezay,dê bêjiye min kî jihemûyan ciwan tire?!**
**çavên lê zîq bûn.Hemû bejin,hemû pirç, hemû dêm. Dûsê carî dimejyê xuda tumar kirin.Hindî hizirên xu cemandin.Neşiya biriyara xu bidit!**
**_ te rast gût,te belêna xu bicih îna,ez neşêm bê bextyê bikim,ez neşêm çu biriyara bidim.**

**_ tû dişêy bû xu êkê jê bigirî?**
**_ ne bawer bike,ez yê mayme heyrî.**
**_ were jor,ma dê liber degehî bî?**
**duwa milên wî girtin,kirine dinîva xuda.Bendujkên wî ü yên xu pêkve vekirin.**

**Xoha leşê wî gerim bû,livîna endamên leşê wî zêde bûn.Rûs kirin,dengê mezîkê bilind kirin,xu jî rûs kirin.**

**Nêr bû,har bû,kete dişerê evînê da.Pitir jinîva wan huriya,ketine dişerê man ü nemanê da liser sîngê wî yê lawaz!**

**Deng jê hat,Balîvk kivaşte dinav sîngê xuda.**

**Bû gulmçkeka befirê,dinav destên wan kiça da.**

**Bû şere befira wan.yarî pê kirin,dinav dest û hestên wan yên nazik da heliya.**

**Xoha leşê wî kel bû,nêratiya wî har bû.**

**Diviya bikite hewar,wan kabusên leş sipî ü nazik,deng lê mit kirin.**

**Heçiya gulmça befirê dikete didestî da,dilêvên xu yên şirîn,dihusî û dinav memkên xu digivaşt û difirande nav pirça hevala xu!**

**Kete zifiruka leşên nazik da,her yê dihelyêt.Her kenî û yariya gulmçanê ya dijwar dibit.**

**Ew pirtên vedipeşîn.wê kiça jihemûyan biçûktir,lêkdan, ü kirine gulmçkeka biçûk,ü bûxu bidizîve bire joreka bitinê,liser sîngê xu yê çarde biharî givaşt.**

**Neşiya xu dibin wî kabûsê giran ve bigirt.Hest bihelînana giyanê xu kir.Bihemû hêza xu kire hewar.Rabû ser cihê xu,bêhin teng û wastiyay.**

**Dest da pêsîra xu,ya ter bûy.Liser milê xu zifirî,cihê jina wî yê valaye.Gazî girê,kesê bersiv neda,mal lihîvya wê, gîru bû.Firek liwê ava libin serê xuda.Rabû lijorên dî geriya . Lihêf biser biçûkên hilêvirî dada.**

**Dijorekê ve,jina wî ya birex kiça xuve xu kiriye qormik. Lêvên wê yên hişik bûyn.**

**Zanî,ew jî êxsîra kabosekê kirête.**

**Destê xu da pirça wê,liser rûyên wê veda.Dûsê cara rûyên wê vemalîn,jixewa giran,hişiyar nebû.**

**Diviya liber tenişta wê binivit.Cih nebû,diviya hişiyar bikit, dil neda.Diviya hindek çîrok û pêkenîna bû vegêrt. Diviya daxwaza lêburînê jê bixwazit.Diviya liser sîngê wê yê tijî tenahî ü hîvî bikite girî.**

**Çu pê çê nebû.Gelek lihindav serî rawestiya.Gelek bîrhatin,hatine bîrê,digel xoşî ü ne xoşiya firî,geriya,jiya.**

*******

**_ ez dizanim te yarek hebû!Digûtin gelek ya ciwan û berketî bû.Cihê wê biheşt bit.Hîvîdarim ez bişêm hindek jiviyana wê didilê te da peyda bikim!**

**_ we ne bêje.Tû nihu licihê xûy didilê min da.Ew çu, viyana wê digel wê çu.Her tiştekî wê bûne bîrhatin.Ez goneha te nakime stoyê xu.**

**_ te ez weku wê divêm?!**

**_ jiwê pitir.Min ew her jidûr didît,ü hindek cara bidizîve. Hêşta tinê ya dinavbere meda,viyan bû.Lê tû..Nihu tû ya dinav dilê min da dijî.Tû beşekê giyanê minî...**

**_ eve xuştirîn peyvn min dijiyana xuda guh lê dibin.**

**_ dê peyvên xoştir goh lê bî!**

**_ wek çi? Ez bawernakim,peyvên xoştir hebin?!**

**_ wek peyva dadê...**

**_ dadê...?!Tû bêjî dê carekê min goh livê peyvê bit?!**

**_ heker te bivêt da vê gavê karê wê peyvê bikin!**

**_ çewa?!**

**_ iha hosa...**
**xu havêtê,liser wî giyayê biharê jorda diwê nihala tijî giya ü kulîlik çûne xwar,dinav pêlên giyay da berze bûn,tinê keniya wan biser giyay diket.**

**Xoh bibû pêlên deriyayeka dijoar.**

**Nivîn,daralînekeka asêne.Kabos,her yê giran dibit,xew her ya dijwar bidit.Endamên leşê wê her yên sist dibin.**

**Berevanî jê naêt,hewarawên wê biser nakevin.**

**Wek wênegirekê şareza,ma lihindav serî.Zanî ya dinav destên hindek dirinda da,zanî şer pê çê nabit,zanî çu nemaye dê xendqit.**

**Destê xu limilî da û hejand.Şer dijwar tir bû,ageh jiçu nema.Her milê wê hejand,her şer dijwar dibû.**

**Biherdû desta milên wê hejandin.Bi hemû hêza xu kire hewar ü rast rabû ser cihê xu.**

**Jor,rûn kir,biçûk jixew hişiyar bûn.Hate ser hişên xu, hindek ayat xwandin,hindek av vexwar..**

**_ te xêre?**

**_ ew çi bû?Ez likîveme?Tû bisilametî?**

**_ çunîne,wesa diyare xewin bû.Xewneka kirêt.**

**_ kirêt û bes...!Çunemabû ez şêt kirîm.**
**_ bêhna xu vede.Hilû da biçine jora xu.**

**_ erê..Min ev biçûke jî bizdandin.**
**berê xu da kiça xu ya zer bûy jitirsan.**

**_ binive kiça min,çu nîne.ne tirse..**
**daber sîngê xu û givaşt,bêhna wê hat,dilê wê kêmtir xu qota.**

**_ texêre?Vê nîv şevê bû tû yê hişiyarî?!**

**Kenî..Jidil kenî,xwîn lihindek gehên dilê wî careka dî geriyan.**

**_ eve demekê dirêje,tû hosa şirîn ü jidil nekenî?Xêre, xudê xêr kit?**

**_ xêre... Min jî wek te xewnek dîtibû.**

**_ ew çewa?**
**_ lê ne wek xewna te ya kirêt bû!**

**_ mala xudê ava,kafir xewnên wesa ne bînin.Ê? Te çi dît, wesa dilê te xoş kir,heta tû wê kenya ez gelek jê xerîb bûy,berdî?**

**_ ez şerm dikim bêjim!**
**_ şerim..?!Xewnên şerimîn jî hene?**

**Kenya wî jidil hat.**

**_ eve pitir jisîh salaye,min xewnên hosa nedîtîne!**
**_ wey babû!Ew çi xewne?Te bû min kire mereq?Dê ka bêje?**

**Destê wê kire pêsîra xu.**
**_ eve çî ye?!**

**Devê xu bire bin gohî..**

**_ şeytan yê hatî ye min!**
**herdû jidil kenîn,keniya wan tijî jor bû..**

**_ bixodê tû linik min nanivî,heta tû serê xu neşoy.**

**_ wila tû heqî.Eve ez çûm serê xu bişom.Lê te xewna xu bû min ne gût?**
**_ te jî xewna xu bidirusitî negûtî ye,here serê xu bişo,û were , em dê çîrokên xu kine ser vî textî !**
**ma bitinê dijorve,hêşta tijî leşê wê vayrosa tirsê ye.Jor bê deng bû,dîwar bidev û didan ketin.**

**Banê jorê bû zikê firokeka semtî.Agir jê barî.Textê wê bû gorstan.inkîr û minkîr jibin derketin.**

**Diviya bikite hewar.Tirsiya,diviya birevit,pêstîrkê girt.**

**Hişik dicihda ma,çavên zîq,devê beş,bêhna çik,livîn jê nehat.**

**Dengê zelamê wê,ji serşoyê,jinav wan devên xwîn jê dibarî qortal kir.**
**_ dilê min...Bibure.min xaweliya xu ya jibîr kirî.Dê şêy bû min xaweliyekê înî?**
**ew dirinde hemû revîn,xu veşartin.Hişên wê kum bûn.Xu jitextî havête xwar,bihemû şiyana xu kire xar.Qesta serşoyê kir.Bicilkên nivistinê ve,xu havête mêrê xu yê rûs dibin şirka avê da...**
**mêrî zanî neya liser hişên xu.**

**_ te xêre?**

**Xu dinav sîngê wî da pitir şidand,leşê wê jiserî heta binî dilerizî.**
**_ wesa diyare,tû ya jimin xerîb bûy?Dê van cilka bêxe, da pêk ve serê xu bişûn.Eve demekê dirêje,me pêkve serê xu ne şûştiye.**

**Serê xubilind kir,tijî navçavên mêrî,bişurîn Bû.**

**Neviya wî jî bitirsînit.**

**Mêrî jî her mijûl dikir,da tirsê jibîr bikit.**

**Wek dû evîndara,kitkite,cilkên wê jiber kirin.Pêkve dibin şirka avê da gohnêliya xu wê nîv şevê kirin.**

**Xu berdane dinav birka tijî avda ü xav bûn.**

**Tirs ü xew û kabos,digel pêlên avê çûne xwar.**

**Ew dirindên kirêt,bûne rovên pirsî.Jiber şêrê evînê revîn ü xu veşartin.**

**Diviya jinav wê birka avê derkevit.Nehêla,newêriya. Ditirsiya,hêşta ew dirinde dijora nivistinê da lihîviya wê bin.**

**_ te nevêt em jivê avê derkevin?**
**_ ne... Em dê têda bin,heta sipêdê.**

**_ dê nihu biçûkek jixew rabit,û ête dest avê.Dê me hosa bînit.**
**_ bila...Mae jiçi çêbûyne?!**
**_ erê.. Lê...?**
**_ hişiş...Ez hosa dikuka xuşyê da jîm!**

**_ ez jî...Lê bû me dest nadit.**

**_ şeve,biçûk dinivistîne.**
**_ xozî te ya dilê xu bû min gûtba?Kate xêre?!**
**_ bîra min ne îne...**

**_ divêt tû bû min bêjî,da dilê te tena bit.**

**_ bila...Paşî, jimin bigere,da têr te hembês kim.**
**_ te ez xwarim,min girê te nîne.**
**_ eve jidohî heta evro,tû sê cara bûye zava.Ez bigirim yan tû?!**
**_ mate negût,tû hêşta tolazî?**
**_ erê û dê her liber dilê min tolaz mînî.**

**Gelek wesa man,gelek hizir kirin,dinav gelek bîrhatina da jiyan.**

**Zanî ya liser sîngê wî yê rûs,ü dinav birka avê da dixew çûy.Zanî ya ketiye dinav pêlên xeweka giranda.Dil neda hişiyar kit,dil neda xu bi livînit.Av sar bû,diniya rûn bû.**

**Hest kir,yê bûye gencekê bîst salî.Lê qeda birojê bikevin,çu nemaye dê serê xu hildit,dê biçûkên wan hişiyar kit,dê demê karê wî êt.**

**Dengê xewê hêşta jikuratiya dilê wê dihat.**

**Dûsê cara hewil da hişiyar kit.Hişiyar nebû.**

**Dengê zenga demjimêra biçûka herdû êxistine deravê lezê.Karê xu kirin,û birutî ve qesta jora xu kirin.**

**Berî biçûkek derê serşuwê lê vekit.**

**_ em nivistbûn?**

**_ tû nivistbûy.**

**_ û tû?!**
**_ ez jivanê te bûm.**
**_ weku berê,lidemê şoreşê?!**

**_ erê,weku wî demî.Tijî durên me dujmnin..**
**keniya wê,ya mê bû.Xu havête nav sîngê wî.**

**_ te bû ez hişiyar nekirim?!**
**_ min dil neda..**
**_ te dil neda..?Yan te pê xoş bû?!**

**_ herdû.**
**_ heker êk jibçûka hatiba serşûyê?**
**_ da bêjit,dayk ü babên me yên bûyne bûk ü zava.**

**Keniya wan tirs jijora wan dûr kir, jiyan hate cihê tirsê.Tijî mala wan deng û sohbet bû.**

**Biçûk jixew rabûn,karê xukirin.Xanî bigiyan ket.**

**Biçûka hest kir,tiştek nû limal peyda bûye?**

**_ eve em çûn, bixatira hewe.**

**_ bixêrbçin,gohê hewe liêk bit!Gîro ne bin!**
**nediviya evro jimal derkevit,nediviya bimînte bitinê.**
**_ ü tû? Matû naçî ye karî?!**
**_ evro ez te nahêlim bitinê,ez dê xu nesax kim.**
**_ çu roja wek evro ez jite xerîb nebûyme!Min nevêt tû jirex min dûr kevî.**
**_ ez jite dûr nakevim,pişt rast be.Dê te evro mêvan kim, karê xubke,em dê çine derê,çine geriyanê linav bajêrî.**
**_ ev çi xoş hizir bû?Tû heta nihu likîve bûy?!**
**_ ez hêşta jidayk nebibûm.**

**_ dê hilû karê xu bike.biçûk çû piştî nîvro êne mal.**

**_ erê.. Em dê evro bidilê xu kevin.**

**_ evro bitinê...?Yan dê hindek rojên dî jî hebin?!**
**_ soz bit jievro pêve rojên me hemû xoşî bin.**

**_ maç jime kême?Divêt em rojên xoş nû kine ve.**

_ 14 _

_ spêde baş..

_ geremke..?

_ min divêt Mamustay bibînim.

_ te jivanek heye?

_ berî çend heyveka,wî gûtbû min,tû dişêy her demê te bivêt,seredana min bikî!
_ bibure,eve ne cihê seredana ye.Eve cihê karî ye tû dişêy limal biçiye seredana wî.
_ eve deh cara ez çûm,dibêjin ne limale.
_ ankû,nevêt te bibînit!

_ nene,bawer bike,em gelek hevalên êk bûn.

_ hevalên êk...?!

Keniya wî serinca mêvanên lihîviya Mamustay rakêşa.

Gelekên dî jî,tijî ser ü çavên wan kenî û bişkurîn bû.

_ erê..Bawer bike,gelek şeva em pêkve libin berekî nivistîne,ü gelek cara me nan û pîvas pêgve xwarîye.

Kenî tijî pirsgehê bû,kabray şerm kir,devê xu bire bin gohê mêvanê giran.
_ eve ne cihê yarî û sohbeta ye!Min demê van sohbetên çivêl nîne.Keremke derkeve,mêvanên piyanî yên li vêrê!
_ lê...?
dengê xu bilind tir lê kir.

_ derkeve.
_ bes navê min bide Mamustay,ew dê jipêş min ve ête derê.

_ heker tû ne derkevî!Dê gazî zêrevana kim,date bikine derê..

***

_ eve tû carekadî hatî?
_ divêt ez Mamustay bibînim.
_ te çi jiMamustay divêt?
_ kaxezên min yên berze bûyn.
_ ez bawernakim Mamustay dîtbin!

**_ ez jî bawernakim.Lê ew min diniyast.Ew dizanit ez kîme.Ew dişêt harî min bikit.**
**_ tû dişêy hindek kaxezên dî dirust bikî..**
**_ dê salek pê çit.**
**_ bila.Matû lezê çî?!**
**_ ez xudan biçûk û karim.**
**_ hewe kew jî divêt,û xew jî..**
**_ tinê me mavê xu divêt,bihayê wan rojên jijiyê me burîn.**

**_ çu tişt bû ewên liderê nîne.**

**_ berê jî digûtin,çu tişt bû ewên kes û karên wan liderê nîne!**

**_ nuke te çi divêt?**
**_ tinê bêje Mamustay,ez yê livêrê û...**

**_ eve min deh cara gûtê..**
**_ ê..?!**

**_ demê te nîne.**
**_ demê min nîne?!**
**_ erê..**
**tijî devî kenî bû,serê xu hejand.**

**_ lirojên tengaviya,demê mala min bû wî vekirî,demê min hebû!Dema min nan jidevê biçûkên xu dîîna der û dikire didevê wî da!Demê min hebû! Demê heta sipêdê ew dinivist û min zêrevanî lê dikir.Hingê demê min hebû...!**

**_ çê..?! Tû çi dibêjî..?!**

**_ çine... Çine...!**

*****

**_ spêde baş.**

**_ baştir.. Keremke..?**

**_ bibure,min diviya silavekê bikime Mamustay.**
**_ silavekê..?!Silavate gehişt.**
**_ ew çewa?!**
**_ belê...Silava te gehişt,û xudê digel te bit.**
**_ min divêt bibînim!**
**_ te divêt bibînî?Ya silavekê bikyê?!**
**_ ma dê çewa silav kimê,bêy bibînim?!**
**_ bibure, mêvan yên heyn.**
**_ tinê navê min bêjê.ew dê ête derê lipêşiya min.**

**Kenî tijî golanê bû.**
**_ wey babû,tû gelek yê jixu razî?**
**_ em hevalên êk bûn.**

**_ libaxçê zaroya?!Yan lizankwyê?!**
**keniyeka bilind jihemû zêrevana biserket.**
**_ hûn baş dizanin,Mamustay,ne baxçê zaroya dîtiye.Û ne zanku. Em....!**
**_ bes...Wesa diyare tû biezmanê xoş jivêrê naçî?!**

**_ wesa diyare,ez dê vî welatî hemûyê bû hewe hêlim!**
**_ dürkeve... Em te livê gulanê ne bînin...**

*****

**_ bibure heval,ez çi bikim?!**
**_ ez nizanim ka te çi divêt!**
**_ ew salên jijiyê min bûrîn?Ew birînên lileşê min?Ew nexoşî?Ew xebat?Min nevêt hinda bibin!**
**_ pirsiyara mavê xu bike.**
**_ pirsiyara kê bikim?!**
**_ hevalên xu.**
**_ hevalên min ewên kar pê çê dibin,yên bûyne ji (meçêtir)kes nabînit!Ewên wek min çu pê çê nabit!**
**_ binivêse..Bihinêre cihên taybet.**
**_ kesê demê xwandina nama nîne,dibêjin tû yê ji derve.Çû tişt bû wan kesên jiderve nînin.**
**_ raste.Were bizifire.**
**_ ew çewa?!Lidemê şoreşê digûtine kes û karên me çû tişt bû hewe nînin,hûn xo firoşin mirovên hewe yên liderve!**

**Nihu her wê çikyê didine navçavên me.Kes nabêjit jiber çi em lidevene?!Em jiber kê lidervene?!Madê heta kengî mînine liderve?!Kes van pirsiyara nakit.Kesê nevêt mirov jî van pirsiyara jê bikit!**
**_ bibure,eve hûye,biriyar ya linik te.**

**_ ez ne dixema wan salanim,ez ne dixuma jiyê xome. Min jibû xizmeta welatê xu sotîne.Lê ez dixema biçûkên xume,min jihemû tişta kirin.Jiwelat û kes ükara.Û liwêrê jê min nehêlat wek wan vêrbibin.**

**_ bizifire.Hêşta te biçûkên xujî jidest ne dayn!**
**_ min çu nîne pê bijîm,dê livêrê jî jidest min derkevin.**

**_ te serê min lê kire êş.Bibure divêt ez biçim...**

**_ 15 _**

**_ belê?Keremke?**
**_ êvar baş..Hûn çewanin?Başin?**
**_ sopas kak Husên.Hûn çewanin?Biçûk çewanin?**

**_ zor sopas.Em gelek dibaşin.Bibure,kak Hesen limale?**

**_ belê, yê limal. Lê...**

**_ çî ye? Xêre? Neyê nesax bit?!**
**_ gelek jinesaxyê xirab tire!**

**_ te ez tirsandim!Wî xêre?!Çi buye?!**
**_ bibure kak Husên.Tû hevalê wî yê nêzîkî,lewa min tû pê hesandî.Hîviye bila nezanit te sohbeta jimin ya zanî.**

**_ ne tirse,ez pênahesînim.Lê ka bêje wî çî ye?!Ez dê evro litana wî êm!**
**_ nene,pêtivî nakit tû xu biwastînî.Tinê hindek gazinda jê bike.Bila biçite derê,bila bigerit,bila kar bikit.Jikuna xanî dernakevit.**
**_ hêşta te negûtî ye min ka wî çî ye?!**
**_ piştî çûye welatî,kesê çu püte pê nekir.Kesê harî nekir. Hevalên wî yên mezin bûyn.Neşiya kesê bibînit.Karên wî mane birêve.**

**Hemû bûne kul û kuvan,liser dilê wî.Yê ketî ye nîva malê wek dîn ü hara.**

**Kes neşên digel baxivit.Her yê diwastyêt her yê ture dibit.Ne dinivit,ne dixot,ne diçite derê.Gohê xu na dite kesê.**
**_ ka bide min da digel baxivim.**
**_ niza ka dê razî bit yan ne?!**
**_ bêjê Husên,dê razî bit.**
**_ bila.. Hîviye tû bişêy razî kî!**
**_ dê razî kim,û dê wî kime mirov!**

**Telefun bire wê jora dergehê wê lixu girtî ü nahêlit kes biçite jor.**
**_ Hesen..?Dilê min,eve Husên yê liser telefunê.Divêt digel te baxivit?!**
**navê Husên,wek aveka tezî,leşê wî gezand,hizirên wî geş kirin.Qesta dergehî kir,xu havête telefunê...**
**_ helû?**
**_ ha....?Emê gozê,te xêre?Tû dîsan çûye diçeperî da û bernadî?!**
**_ Husên...?Çi hale? Biçûk çewanin?**
**_ bûte bêjim!**

**_ ê...?!**
**_ kesê goh lime nîne?!**
**_ ne... Hema baxive!**

**_ min biçûk yên hinartîne welatî.Ez bitinê yê limal.Were harî min...**
**_ harî te...?´harî te çi bikim?!**
**_ ma te divêt bikime ser berkê?!**
**_ dê taze baxive,ez bixu yê bûyme nîve mirov!**
**_ were, dê bîye mirov û nîv...**

**_ dê ka bêje,bême çi?**
**_ were..bişev dûne,û biroj dûne..**
**_ ma eve tû jiya xu venabî?**
**_ ma tû jê ve bûy?!**
**_ ez yê jihemû tişta bûym.**
**_ ez bawer nakim!**
**_ bawer bike...**
**_ pa eve çî ye? Tû yê ketîye xilwê?!**
**_ ez tureyê biçûkên xu me.**
**_ malê ne bû biçûkê baş bike,û neyê xirab.**
**_ ez bû paşeroja xu dikim,eve bihayê wastiyana mine. Kes çu...**
**_ iha Ma min negût?Tû dest jiya xu bernadî?!**

**Were,ez dê bihayê wastiyana te livêrê kime nîva destê te!**
**_ ez her dibêjim,herweku min xebat bû tekirî.**
**_ ez jî kurê wî welatî me,ewê te xebat bû kirî.**
**_ bela xu jimin veke.**
**_ soz bit tû ne êy,ez dûsêyeka bidime bidûyv xu,û bême mala te.**

**_ ez bawer dikim,tû wê bikî!**
**_ min gût,soz bit.Ez we bikim.**
**_ ez dê êm,lê niza biçi hêcet bêm?!**
**_ hêcet liser min.**
**_ dê çi hêcet girî?**
**_ dê digel min kar kî..Ez pêtivî şovêrekî me!**
**_ tû bela xodêy.**
**_ tû jî bela serê minî.**
**_ sobe,heta dosube dê...**
**_ ne,sipêdê karê xu bike,û were.Ka dayka biçûka bide min,da direweka mezin bû bikim.Heta izna te bidit.**
**keniya wî jidil hat.Tijî dêmê jina wî bişkurîn bû.**

**_ heta sobehî..**
**_ heta sobehî..**

*******

**_ tû dê çî?**

**_ divêt ez biçim!**
**_ lê demê bêhinvedana te ye?!**
**_ lişoreşê,bêhinvedan nîne!**
**_ me tû têr ne dîtî!**
**_ dê çim,da tû têr min bibînî!**
**_ dê xu dûsê roja gîro bike.**

**_ her demjmêrek geleke.Dujminî karê xu baş yê kirî. Dibêjin dê bihêrişeka berfireh rabit.**

**_ xodê digel hewe bit.**
**_ bibure,min diviya liber tenişta te bim,lê welat fer tire!**
**_ ez gorî te û welatî bim!**
**_ heta bêhinvedaneka dî..**
**_ heta serketineka dî..**

**Beref wê betena lipişta gondî da rê.Hizar awaz ü hîvî di serî da dîlan dikirin.Her çend pêngaveka,lipişt xu dizifirî, destê xu bû wê bilind dikir!**
**bilewendiya xu silava wî vedigêra.Rondik jî çava bûn.**

**Ew pilan û ew hîvyên didilî da kum bûyn.Heta hatina wî, hemû bûne xewn, hêdî hêdî, berze bûn.**

*****

**Dengê bilindbûya tirênê,jikevlujankê mêranyê îna der.**

**Dipencera tirênê ra,navê bajêrê hevalê xu Husên dît.**
**bilez qesta dergehî kir.**

**Westgeh pire jimirovan.Jiyan dikuka xu daye.**

**Dinav pêlên mirovada bezebû.Berev senterê bajêrî çû. Liwî cihê jivan hey digel hevalê xu Husên.rawestiya.**

**Seruberê wî yê nesaxa ye,çil ü karê wî yê gerokaye. Dilê wî yê şêraye!**
**destekî milê wî girt.**

**Lipişt xu bitirs zifirî.Zanî ev xwîne,neya biyanî ye!Zanî ev seruçave,ne dibiyanî ne!**
**xudanê destî,xu havête dinav sîngê wî da,û givaşt.**
**_ tû çewanî kak Hesen?Halê te?Jiyanate?**
**nezanî dê çi bersiv dit!Nezanî eve kiye?**

**Çarekadî,çavên wan ketin beramberî êk.Çavzilkanê digel kirin!**
**_ herweku tû min naniyasî?!**
**dengê wî diserî da deng vedida.Gehên mejiyê wî har kirin..**

*****

**_ Ez dê çim,tû zêrevanyê bike.**
**_ ne,ez dê çim û te ageh jimin hebit!**
**_ bawer bike,ez dê çim.**

**_ bigora şehîda ez dê çim,lê hîviye heker şehîd bûm, leşê min nehêline dinav dujminî da...**

**Agir,ji erd û esmana dibart,lihemû rexa top û moşekin.**

**Liser zikî çû,xu nêzîkî bingehê dujmnî kir.Narinçokek havête dinav koma zêrevanada.Agir tijî bingehî bû, hemûya pêgve,wek pilan kirî,hêriş kire bingehî.**

**Karê xu encam dan,zifirîn cihên xw yên berê.**

**_ destê hewe dixoş bin,karekê serkevtî bû.**
**_ destên heval lawîn dixoş bin!**

**_ Kak lawîn?Lawîn..?**

**_ heval lawîn..?Lawîn? Katû..?!**

**Dengê nalêna wî jişînwarên dujminî dihat.**
**_ wesa diyar yê birîndare?!**
**_ divêt em litana wî biçin!**
**_ dujminî cih yê girtî!**

**_ biher rengê hebit.Divêt em jinav destên dujminî rizgar bikin.**
**_ çu rê naçinê.Em neşên hevala toş bikin.Divêt em dür kevin!**
**_ eve ez çûm,tinê pişta min bernedin.**
**_ raweste,kak Hesen,çu mêranî pênevêt.Dujmin yê har bûy...**
**_ gohê hewe limin bit.**
**xu berda dinav wan tiraş ü dar ü bera da.Libin agirbarana top û moşekan.Heta gehştiye ser kelexê nîv mirî..**

**_ lawîn...?Lawîn..? Tû yê saxî?**
**_ erê...Birîna min dijware.Ez neşêm xu liser piya bigirim.**

**_ ne tirse,were pişta min,xu bimilên minve bigire.**

**Lê hişiyar be.Dujmin yê nêzîke...**
**_ ez neşêm çu berevanyê bikim.**
**_ tinê xu liser pişta min bigire,heta em bigehine hevala.**
**diniya têkda agire,dujmin yê bûye gorgekê har,leqa liçiya didit.Ew betena hinda asê ü bilind,da bersîngê xu. Ew kelexê nîv mirî,biçekên xuve liser piştê.Liserê petenê, dû heval hatine pêşiya wan.Libin berekî bêhna xu vedan.**

**_ her bijî,te serê me bilind kir.**

**_ divêt em dür kevin,lezê bikin.**
**_ tû here,gera me ye,em dê hilgirin.**

**Lipişt xu zifirî,gelî tijî agire.**

*****

**Liber sîngê wî rawestiya..**

**_ çiye..?Wesa diyare te ez ne niyasîm?**

**Ez pîr bûyme?Yan tû?!**

**_ belê,min tû niyasî kak lawîn!Tû çewanî?Başî?**
**_ erê,kak Hesen.Ez başim.Sopas.Lê tû vêrê?!Vêrê ü tû?!**
**_ diniyaye..Pêlek bime ket,em livêrê kirine der.Ü tû?Tû çewa hatîye vara?!**
**_ eve hosa bisanahî na ête gûtin!Divêt te mêvan kim. Da em bidilê xu hemû sohbeta bikin.Ez gelek yê jite xerîb bûyim.**
**_ bibure,ez mêvanê hevalekî me.Nihu yê lihîviya min.**
**_ ez te bisanahî bernadim.Ez liesmana lite digerim,nihu tû liber destên minî...**
**_ ez nizanim ka dê şêm te bînim yan ne?!**
**_ divêt her te bibînim,da wê qenciya te liser xu sist kim.**
**_ qenciya çi?!**
**_ te jibîr kiriye?Te giyanê min yê jinav destên dujmina rizgarkirî.**

**_ ew ne qencî bû.Ew erkê min bû!**

**_ liser hindê ra,ez te hosa bisanahî bernadim!**
**_ carê da hevalê min bêt!Ka wî çi libere?!Kadê me dem hebit?!**
**_ eve jimara telefuna mine.Ez lihîviya dengê teme.Gîro nebe!**
**_ dê hemû hewla dim,em pêkve rûnin.**
**_ heta hevalê te bêt,bû min baxive.Behsê xu bike. Rewşa te çewaye?Jin û biçûk tehene?Mal ü halên te likîvene?Çewa dijî?Hizar hizar pirsiyar min yên heyn?!**
**_ hê... Hê.Sohbeta min ya kür ü dûre!Dê serête lê bite êş.Hema jê bigere.Tû behsê xu bike.Te jin û biçûk hene? Tû çewa dijî?**

**_ erê,min kiçeka ros ya mar kirî.Û min dû biçûk yên heyin.**

**_ tû çewa dijiyana xuda yê serketî?!**
**_ kes jijiyana xu yê razî nîne.Em hemû yên hilawîstî ne. Em yên lihîviya mirinê!**
**_ te ne libere bizifirî?**

**_ ew hîviya me hemûyane.Lê paşeroj ya berzeye.Yan tû we nabêjî?!**
**_ dibit.. Jibû ewên wek me,em jiherdû laya bûn.**

**_ raste,em jidêr û mizgevta bûn.Em neşên wek van bijîn. Û em neşên bizifirin..**
**_ erê. Mirin bila bixêr bêt.**
**_ diyare tûjî wek min gelek yê wastiyay?!**
**keniya çend tolaza,sohbeta wan verevand.**

**_ diniya bû wan pîroz bit.**
**_ welat,welatê wane.Çu jê kêm nîne.**
**_ ax... Welat!**
**_ erê hizar cara... Ax welat...**

_ 16 _

_ bibure mamusta,ez jidîtin û sohbeta te têrnabim.Lê min divêt bêjim,matû naçiye malaxu?Pirsiyara jin û biçûkên xu nakî?Wesa diyare tû yê jimal silî?!
_ nene,ez yê jihemû tişta hatîme şûştin.Kes silbûnê jî digel min nakit.
_ we nîne! Hêşta tû yê liser xu û gencî!
_ min çu pê çê nabit bû mala xu bikim.
_ dîtina te bû wan geleke.
_ biçûkên min yên mezin bûyn.Êdî ageh jimin nîne.
_ û dayka wan?!
_ dayka wan xatûne.Kiça dayk û Babane.Heker ew neba,ez da har ü dîn bim!
_ hema jiber xatira wê,bizifire nav biçûkên xu.Da sebra wê jî bite bêt.Em yên lixerîbiya.
_ sebra kesê bimin naêt.
_ nene,wene bêje.Heker ez te çend,rojeka nebînim.Dê lite germ.
_ malate ava.Tinê tû yê bû min livê diniyayê may.
_ lê bûre,min hindekên dî yên heyn,divêt ez bû wan bim...

***

_ helû?
_ belê keremke?
_ Mamusta limale?
_ nexêr,limal nîne.
_ dê kengî êt?
_ ez nizanim,demên wî ne didiyarin.
_ diyare yê çûye welatî?
_ nexêr, yê...

_ hîvî ye,heker hat silava lê bike.

***

_ dadê ka babê me?
_ babê hewe yê çûye nik hevalekê xu.
_ ma na ête mal?
_ dê êt, lê heta bêt.

**_ eve demekê dirêje jimal çûy.**
**_ te çi jê divêt?**
**_ Mamusta min divêt wî bibînit.**
**_ ez dê êm ka wê çi divêt?!**
**_ lê min diviya babû bêt!**
**_ min jî divêt bêt... Lê...?!**

*******

**Çi aqilê te jivê şevê birî?!**
**_ bihizar şeva bû.**
**_ dê şevên hosa her hebin.**

**_ Ma me çi maye jivan şeva pêve?!**
**_ şevekadî liser te ye.Xu jiber ne havêje!**

**_ bawer bike,berûka min weku nîva destê te ye..**
**_ madê bûte hosa heta kengî çite serî?**
**_ liser min binivêsin.**
**_ eve saleke em dinivêsin. Te ya xu ker kirî !**
**_ dê hemûya liser êk dim.Û sala bêt liser milên mine.**
**_ keru nemire bihare,heta şîn bit qîvare,heta likerî bû bihar,kuriya kerî bû dar...**
**_ nene,ez nahêlim kuriya hewe bibite dar.Dê van roja zifirme mal.Ka çi lêk daye.Dê bû hewe înim.Hêşta kuriya heweya nerm.**

*******

**_ bira,hevalên me xu pê badan.Herkesê zifirî,kirine tiştek.Pare û parçên erdî,ü turmbêl.Em livara çi dikin?!**
**_ ez xudan biçûkim,ez neşêm jixwandingehên wan bikim,û ez neşêm bitinê jî bizifirim.**

**_ pa gazinda neke.**

**_ hinde,min biriyar da,hemû tişta jibîr bikim.**

**Welat,kes ü kar,xebat.Her tiştê destê min negehitê.Dê livêrê jîm ü dê livêrê mirim.**
**_ em çucar neşên wek van bijîn.**
**_ em neşên bizifirin jî.Em dê wek xu jîn.**

**_ em dê mînine hilawîstî.**
**_ jiyana me hemyê,em dihilawîstî ne.Em yên lihîviya firiyê gay.**

**_ erê..Lihîviya mirinê.**

*****

**_ kurê min,ev kaxeze ya çî ye?Jikîve hatî ye?**
**_ eve kaxeza daêra karî ye!Bû babê min ya hatî.**

**_ ê..? Ka bixwîne.Çi gûtîne?!**
**_ dibêjin,me harîkariya te biriye.Jiber tû liwî jivanê me bû te diyar kirî amadene bûy.Û eve çend kar me bûte dîtin, tû nakî...**
**_ iha ew ya jime kêm bû!Harîkariya wî jî hate birîn.Em dê çewa jîn?!**
**_ dadê?Tû bû telefuna wî nakî,bila bizifirte mal?**

**_ eve hizar cara min telefuna wî kir.Hingê dizifirt,demê dimînte bê pare.**

**_ dadê.Ya jiminve,babê min gelek zîrek ü baş bû!**

**_ erê kurê min,babê te hindî tû bêjî hind yê baş û zîreke. Ev welate mêr û zîreka naniyast.Tinê wan xudan ezman ü nasname divên.**

**_ bila bizifirt,weku gelek hevalên xu.Wî digût min çend sala xizmeta welatê xu kiriye.**

**_ raste,lê nevêt min bihêlte bitinê.**
**_ em her bitinê ne,ma kengî digel me dijît?!**
**_ na wila digel me najît.Ma çi bikim?!**
**_ hindek cara ez şerm dikim.Hevalên min pirsiyara wî dikin.Behsê wî dikin.**
**_ çi dibêjin?!**
**_ dibêjin... Dibêjin...!**
**_ bêje? Ka ci dibêjne babê te?Bawerneke ha!**
**_ dibêjin karê wî yê bûye rava jinkên ciwan...**
**serê xu çemand,çavên wê yên reş,tijî rondik bûn.**

**_ bawerneke,babê te ji wê çendê mazintire.**

**Dayka xu bû rondika hêla û qesta jora xu kir.**

**Zanî axivtinên wî,jibirînên dayka wî yên kür girtin.**

*****

**_ helû? Tû likîvey?**
**_ ez yê lipirag.Te çi divêt?**

**_ min tû divêy.Biçûkên te tû divêy.Daêra karî harîkariya te ya birî.Were,bizifire,çi jite kême?Tû liçi digerî?!**

**_ ez yê lixu digerim.Ez yê berzeme.Her demê min xu dît, ez dê zifirim!**

*******

**_ 17 _**

**Dîwana wî,piç piçe ya vala dibit.Ew rû germiya rojên pêşyê nema.Sifira wî,roj bû rojê,ya hejar dibit. Mêvanên wî,tinê hindek jinên birsî yên mayn!**
**ew jî kitkite yên pirsiyara xoşmêrekê dî dikin.**
**_ eve ez çûm.**
**_ dê kîve çî?**
**_ dê pirsiyara jiyana xu kim.Tû neşêy nanî bidîye min!**
**_ raweste,dê bû min pare ên.**
**_ eve deh roje tû we dibêjî!**
**_ dê her ên,mala min,nahêlin ez jibirsa bimirim!**
**_ her demê hatin,tû baş cihê min dizanî...**
**_ neçe...Min nehêle bitinê...**
**dengê girtina wê jora bê seruber.Hemû livîn bidawî înan.**

**Kete beramberî giyanê xu mejiyê xu,ü wijdana xu.**

**Xu kire dadwer û tawanbar.Pirsiyar jixu kirin.Bersiv dan.**

**Liegera geriya.Dîdevan kom kirin.Hemû pelgew destkevt.Bidijî wî bûn.**
**zanî ew gonehbarê serekiye.Ma lihîviya biriyarekê.**

**Dikluxkê mejyê wî da.**

**çend dadwerek dikom bûn.Mijülî derkirina biriyarekê bûn.**
**_ were mal,em yên jite xerîb bûyn.**

**_ biçûkên te pirsiyara te dikin.Daêre.Polîs..Heval..Dayk ü babên te.**
**eve hemû bû wî ne dibûne kul û xem ü ne dişiyan wan dadwera jimejiyê wî dür bikin.Çu kartêkirin liser hestê wî nedikir.**

**Tinê livan rojên dawyê,tinê van gûtinên dawyê,tinê wê hîviya vê carê.Kire êxsîrekê bê desthelat.**
**_ were mal, kiça tû çû...**
**_ were bizifire,kurê te na ête mal...**
**_ were,em dê berze bin.Were me jivê zifirokê bîne der.Em pêtivî tene...**
**xu kire serokê dadwera.Xu kire dadwerekê bê dil.**
**_ sizayê wî mirovê bibite egerê wêrangirina mala xu, berzekirina biçûkên xu çî ye?!**

**_ ev tawane,jikuştina kesekî mezintire.Eve kuştina gelek kesane.Windabûna gelek biçûkane.Kavlkirina binemaleka serbilind ü xudan şiyane.**
**_ siza yê wî çî ye?!Tû bixu biriyarê bide.**

**_ ma dê çi ji ewa ez têda zêdetir ête serê min?!**

**_ ma çi jite kême?Tû yê bûye ribîte!Dixoy û vedixoy,her cihê te bivêt diçyê!Çend parên biçûkên te kum dikin, tû lizik û bin zikên xu didî....!**
**lidûr xu zifirî,kes nedît,diviya hindek avê berdite gewriya xu ya hişik.Çu av nedît.Gazî jina xu kir.**

**Kesê bersiv neda,gazî kur û kiçên xu kir.Kes litana wî nehat.**

**Gewriya wî hişik bû.Xwîna dilê wî,lez kir.Jor teng bû.**
**diviya xu bigehînte,cihê av lê.neşiya xu liserpiya bigirt. Dişerenîxa giyanê wî,û gewriya hişik û xwîna dijwara dilê wî.**

**Dergeh vebû.Bejna tulazekê sinêle,digel hevalê wî Husên.Hildane jor.**
**_ eve teç lixukiriye?Tû liçi digerî?Te xêre?!Mane bese? Nê kurê te yê hindî te lê hatî!**
**serê xu bilind kire navçavên kurê xu.Neşiya bersiva bişkurîna wî bidit.Serê xu şor kir,çavên xu jidil neqandin. Jihemû dilê xu diviya erd bikelişt,û kelexê wî yê mirar dinav keliştêt xuda berze bikit.**

**Milên wî girtin,danane ser wî cihê bê seruber.**

**Zanîn yê jibirs û têhina hişik bûy.**

**Diviya berê xu bidite navçavên kurê xu.Diviya çavên xu bi mwyên simbêlên wî kil dit.Diviya bikite dinav sîngê xuda.Sîngê wî yê tijî kul û pîsatî bû.Diviya bikite hewar, diviya daxwaza mirinê bikit.**

**Çu jê nehat.Mirin livan çirka bipare naête kirîn.**

*****

**_ heker min kurek hebû,dê navê wî kime zêrek.**

**Da weku babê xu zîrek bit..**
**_ pa heker kiç bû?**

**_ dê navê wê bûte hêlim.**
**_ erê...Da bikime şirîn..Hingivîn..Da bikime gol û nesirîn û...**

**_ hêdî hêdî,madê çend nava daniye ser?**

**_ çend xeslet litene?Dê hind nava danime ser.**
**_ pirsiyara min?Dê heta kengî te ez hosa vêm?Erê jiber bûkaniya mine?Yan birastî ew xeslet min hene?!**
**_ pirsiyareka çivêle.Heker bimin bit,piştî mirinê jî,dê te digel xu bime biheştê,da pêgve bijîn.Min çi hurî nevên, tinê min huriya xu divêt!**

**dengê hevalê wî,jiwê hizra şirîn îna ser wê rastiya tal.**
**_ hilû, karê xu bike,da biçine mal.**
**_ mal...?!Mala çi?Min çu mal nînin!**
**kurê wî destê xu dana ser milî.**
**_ malate!Em hemû yên lihîviya te.**
**serê xu bilind kir,navçavên kurê wî tijî hîvî û jiyanin!**

**_ me biriyar ya day,em pêkve bizivirine welatî,welatê me,ew welatê te gelek xu bû wastandî...**
**_ welat...?!Min çu bû welatî nekirîye.**

**_ te gelek ya kirî,kes neşên wê jibîrbikit.**
**_ herkesê dû tiveng bû welatî havêtine dujminekî,divêt welatî bû xu bifiroşt û bidite binanekê.**

**_ te gelek ya kirî,tû gelek yê wastiyay.**
**_ her tiştê mirov bikit bû welatî,kême.Şehîd bûn bû welatî kême!**

**_ eve ne demê van sohbetane.Em yên lihîviya te.Kurê te xwandin ya hey,direnge!**
**kurê wî destê wî girt û maçî kir.Bidestê dî bilind kir.**

**Rast rabû serxu,diviya kurê xu dinav sîngê xu da bişidînit. Diviya karê xu bikit,da digel wan bizifirte mal!**

**Neşiya xu liserpiya bigirt,lidur xu zifirî,kes nedît,lipişt xu zifirî,kes nedît.Kire hewar,kes litana wî nehat.**

**Gazî kurê xu kir,gazî kiça xu kir,gazî hevalê xu kir,gazî jina xukir.Gazî wê jina berî çend demjmêra dikuşawî da xwîna wî dimêt kir,kesê bersiv neda...!**

**Zanî gûtin û hîvyên jina wî dirast bûn.**

**_ were mal...**

**_ were.. Kurê te nediyar....**

**_ were.. Kiçate çû...**

**_ were mal...**

**-- Bizifire...**

**18_4_ 2006  nürnbêrg**